# LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK

NRLS
NAVENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK

KOVAREKE DEMSALÎ JI NAVENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK TÊ DERXISTIN - HEJMAR 10 PAYIZ 2023




- ERDNÎGARÎYA ABORÎ YA BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRÎYÊ
- HIZRA SELEFÎ YA CÎHADÎST LI KURDISTANÊ
- TIRKÎ Û TIRKÊN ÇIYÊ
- GUHERTINA TIRKÎYÊ JI SÎYASETA XWE YA DI SÛRÎYÊ DE
- DAIŞ Û BAWERÎYA LEŞKERKIRINÊ
- TUNDREWÎYA ŞÎÎTÎYÊ

Desteya nivîser:

**Hejar Şekir**

**Yûsif Mistefa**

**Rakan Şêxî**

**Kurdyar Dirêî**

Nexşedan: **Ehmed Mela**

Hemû danstan bi navê sernivîser li ser navnîşana jêrîn tên kirin:

nrls@nrlsrojava.com

Ji bo serdana sîteyê:

www.nrls.net

**Weşanên Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS)**

**Mafên çapkirin û weşanê parastîne**

**Hejmara (10) Payîz – 2023**

## NAVEROK

**Erdnîgarîya Aborî ya Bakur û Rojhilatê Sûrîyê ........................................ 5**

**Hizra Selefî ya Cîhadîst ya derbasî Herêma Kurdistanê bûye, Û selefîyeta xwecihî ya nûjen li Herêma Kurdistanê ................................................ 26**

D. Cewad Kazim El-Beydanî

**Tirkî û Tirkên Çîyê ....................................................................... 40**

Faris Osman

**Guhertina Tirkîyê ji sîyaseta xwe ya di Sûrîyê de .................................. 45**

**Daiş û baweriya leşkerkirinê ............................................................... 55**

**Tundrewîya şîîtîyê ........................................................................ 94**

## Gotina hejmarê

**Xwendevanên hêja:**

Jixwe jimara kolvarê ya di nav destên we de, mijarên nû digire dest.

Mijara destpêkê ya bi navê " Erdnîhgarîya Aborî ali Bakur û Rojhilatê Sûrîyê", bi rêbaza erdnîgarîya herêmî digre dest ku taybetîyên aborî yên weke çalakîyên anborî û dewlemendî (çandinî, lawirvanî, berhemên daristanan, pîşesazî, veguhestin, bazirganî, geştyarî …) yên herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyê lêkolîn dike.

Jixwe lêkolîn a bi navê "Hizra Selefî ya Cîhadîst ya derbasî Herêma Kurdistanê bûye,

Û selefîyeta xwecihî ya nûjen li Herêma Kurdistanê" rewş û sedemên ku hiştine hizra Cîhadî derbasî Başûrê Kurdistanê bibe û armancên komên cîhadî li Başûr û girêdana wan bi Cîhadîyên cîhanî, şirove dike.

Pêvajoyên ku dewleta Tirkîyê piştî peymana Lozanê li ser kurdan pêk anîye, ew jî ji qirkirina kurdan hem ji alîyê rewanî hem jî ji alîyê şênberî, ew jî bni rêya qedexekirina ziman, çand û kevneşopîyên kurdî, her wiha koçbnerkirina kurdan ji warên wan û temirandina şoreşên kurdî bi awayên hovane, lêkolîna "Tirkî û Tirkên Çiyê" van mijaran zelal dike.

Lêkolîn li ser navê "Guhertina Tirkîyê Ji Sîyaseta Xwe Ya Di Sûrîyê De" dirûtîyua Tirkîyê û siyasta wê ya dîmagocî û armancên wê yê sereke li ser mijarên herêmî û navneteweyî bi taybet pirsgirêka kurdî, eşkere dike.

Jixwe lêkolîna "Daiş Û Baweriya Leşkerkirinê" balê dikşîne ser rêgez, taybetî û rêbazên leşkerkirinê li gel Daişê, her wiha dê çawa li heber wê were rawistandin.

Di dawîyê de dê bşê yekem ji lêkolîna "Tundrewîya Şîîtîyê" mijarên tundrewtîya tîreyî ya herêmî, cihê Şîa di nav islama siyasî de û tevgera Şîî ya nûjen, radixe ber çav.

**Sernivîser**

# Erdnîgarîya Aborî ya Bakur û Rojhilatê Sûrîyê

## Têgîna Giştî Ya Erdnîgarîya Aborî

### Pêşgotin:

Bê guman mirov û zanist bi lez bi pêş dikevin; çimkî mirov her dem hewl dide li ya baştir û guncavtir ji wî û gera jîyana wî re bigere. Komên mirovan timî li deverên guncav ji hêla erdnîgarîya xwezayî ya girêdayî avhewa, çandinî, baran û hwd digerîyan. Lewra erdnîgarîyê roleke giring di destnîşankirina warê wan de didît. Têgîn yan pênasekirin yan jî naveroka erdnîgarîya aborî bi giştî li gor zanistên din heta astekê nû tê dîtin û li dawîya sedsala nozdem bêhtir giringî pê hate dan. Ji ber giringîya vê zanistî em ê bi rêya lêkolîna xwe hewl bidin balê bikşînin li ser vê zanistî û lê bikolin û bi kurtî û bi rengekî akademîk wê pênase bikin da ku têgihiştina wê hêsantir bibe. Li vir em ê guh bidin erdnîgarîyeke tenê ew jî “erdnîgarîya Bakur û Rojhilatê Sûrîyê” ye. Her wiha em ê di lêkolînê de xwe bispêrin çavkanîyên pêbawir û di hin warên lêkolînê de me xwe sparte hevdîtinên bi hin kesan re ku çalakîyên wan yên çandinî, pêşesazî û bazirganî hene. Derfeta biserketina pirojeyan bi rengekî giştî û astengîyên ku ew tûşî tên û çawa dikarin xwe ji wan bidin alî yan jî bi awayê herî guncav rû bi rûyî wan bên, lêkolîn li ser van xalan jî radiweste. Em bi vê lêkolînê hewl didin ronahîyê bidin zanisteke nû da ku em bikarin xwe bigihînin bipêşketina ku li qadên navneteweyî çêdibe. Bi taybet ku erdnîgarîya ku em lê dijîn berê û niha jî mîna giringtirîn deverên cîyosîyasî tê dîtin. Ji bilî ku ev erdnîgarî landika şaristanî û olan e, weke benê girêdanê di navbera dewletên rojhilatî û dewletên rojavayî tê dîtin. giringîya erdnîgarîya aborî ji wê gavê tê ku asoyên zanînê yên nû li pêş me vedike û zanyarîyên zêdetir ji me re peyda dike. Fermndarên dewletê, sîyasetvan û fermandarên leşkerî jî guh da vê zanistê da ku zanyarîyan bi dest bixin û binasin ka çawa dahatên surişţî û mirovî têne belavkirin.

**Pênase û Rêbazên Erdnîgarîya Aborî:**

Erdnîgarî, di pênaseya xwe ya giştî de, zanisteke ku giringîyê dide vekolîna taybetîyên fîzîkî di danasîna xweza û cîhanê de, ew jî li gorî pêkhateya cîyolocî û karîgerên fizîkî yên ku bandorê li guhertina ku tûşî tên dike. Em dikarin erdnîgarîyê bi giştî li van beşan dabeş bikin:

1- **Erdnîgarîya xwezayî**: Ew erdnîgarî ye ku giringîyê dide têkilîya mirov bi rûyê erdê re û şert û mercên avhewayê yên ku bandorê lê dikin.

2- **Erdnîgarî jîndarî**: Ew erdnîgarî ye ku giringîyê dide belavkirina riwek, lawir, derya û okyanûsan.

3- **Erdnîgarîya mirovî**: Ew erdnîgarî ye ku giringîyê dide bandora mirov li tiştên ku li dora wî digerin. Em dikarin wê li erdnîgarîya nifûsê, erdnîgarîya cihî, erdnîgarîya aborî, erdnîgarîya sîyasî û erdnîgarîya dundeyên mirovan were dabeş kirin.

Der barê erdnîgarîya aborî de, ku mijara lêkolîna me ye li vir, ji bo zanyar, erdnîgar û kesên ku bi vê zanista hinekî nûjen re eleqedar dibin, çend pênasîn hene, ku em dikarin bi kurtî binivîsin:

• Hin dibêjin ku guh dide cihê çalakîyên aborî, belavbûna wan û rêxistina wan a cihî.
• Hin dibêjin ku ew reftar û adetên mirovan derman dike di wî warî de ka çawa jêderên jîngeha xwe bi kar bîne û li gorî vê pênaseyê ew li erdnîgarîya çandinîyê, erdnîgarîya pîşesazî, erdnîgarîya bazirganî û erdnîgarîya geştîyarîyê dabeş kirin.
• Hin dibêjin ku ew giringîyê dide cihên pîşesazî, bazirganî, veguhestin û guhertina nirxê xanîyan, Her wiha lêkolîna çalakîyên çandinîyê û bazirganîya navneteweyî.
• Hin dibêjin ku ew weke zanistekê çalakîyên aborî yên mirovan û têkilîya wê bi jîngehê re lêkolîn dike.
• Hin dibêjin ku ew li alîyên cihêreng ên çalakîya aborî dikole ku bi hilberandin, belavkirin û bikaranîna çavkanîyên dewlemendîya aborî yên cihêreng ve girêdayî ne û pêwendîya wê bi cihî re.
• Hin dibêjin ku ew têkilîya di navbera karîgerên jîngeha xwezayî û şert û mercên aborî û di navbera hunerên berhemdar û belavkirina berhemên wan de lêkolîn dike.

• Hin dibêjin ku ew weke zanistekê wan karîgerên erdnîgarî vedihewîne yên bandorê li hilberîn, veguhestin û pevguhertina kelûpelan dike.

• Hin dibêjin ku ew weke zanistekê guh dide têkilîyên hevbeş ên dîyardeyên xwezayî û awayên aborî.

• Hin dibêjin ku ew weke zanistekê bandora xwezayê li çalakîya aborî û têkilîyên cihî lêkolîn dike.

• Hin dibêjin ku ew weke zanistekê belavkirina çalakîyên hilberîner li ser rûyê erdê lêkolîn dike.

Weke ku berê jî hat behskirin, erdnîgarî hewl dide ku dîyardeyên cihêreng ên erdê rave bike û têkilîyên çalakîya mirovan û belavbûna niştecihan di dîmena xwezayî de lêkolîn bike. Li gorî vê yekê, erdnîgarîya aborî hewl dide ku van xalan birêxistin bike û analîz bike:

- Bikaranîna mirovî ya çavkanîyên xwezayî: kan, ax, ava şêrîn û şor.
- Hilberîna kelûpelan: heyberên xam ên şînatî, lawir û kan, xwarin, pertalên çêker.
- Veguhastinên cûrbecûr yên kelûpelên hilberandî bo bazarên mezaxtinê, raje (xizmetguzarî) û bazirganîyê.

Li gor xalên navborî di bingeha xwe de erdnîgarîya aborî guh dide lêkolîna dîyardeyên aborî û belavbûna cihê wan (yê erdnîgarî. Cara yekem ev têgeh sala 1882yan de ji hêla zanyarê alman “Gotz” ve hat bikaranîn ku têgîna aborî û bazirganîyê ji hev cuda kir. li gor wî erdnîgarîya aborî, lêkolîneke zanistî û akademîk e giringîyê dide dîyarkirina bandora jîngehê li hilberîna keresteyan û girêdana di navbera karên destan yên cihêreng de û jîngeh û xwzayê de û têkilîya pevguhêr ya di navbera wan de. Lê erdnîgarîya bazirganî giringîyê dide lêkolîna hilberîna keresteyên sereke û bazirganîya wan li ser asta navdewletî li gor wesf û rêzkirina hejmaran û xişteyan bê ku guh bide karîgerên erdnîgarî yên ku bandorê li hilberî û firotinê dike. Puxteya mijarên bihûrî ew e ku em dikarin hemû pênaseyên berî bi hurgilîyên xwe ve rast bibînin û xwe bispêrin wan û ji her alîyî ve lêkolîn bikin û sûdê wergirin. Bi giştî, erdnîgarîya aborî ew e ka çawa mirov dikare sûdê ji dahatên suriştî di erdnîgarîyeke destnîşankirî de bibîne û bi awayê herî baş bi kar bîne ku mirov sûda herî baş jê bibîne.

Der barê rêbazên xwendinê yên erdnîgarîya aborî de, pispor wan wiha dabeş dikin:

• **Rêbaza Herêmî**: Ev rêbaz giringîyê dide lêkolîna rewşa aborî li ser asta herêmên cografî û beşên xwezayî, wek herêmên tropîkal, parzemîn û welatan, yan jî kendûkozên homojen ên çend welatên cîran ên ku pêkhata wan ya erdnîgarîya xwezayî hevpar e.

• **Rêbaza Babetî**: Ev rêbaz guh dide lêkolîna çavkanîyên aborî yan berhemên berhemanînê, çi çandinî, çi heybern, çi pîşesazî bin û Her wiha lêkolîna çalakîyên aborî yên pîşesazîyên wek masîgirtin, şivantî, çandinî, derxistina kanyan û hwd.

• **Rêbaza Berhemî**: Ev rêbaz yek ji rêbazên herî kevn tê hesibandin û girêdayî wê yekê ye ka li ku derê tê hilberandin, çima tê hilberandin, çawa tê hilberandin û bi pêvajoya firotinê ve tê girêdan. Li vir jî, em dikarin wê di nav deverek erdnîgarî ya taybetî de li ser çandinîya herêmî, û hem jî çandinîya gelemperî ya ku bi yek çandinîyê ve li seranserê cîhanê ve girêdayî ye, dabeş bikin.

• **Rêbaza pîşeyî**: Helbet ev rêbaz dê guh bide pîşeuyan û dabeşkirina li ser vê bingehê û li ser rêza wan a dîrokî û kronolojîk, wek hunera masîgirîyê, çandinî û avahîsazîyê, û bipêşkeftina karên destan bi pêşketina mirovan re û hwd.

• **Rêbaza Kokî**: Ev rêbaz pêkhata aborî û karîgerên ku bandorê lê dikin, bi awayekî xwezayî û mirovî, û qanûnên ku hilberînê kontrol dikin vedihewîne.

• **Rêbaza Erkî**: Di lêkolîna erdnîgarîyê de, nemaze di lêkolîna erdnîgarîya aborî de, yek ji rêbazên herî nû ye. Rêbazeke weha hewl dide ku pêkhata fonksîyonel ya pergala aborî ya serdest lêkolîn bike û bi vî rengî pêşkeftina dîrokî û pêşveçûna bandora mirovî ya li ser hilberîn an bazirganîyê li ber çavan digire.

**Beş û taybetmendîyên erdnîgarîya aborî:**

Erdnîgarîya aborîyê li gorî aborînasan wiha dabeş dibe:

1- Erdnîgarîya çandinîyê.
2- Erdnîgarîya pîşesazîyê.
3- Erdnîgarîya bazirganîyê.
4- Erdnîgarîya kan û wizeyê(enerjî).

5- Erdnîgarîya vegujhestin, rê û tiranzîtê.
6- Erdnîgarîya geştîyarîyê.
7- Erdnîgarîya kirînûfirotinê.

Ji bo taybetmendîyên wê, aborînas wan wiha dabeş dikin:

• **Hilberîn**: Pêvajoya veguhertina dewlemendîyên xwezayî bo dewlemendîya aborî ye bi sûdeke baş.

1- Hilberîna seretayî: Berhemên xwezayî ji masîgirtin, daristan, kevirên giranbiha, lawirvanî, çandinî û kanderînê werdigire.
2- Hilberîna duyem: Çavkanîyên xwezayî bi rêbazên mekanîkî, kîmyayî û pîşesazî yên berdest diguherîne da ku sûdê ji wan ji bo xizmetkirinê wergire.
3- Hilberîna bilind: Weke diravxane, perwerde, tenduristî, seyrangehên geştyarî û beşên din ên rajeyê.

• **Danûstandin**: Van xalan dihewîne:

1- Cih
2- Pêşxistina aborî
3- Veguhastin
4- Xwedîtî

• **Mezaxtin**: Armanca hemî çalakîyên aborî ye ku di serî de dabînkirina pêdivîyên mirovan e; ne bidestxistina qazancên herî zêde ye.

**Çavkanîyên dewlemendîya xwezayî û hilberîna jîndarî (biyolocî) yên erdnîgarîya aborî**:

Bi gelemperî, dahatên dewlemendîyê ew çavkanî û sermaye ne ku çalakîya mirovî ji wan nirxekî aborî derdixe holê. Em dikarin wan li jêr dabeş bikin:

• Çavkanîyên xwezayî, di nav wan de dahatên organîk ên zindî yên weke daristan, mêrg, jîyana kovî ya lawiran û masî girêdayî okyanûs û deryayan di nav jîyana avî de. Ji bo yên neorganîk, van çavkanîyan tev digire: hewa, av, kan, çavkanîyên wizeya ruhn û kevirê, û avabûnên latî yên ku di jîyana aborî de têne bikaranîn, wek qûmê û keviran Her wiha  çavkanîyên mirovî, divê temen, cih û dîmena van dahatan li ber çavan bên girtin.

• Av weke çavkaniyeke xwezayî: Ew di her cûre jîyana organîk de hêmana bingehîn e; bi giranî li malê, di çandinî, avadanî, pîşesazî, hilberîna wizeyê de, veguhastina ava hundurîn a di navbera çem û kanalan de, çavkaniyek

xwarinê ji bo masîyan tê bikaranîn û Her wiha ji bo armancek bingehîn di pêşvebirin, geştyarî û werzîşên avê de bi kar tê.

• Çavkanîyên xwezayî di warê nûbûn û tinebûnê de: Em dikarin wan li du beşan dabeş bikin: Çavkanîyên nûjenker, ew koma çavkanîyan e ku heya ku bobelatên gerdûnî rûnedin ji nav naçin; wek av û hewayê. Çavkanîyên ku xwe nû nakin, dibe ku ev kom tune bibe, wek ax, riwek, lawir, kan û çavkanîyên bin erdê.

• Parastina çavkanîyên xwezayî ji tunebûnê, wek nimûne parastina axê ji erozyonê û sedem û karîgerên din ên ku bandorê lê dikin, Her wiha parastina şînatî û riwekan, jîyana lawirên malî û kovî, û parastina kanyan û çavkanîyên binerdî; ew jî bi şopandina sîyaseteke baş a biaqilane di mezaxtinê de û ya herî girîng bê parastin, ango dewlemendîya avê.

**Karîgerên xwezayî û mirovî yên ku bandorê li erdnîgarîya aborî dikin:**

• Hêmanên jîngeha xwezayî, di nav de kendûkûz, qadên neyînî yên ji bo lêmana mirovan, ax û dewlemendîya xwezayî.

• Hêmana mirovî, ku pirbûna nifûsa cîhanî, belavkirina wê ya cihî, û hêza wê ya hejmarî û kalîteyî dihewîne.

• Xwarin, di nav de çavkanîya wê ya bingehîn û qada çandinîyê.

• Sîstemên aborî û çandî, di nav de şêwaza komkirin, nêçîrkirin, şêwaza çandinîyê û şêwaza pîşesazîyê.

## ❖ Erdnîgarîya aborî ya Bakur û Rojhilatê Sûrîyê:

Bi giştî erdnîgarîya aborî ya bakur-rojhilatê Sûrîyê beşek ji erdnîgarîya xwezayî ya herêmê û berdewamîya wê ya xwezayî ye, ji ber ku deştên herêmê dirêjahîya deştên çîyayê Toros û axa xwezayî ya herêmê bi giştî axa çandinîyê ye û ji ber vê yekê aborîya herêmê di serî de xwe dispêre çandinîyê û berhemên wê. Ji bo pîşesazîyê, bajarên mezin di vî warî de stûna piştê bûn. Bajarên belavbûyî tenê hin pîşesazîyên sivik an jî yên ku divê tenê hinek ji hewcedarîyên herêmê peyda bikin hildiberandin. Heman tişt ji bo bazirganîyê jî derbasdar e, û ew car caran weke bazareke nîv kom-firoşîyê yan kit-firoşîyê, û carinan jî weke xalên belavkirinê dihat hesibandin, ew jî ji ber kombûna bazirganîya mezin li benderên sereke û xalên sînorî yên ku

rasterast ji hêla dewletê ve têne çavdêrîkirin. Em ê hewl bidin ku hûrgulîyên her şaxek erdnîgarîya aborî ya herêmê cuda lêkolîn bikin.

**1- Erdnîgarîya çandinî û çavkanîyên av, daristan û lawiran:**

- **Çandinî**:

Guman tune ye ku bakurê rojhilatê Sûrîyê û bi taybetî herêma Cezîrê wek selika xwarinê ya welat tê hesibandin, ji ber ku hilberîna wê ya çandinîyê ji sêyan duyê hilberîna giştî pêk tîne. Deştên berfireh ên ku bi awayekî xwezayî ji bo çandinîyê, bi taybetî çandinîya dexl û baqilan tên veqetandin lê hene. Li gorî çemên ku tê re derbas dibin, gelek av lê hene, her weha sewal lê hene, ku beşeke girîng ji erdnîgarîya herêmê pêk tînin.

Berhemên çandinîyê yên herî girîng ev in:
Dexl û dan: genim, ceh, nîsk, garisê zer, fûl, nok .....hwd.
Pembû: Li jêr benda darên biçûk yên demsalî tê curandin.
Berhemên bêhndan: kemûn, kizbera, reşreşk, hilbe .....hwd.
Sebze: xîyar, bacanên sor (firingî), pîvaz, xirdik, bacanê reş, îsot û hwd.
Darên berhemdar û daristan: Çandinîya darên berdar û darên daristanan çandeke nûjen e li herêmê û heta niha negihîştiye asta berhemanîn û veberhênanê. Ev jî dibe encama sîyaseta çandinîyê be ya ku navend wê dişopîne, nemaze ku guh nadin vî milî, û belkî ji ber belavbûna wê li deverên beravî û hundir be ku piranîya niştecîyên wan deveran debara jîyana xwe bi wan dikin.

Ji ber xwezaya devera çandinîyê yan jî şîyana deverê ji bo çandinîyê, ji alîyê desthilatdarên li dû hev ên navendê ve hat piştguhkirin. Kêşeya herî girîng an jî mezin a li pêşberî vê sektorê, bikaranîna rêbazên kevn û kilasî bû. Sektora çandinîyê nehate bipêşxistin, çi di warê geşepêdana hilberînê de, çi jî ji alîyê rêbazên avdanîyê û de be (Ji xeynî hin tecrubeyên takekesî û destpêşxerîyên xelkê herêmê bi xwe). Lewra sûda ku tê xwestin ji ava çemên Ferat û Xabûrê nehat dîtin. Li kêleka wê jî sîstema sazîyane ya ku vê sektorê bi rê ve dibe lawaz e. Tiştê ku rewş xirabtir kir ew piroje ye ku bi navê Kembera Erebî tê naskirin, ku li jêr desthilatdarîya Partîya Beis a Erebî di sala 1974an de li navçeyên kurdî yên erda wan dewlemend ku bi navê (Xeta Dehan) tê binavkirin, hate pêkanîn. Sih û şeş gundên nimûne (mêtengeh heke gotin li vir rast be) hatin avakirin, bi dirêjahîya 275 km û kûrahîya 15

km, ji rojhilatê bajarê Dêrikê heta rojavayê bajarê Serê Kanîyê. Zêdetirî çar hezar malbatên ereb ku li herêmê bi navê "erebên xemer" tên nasîn sûd ji vê pirojeyê dîtin. iber ava her sê bendavên li ser Çemê Firatê zevîyên çandinîyê û gundên wan di bin avê de hêlan, lewra bi navê "erebên xemer" hatin naskirin.

Li jêr, xişteyên girîngtirîn dever û berhemên çandinîyê li bakur û rojhilatê Sûrîyê ji bo her sê parêzgehên Hesekê, Reqa û Dêrazorê û rêjeya tevahî ya Sûrîyê bi giştî hene. Ev amar ji amarên dawîn yên Wezareta Çandinîyê ya Sûrîyê ku di sala 2019an de hatine weşandin hatin girtin.

- **Genim**

| **Daxuyanî** | **Avî** | | | **Bejî** | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | **Rûber** | **Hilberîn** | **berhem** | **Rûber** | **hilberîn** | **Berhem** |
| **Sûrî** | 591264 | 1873010 | 3168 | 754343 | 1212088 | 1607 |
| **Hesekê** | 129645 | 336968 | 2599 | 334960 | 459486 | 1372 |
| **Reqa** | 150000 | 487500 | 3250 | 56640 | 113280 | 2000 |
| **Dêrazor** | 47500 | 149848 | 3155 | - | - | - |

- **Ceh**

| **Daxuyanî** | **Avî** | | | **Bejî** | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | **Rûber** | **Hilberîn** | **berhem** | **Rûber** | **hilberîn** | **berhem** |
| **Sûrî** | 66693 | 195844 | 2936 | 1414193 | 2857280 | 2020 |
| **Hesekê** | 18421 | 44566 | 2419 | 415043 | 762970 | 1838 |
| **Reqa** | 16500 | 49500 | 3000 | 300000 | 600000 | 2000 |
| **Dêrazor** | 14442 | 39716 | 2750 | 26350 | 39525 | 1500 |

- **Nîsk**

| **Daxuyanî** | **Avî** | | | **Bejî** | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | **Rûber** | **Hilberîn** | **berhem** | **Rûber** | **hilberîn** | **Berhem** |
| **Sûrî** | 1202 | 94 | 78 | 112441 | 100559 | 894 |
| **Hesekê** | 1100 | - | - | 32400 | - | - |
| **Reqa** | - | - | - | - | - | - |
| **Dêrazor** | - | - | - | - | - | - |

- **Berhemîn cûda**

| Daxuyanî | Nok | | Fûlên lib | | Kemûn | | Cehê çêrê | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | Rûber | hilberîn | Rûber | hilberîn | Rûber | hilberîn | Rûber | hilberîn |
| **Sûrî** | 78197 | 52419 | 15563 | 24225 | 74739 | 29005 | 27806 | 299660 |
| **Hesekê** | 3000 | - | 148 | 187 | 23050 | - | 7900 | 55300 |
| **Reqa** | - | - | 1000 | 1000 | 6400 | 3200 | - | - |
| **Dêrazor** | - | - | 403 | 806 | - | - | 12000 | 156000 |

| Daxuyanî | Fûlên kesk | | Lehane | | Pelên Silkan | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | Rûber | Hilberîn | Rûber | hilberîn | Rûber | hilberîn |
| **Sûrî** | 10285 | 65809 | 2898 | 61895 | 1048 | 15470 |
| **Hesekê** | 4391 | 17564 | 216 | 1728 | 149 | 1788 |
| **Reqa** | 500 | 1000 | - | - | 15 | 300 |
| **Dêrazor** | 850 | 7225 | - | - | 75 | 1125 |

| Daxuyanî | Pîvaz | | Xes | | Sebzeyên zivistanê | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | Rûber | hilberîn | Rûber | hilberîn | Rûber | hilberîn |
| **Sûrî** | 2942 | 32062 | 2760 | 49313 | 16815 | 114229 |
| **Hesekê** | 354 | 2124 | 153 | 2142 | 5527 | 8190 |
| **Reqa** | 125 | 1880 | - | - | 120 | 2200 |
| **Dêrazor** | 550 | 6050 | 200 | 3000 | 455 | 4835 |

- **Çavkanîyên avê**:

Der barê çavkanîyên avê yên herêmê de, bi piranî xelk xwe dispêrin ava baranê û bîrên ava binerd an jî bi navê bîrên (derya û rûerd) tên nasîn. Ji bilî wê jî gelek çemên girîng ên ku di herêmê re derbas dibin an jê derdikevin hene, wek çemê Ferat, Xabûr û Ceqceqê û hewzên girîng ên avê wek hewzê Firatê ku rûbera wî 51 238 hektar e. Hewzê Dîcle û Xabûrê ku rûbera wî 21 129 hektar e. Her wiha li rojhilatê bajarê Minbicê bendavên mîna bendava Tişrîn bi dirêjahîya 900 metre û rûbera 166 km2 li ser çemê Firatê hatine avakirin ku 630 megawat-saet wizeya kehrebê hildiberîne. Bendava Firatê, bi rûbera 665 km2, çavkanîya sereke ye ji bo bajarê Helebê ji bo dabînkirina ava vexwarinê û li bajarê Tebqayê ku li pişt wê golek mezin heye; bi dirêjahîya 80 km û 8 km fireh e, dikare heya 14,1 milyar metrekup av depo bike, û her weha 880 megawat-saet wizeya elektrîkê hildiberîne. Bendava El-Hurîya (Benda El-Beas a berê), bi rûbera 27 km2, li bajarê Reqayê ye. Lê belê

ev bendav bêsûd mane, nemaze piştî kirîza Sûrîyê û destwerdana desthilatên Tirkîyê di para avê ya Sûrî û Iraqê de. Van salên dawîn ji ber kêmbarîna baranê hişksalî jî li deverê çêbû.

- **Çavkanîyên daristanî:**

Der barê çavkanîyên daristanan de, mixabin (weke me berê behs kir), li herêmê daristan tune ne, ji xeynî hindek perçeyên piçûk li vir û wir ku di forma zomê taybet de ne an li kêleka hin bendav û hewzên avê cih digirin, wek bendava Hesekê li rojavayê bajêr û bendava Mizgeftê, li gundewarê Dêrikê û darên li Çîyayê Kezwanan. Bi giştî, ew ji %2 ji tevahîya rûbera daristanên Sûrîyê bi giştî derbas nake.

- **Sewal û dewar:**

Der barê ajalên kovî û avî de, ew jî bi tenê li hewzên avê yên berê me behs kirî hene û yên ku li daristanên başûrê herêma Hesekê belav dibin, ku bi navê Parasteya Xwezayî ya Çîyayê Kizwanan tê naskirin. Li kêleka wê jî sewalên malê hene ku jêdera sereke ya sewalan e li tevahîya Sûrîyê. Ev ji bilî bîyabana Sûrîyê ya berfireh, ku yek ji girîngtirîn deverên sewalan, xwedîkirina wan û bazirganîya wan re tê dîtin.

Li jêr xişteyên sewalên herî girîng li bakur û rojhilatê Sûrîyê hene, li gorî tabloyên ku Wezareta Çandinîyê ya Sûrîyê di sala 2019an de derxistine:

| **Daxuyanî** | **Hejmara çêlekan** | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| | **Ga** | **Golik** | **Mê** | | **Tevahî** |
| | | | **Bişîr** | **Bêşîr** | |
| **Sûrî** | 5621 | 183315 | 441913 | 157472 | 788321 |
| **Hesekê** | 219 | 7267 | 37385 | 25382 | 70253 |
| **Reqa** | 178 | 1479 | 11755 | 2456 | 15868 |
| **Dêrazor** | - | 44184 | 95938 | 44181 | 184303 |

| Daxuyanî | Hejmara pez | | Tevahî |
|---|---|---|---|
| | Bişîr | Bêşîr | |
| Sûrî | 9495577 | 5062078 | 14557655 |
| Hesekê | 910888 | 489285 | 1400173 |
| Reqa | 944238 | 500835 | 1445073 |
| Dêrazor | 1145225 | 722374 | 1867599 |

| Daxuyanî | Hejmara bizinan | | Tevahî |
|---|---|---|---|
| | Bişîr | bêşîr | |
| Sûrî | 1202404 | 641793 | 1844197 |
| Hesekê | 69326 | 89314 | 158640 |
| Reqa | 110855 | 53312 | 164167 |
| Dêrazor | 79194 | 49930 | 129124 |

| Daxuyanî | Hejmara gamêşan | | Tevahî |
|---|---|---|---|
| | Bişîr | Bêşîr | |
| Sûrî | 3940 | 3206 | 7146 |
| Hesekê | 3003 | 2192 | 5195 |
| Reqa | 126 | 66 | 192 |
| Dêrazor | - | - | - |

| Daxuyanî | Goştê hilberandî | | | Tevahî |
|---|---|---|---|---|
| | Çêçlk û gamêş | Pez | Bizin | |
| Sûrî | 52488 | 116194 | 10960 | 179642 |
| Hesekê | 7601 | 14278 | 1072 | 22951 |
| Reqa | 382 | 18581 | 1171 | 20134 |
| Dêrazor | 15695 | 1250 | 680 | 17625 |

| Daxuyanî | Şîr û Şîremenî | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | Şîrê hilberandî | Taze tê vexwarin | Rûn | Nîvişk | Penîr | Mast |
| Sûrî | 1785102 | 789233 | 7821 | 6634 | 89075 | 286302 |
| Hesekê | 135430 | 66359 | 361 | 676 | 3677 | 32326 |
| Reqa | 96708 | 57503 | 756 | 968 | 11852 | 28516 |
| Dêrazor | 316371 | - | - | - | - | - |

| Daxuyanî | Hesp | Bergîl | Ker | Deveh |
|---|---|---|---|---|
| Sûrî | 12757 | 2294 | 69373 | 39725 |
| Hesekê | 3326 | 54 | 8786 | 601 |
| Reqa | 302 | 49 | 11352 | 5496 |
| Dêrazor | 929 | 427 | 17351 | 15305 |

| Daxuyanî | Hejmara kedîgehên zîxanan | |
|---|---|---|
| | Birêdan | Bêrêdan |
| Sûrî | 5953 | 3196 |
| Hesekê | 61 | 36 |
| Reqa | 52 | 12 |
| Dêrazor | 21 | 67 |

| Daxuyanî | Zîxan (bi hezarî) | Hêk (bi hezarî) | Kevok | Ciliq | Qaz | Ordek | kîvroşk |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Sûrî | 18498 | 2457610 | 925522 | 148772 | 44595 | 43690 | 94821 |
| Hesekê | 786 | 56416 | 134250 | 134250 | 27820 | 23185 | 41100 |
| Reqa | 223 | 14567 | 11296 | 8879 | 898 | 340 | 690 |
| Dêrazor | 523 | 35000 | 25918 | 13016 | 1174 | 2433 | 4204 |

| Daxuyanî | Şane | | Hilberandina şaneyan (bi ton) | |
|---|---|---|---|---|
| | Xwemalî | Nûjen | Hingiv | Şima hingiv |
| Sûrî | 96738 | 397251 | 2629 | 183 |
| Hesekê | 5354 | 11454 | 58 | 7 |
| Reqa | 232 | 6274 | 39 | 1 |
| Dêrezor | - | 100 | 0.2 | - |

Bi giştî ji kesê şopîner re dîyar dibe ku bandora ziwabûnê li ser herêmê eşkere ye, nemaze piştî ziwabûna xwezayî ya salên dawî, bandora şerê ku di van 12 salên borî de, her wiha desttêwerdana dagîrkerîya tirk di dabeşkirina avê de, wek ku me li jor jî behs kir, û kirîza sotemenî û wizeyê, ev hemû bûne sedema tevlihevîya di hilberînê û asta kalîteya wê de. Ji bilî van hemû tiştên li jor jî koçberî û penaberî heye ku herêm ji karzanên çandinîyê vala kirin.

**2- Erdnîgarîya Pîşesazî:**

Sektora pîşesazî yek ji beşên nûhatî li bakurê rojhilatê Sûrîyê tê hesibandin, û ev yek jî ji ber sîyaseteke sîstematîk a desthilatdarîya welat e, ji ber ku ew herêm tenê wek devereke çandinîyê didît, lewra bi vê bihaneyê pirojeyên pîşesazî red dikirin û destûra avakirina wan nedida. Ji ber vê yekê karsazên ku dixwastin pereyên xwe veberhênin, ti rê li pêş wan tune bû, ji bilî ku berê xwe bidin Şama paytext, an jî paytexta aborî Heleb ku mezintirîn herêma pîşesazî li wir “Bajarê Pîşesazî ya Şêx Necar” hatibû avakirin berî krîza Sûrîyê.

Bi destpêkirina operasyonên leşkerî û destpêkirina bûyerên dizî û talankirina sektora pîşesazî re, karsazan berê xwe da welatên cîran ên herêmî. Lê bi ragihandina Rêveberîya Xweser li her sê kantonan di sala 2014an de û ragihandina Rêveberîya Xweser ya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûrîyê di sala 2018an de ku Hêzên Sûrîya Demokratîk karîbûn rewşa ewlekarî li bakur û rojhilatê Sûrîyê kontrol bikin, ji bo veberhênana li herêmê, her çend hinekî bi tirs be jî, hin piroje li herêmê çêbûn. Hin pirojeyên ku li herêmê çalak ev in:

- Pîşesazîyên çandinîyê: Weke aş, kargehên şiîreyê, kargehên savarê, firinên nanê geştîyarîyê, bêjingên heyberên çandinîyê yên bîhndan, kargehên dagirtin û depokirinê û xwedîkirina mirîşk, sewal û masîyan.

- Pîşesazîyên veguherîner: Ew xwe dispêrin hin pîşesazîyên tevin ên sivik, wek kargehên dirûtinê û çêkirina cawan û hin çapxaneyên pîşesazîya pirtûk û kaxezan. Ev pîşesazî gelekî çalak e, lê xala lawaz, girêdayîbûna wê bi heyberên xam ve.

- Pîşesazîyên petrokîmyayî: Girêdayî petrolê yên li herêmê ne, ev pîşesazî xwe dispêrin rêbazên destpêkî di pêvajoyên parzûnkirin û derxistin, dagirtin û belavkirina berhemên petrol û gazê de.

Bi awayekî xwezayî, ev pirojeyên pîşesazî rastî gelek zehmetî û astengîyên mezin tên, lê dikarin heta radeyekê wan derbas bikin ew jî bi hebûna sazîyên ku li rex wan radiwestin û biryarder in an jî bandorê li biryarê dikin, wek odeyên pîşesazî û rêveberîyên ku ji alîyê kesên xwedî tecrube û zanîn tên birêvebirin. Ew jî ji bo hêsankirina mijarên jêrîn:

- Kaxez: Wek rêdan û hêsankirina mijarên hawirdekirina alavên pîşesazîyê û pêdivîyên hilberînê û mijarên hinardekirina materyalên hilberandî. Sazkirina qanûnên guncaw û piştgir ji bo berhema pîşesazî, hêsankirina bac û gumrikê û her weha asankirina veguhestina heyberênxam ên hinartî û hawirdekirî.

- Hebûna diravgehên piştgir ji bo hêsankirina hewaleyên darayî yên pêwîst ji bo derve û hundirê bakurê rojhilatê Sûrîyê.

Her weha di damezrandin an pêşdebirina sektora pîşesazî de jî gengaz e ku mirov ji erdnîgarîya herêmê sûd wergire, ji ber ku her tişt li vir bi gelemperî peyda ye her weke wize, deştên fireh, ava binerd û avhewayeke guncaw. Wate, em her çar demsalan bi hemû hûrgilîyên wan ve di vê erdnîgarîyê de dijîn, ji bilî wê yekê, berhemên çandinîyê yên deverê, hin ji baştirîn û xweştirîn berhemên çandinîyê yên cîhanê tên hesibandin û di warê pîşesazîya veguherîner de jî tên bikaranîn.

Ji bo nirxandina hêza kar a pîşesazî li herêmê di warê karzanî û çawanîya fêrbûnê de, û gelo ka heqdest bi nirxê kar re digunce yan na. Hêza kar heye û şîyanên wan hene ku di demeke kurt de di warê pîşesazî de fêr bibin û ev yek e ku wan ji hêza kar li welatên cîran cuda dike. Di warê heqdest de jî, pir hindik e û heqdestê herî baş nagihêje %30 ji heqdestên welatên cîran. Ji ber vê yekê ew li gorî xwezaya kar kêm e û bi vî awayî dibe sedema peydabûnaa bêkarîyê, nemaze di nav koma xwendayên zanîngeh û akademîk de (yên xwedî bawernameyên zanîngehê û bilindtir).

Eger em bixwazin pirsekê bipirsin: Gelo berhemanîna sektora pîşesazî di warê kalîte û bihayê de dikare bi ya ku ji derve tê hevrikîyê bike?

Em dikarin bibêjin erê; ji ber keda erzan, wek me berê jî behs kiribû, wizeya erzan û nêzîkbûna çavkanîyên heyberên xam, dikarin heta asteke bilind hevrikîyê di hilberînê de bikin bi taybet di warê pîşesazîyên girêdayî heyberên çandinîyê ji hêla kalîte û lêçûnê ve her wiha dikarin di pîşesazîyên ku bi sewaldarîyê ve girêdayî jî hevrikîyê bikin.

**3- Erdnîgarîya Bazirganî, Rêyên Veguhestyinê, Tranzît Û Rêgehan:**

Sektora bazirganîyê li herêmê heta astekê bi rengekî ne zêde baş bi rê ve diçe, her çend erdnîgarîya herêmê pir alîkar e ku ev sektor di nav sektorên

çalak de cih bigire, ji ber ku ev sektor ji bazirganîya pêdivîyên xwarinê yên rojane wêdetir naçe, li kêleka wê jî hin heyberênxam ên ku di avakirinê de têne bikar anîn, weke çîmento, hesin, dar û hwd. Lê ji aliyekî din ve jî em dikarin bêjin ku hin bajarên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê wek bazarên bazirganî yên çalak hatin aktîfkirin piştî ku hin bajarên ku navendên çalakîya bazirganî bûn zirar dîtin; weke Şama paytext, Heleb, Humis û Laziqîyê bajarê beravî ku benderên sereke yên welat lê ne. Sûka bazirganîyê li bajarên Minbic û Reqayê çalak bû piştî rizgarkirina wan ji rêxistina sawkar Daiş, ji ber vê yekê ev bajar ji ber erdnîgarîya xwe a guncaw bûn cihekî girîng di navbera bajar û xetên veguhastinê yên girîng de. Bazara hin bajarên din jî çalak bû mîna bajarên Hesekê, Qamişlo, Girkê Legê û Dêrikê.

Di çarçoveya lêkolîna xwe de me ji yek ji bazirganên cilûbergan pirs kir ka mirov çawa bazirganî û çêkirina cil û bergên nû li herêmê dinirxîne, bersiva wî bi giştî dihat qebûlkirin, lê ji ya ku dihat hêvîkirin kêmtir bû û ji hinek atolyayê biçûk û pir biçûk derbas nebû ku li hin bajarên mezin ên herêmê, bi taybetî bajarên (Hesekê û Qamişlo) belav dibin. Der barê bazirganîya di vî warî de û her wiha di warên din de, em dikarin bibêjin ku heta radeyekê, lê hêdî hêdî tê birêvebirin, û yek ji girîngtirîn sedemên wê jî vaguhastina di navbera bajarên navxwe yên Sûrîyê de ye û Her wiha veguhastina kelûpelan ji bo derve ye bo welatên cîran, herêmî û heta welatên ewropî, û lêçûnên wan yên zêde.

Di gel vê yekê, hin astengî bi têkilîya rasterast bi kar re têkildar in, wek:

- Materyalên xam ên ku di pêvajoya hilberînê de cih digirin gelek caran nayên peydakirin.

- Di vî warî de hêza karkeran ya qels, nebûna karzanîyê û nebûna enstîtûyên perwerdehîya pîşeyî yên pispor di warên jîyana pratîkî de bi giştî.

- Bac û gumrika bilind li ser mal û keresteyên ku ji hundirê Sûrîyê tên, wek Heleb û Şamê.

- Rewşa xizanîyê ya ku hemwelatî tê de dijî û meyla wî ya ji bo kirîna cilên ewropî (bikarhatî an yên bi navê balê tên zanîn) ji ber ferq û cudahîyên mezin ên bihayan.

- Wize di hemî warên jîyanê de, nemaze yên bazirganî, karîgerek sereke ye.

Bê guman erdnîgarî û cihê herêmê dihêlin ku ji bo rêyên bazirganîyê girîng be, ji ber ku vedîtina çînî ya hevrîşima xwezayî berî zêdetirî sê hezar salî bû. Ev berhem bi kevirên giranbiha dihat guhertin û bi vî awayî rêya xwe ber bi dewletên rojavayî ve vekir, ku bi navê Rêya Hevrîşimê hat naskirin. Di rastîyê de ne yek rê ye, lê toreke rêyan e ku alîyê rojhilat bi alîyê rojava ve girê dide. Dewletên ku ev rê di wan re derbas dibe, di warê bazirganî, çandî û civakî de geş dibe û bi pêş dikeve.

Bi giştî rêyên veguhestina navdewletî roleke giring û sereke dilîzin. Li Sûrîyê, li gor hin texmînan, nêzîkî 150 hezar kamyon di sînorên Sûrîyê re derbas dibûn, wek girêdan di navbera welatên cîran ên herêmê de, ku dahata wan salane nêzîkî sê milyar dolarî bû.

Girîngtirîn rêyên ku di erdnîgarîya bakurê rojhilatê Sûrîyê re derbas dibe, ew rêya navdewletî ya M4 e, ango rêya di navbera parêzgeha Heleb – Hesekê de ye. Ev rê di derîyê sînorî Rebîa/Tel Koçer re yê bi Iraqa cîran re dikeve nav xaka Sûrîyê û di Til Temir, Eyn Îsa, Minbic, El-Bab û Tadef re derbas dibe û digihêje Helebê û ji wir jî digihêje peravê û hundirê Sûrîyê. Ev rê weke xeta sereke ya girêdana rojhilatê welat bi rojava û başûrê wê ve tê hesibandin, ji bilî rêya Badîya ya ku kantona Hesekê bi Dêrazorê ve girê dide, di Tedmur û Badîya re derbas dibe û digihêje Şama paytext. Ev her du rê ji ber girîngîya xwe ya stratîjîk, ji bo kontrolkirina wan di navbera hêzên nakok ên herêmê de bûn xala sereke ya pevçûnan. Piştî rizgarkirina bajarê Reqayê (qaşo paytexta xîlafetê), û gefên komên çekdar ên bi ser dagirkerîya Tirk ve li ser rêya sereke M4, Rêveberîya Xweser neçar ma ku alternatîfeke guncaw ji tora rêyan re bibîne, ku rêya herî girîng ew rê ye ku bajarên Hesekê û Reqayê bi hev ve girê dide. Her wiha rêyên sereke yên di navbera bajaran de ku çûn û hatin di navbera wan de pir e.

Ji xeynî van rêyên navborî, çendîn dergehên girîng hene ku wê bi welatên cîran ve girê didin û ji van rêyên girîng ên ku wê bi bakurê Kurdistanê ve girê didin ev in:

1- Derîyê Qamişlo - Nisêbîn

2- Derîyê Dirbêsîyê

3- Derîyê Serêkanîyê

4- Derîyê Girêspî

5- Derîyê Kobanî

Derîyên ku wê bi Başûrê Kurdistanê ve girê didin:

1- Derîyê Sêmalka

2- Derîyê El-Welîd

4- **Erdnîgarîya Wizeyê Û Çavkanîyên Binerd:**

Bê guman bakur-rojhilatê Sûrîyê ji alîyê çavkanîyên binerd ve ji bo welat girîngtirîn herêm tê hesibandin, ji ber ku hemû yan piranîya bîrên petrol û gazê li parêzgeha Cezîrê ne, ku li bajarên Rmelan, Suweydiye, Keratşok, El-Şeddadê û El-Cebsa bi cih dibin. Li gorî statîstîkên berîya krîza Sûrîyê di sala 2010an de, amarên şirketa petrolê ya brîtanî, berhemanîna petrolê rojane digihaşt 250 hezar bermîlî ango bi qasî ji sêyan duyê berhemanîna giştî ya welat ku rojane nêzîkî 385 hezar bermîlî bû. Di warê pertola yedek de jî bi qasî ji sedî 75ê yedeka giştî ya petrola welêt e; tê texmînkirin ku petrola yedek 2,4 milyar bermîl e. Ji bo gaza sirûştî jî berhemanîna herêmê rojane 3,8 milyon metrekup e û yedeka giştî jî zêdetirî 63 milyon metrekup e, ku nêzîkî %26ê yedeka giştî ya gazê ye ku 241 milyar metrekup tê texmînkirin.

Li gor amarên dawîn ku vedigerin destpêka sala 2022yan, zîyanên sektora petrolê ji destpêka kirîza Sûrîyê di sala 2011an de nêzîkî 100 milyar dolarên amerîkî tê texmînkirin û berhemanîna rojane daketîye 86 hezar bermîl tenê. Rojane 12,5 milyon metrekup gaza siruştî û 323 ton gaza navxweyî jî tê berhemanîn. Tevahîya amarên li jor ên berîya qeyranê û piştî qeyranê, asta zîyanên giran li vê sektora girîng nîşan didin, ji ber vê yekê jî hemû amar giringîya erdnîgarîya herêmê di warê çavkanîyên binerd û wizeyê de nîşan dide ku her alî dixwest wan kontrol bike; bi taybetî rêxistina sawkar a Daişê, ji bo fînansekirina çalakîyên xwe yên sawkarî. Li kêleka wê jî dewlemendîya di bin erdê de yên bi kevir û asfaltê ve girêdayî heye ku gelek meqleên keviran li herêmê ji bo hûrkirin û vezîvirandina van keviran hene. Ev kevir bi rengekî sereke dikevine proseya avadanîyê li deverê. Ji bilî derxistina xîza û qûma ku di pêvajoya avakirinê de cih digire ji çemên Dîcle û Firatê ku ji girîngtirîn dewlemendîyên deverê yên xwezayî tê dîtin. Erdnîgarîya herêmê jî bi awayekî pir baş alîkarîya sûdwergirtina ji wizeya rojê di berhemanîna

wizeya alternatîf de dike, nemaze ku piranîya bîrên petrolê û navendên hilberîna gaza malê ji ber kevnbûna wan rastî rewşên xirabûnê tên.

Helbet naskirina navdewletî û herêmî ya Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyê ku ev zêdetirî 8 salan e herêmê bi rê ve dibe, dê bi awayekî baş di pêşketin û berdewamîya sektora wizeyê de, ketina şîrketan ji bo veberhênanê tê de bibe alîkar û pêşxistina planên stratejîk ên wizeya alternatîf û veberhênana wê ya herî guncaw ku xizmeta herêmê bike.

5- **Erdnîgarîya Geştyarîyê:**

Dibe ku em di binavkirina erdnîgarîya geştîyarî ya herêmê de ne rast bin, lê em ê hewl bidin ku vî şaxî ronî bikin, ji ber ku ew yek ji şaxên erdnîgarîyê ye û divê were behskirin bê ka divê çawa veberhênan û sûd jê werdigirin. Li parêzgeha Hesekê çend şûnwarên girîng ên şûnwarî hene:

- Girê Çaxir Bazar û Tilmozan li bajarê Amûdê

- Til Helef û Tel Fexirîye yên bajarê Serêkanîyê, ji alîyê artêşa Tirk a dagirker ve hatin dagirkirin.

- Til Beyder li bajarê Dirbêsîyê

- Girê Leylanê li bajarê Qamişlo

- Girê Pirê li bajarê Dêrikê

- Til Brak, Til Erbîd û Til Tenînîr, li kêleka wan jî Til Hemoker li devera Til Koçer ku li gor daneyan temenê wê heft hezar sal e.

Li bajarê Reqayê jî Keleha Cebar heye ku weke sembol, pêmayeke çandî û şûnwarî û awayeke şaristanî yê bajêr tê dîtin.

Pêmaya dîrokî weke beşa bingehîn û herî girîng a dîroka neteweyan tê dîtin û mafê dîrokî yê xwedîtîya axa piştrast dike. Di krîza heyî ya Sûrîyê de ev alîyê girîng rastî êrîşan hat û ev yek di kiryarên rêxistina sawkar (Daiş) de li Tedmur û Mûsilê dîyar bû. Wêne û dîmenên li ser medyaya civakî, asta hovîtîya li hember şûnwarên arkeolojîk û muzexaneyên dîrokî, piştî bidawîkirna hebûna rêxistina Daişê li erdnîgarîya herêmê, nîşan didin. Çeteyên dewleta Tirk a dagirker heman rêbaz û şêwazê dişopînin û belgeyên ku ji Efrîn û Serêkanîyê hatin asta êrîşa hov li hember cihên şûnwarî nîşan da.

Ji ber ku şûnwar dizîn û ax talan kirin, ji bo jinavbirina nasnameya dîrokî, cografî û etnîkî ya herêmê.

Rêveberîya Xweser binpêkirinan belge dike û daxwazan pêşkêşî sazî û rêxistinên navdewletî yên pêwendîdar dike, her wiha Rêveberîya Xweser dikare bername û planan ji bo parastina tiştên heyî deyne, bi rê sûrihkirina deverên şûnwarî û danîna wan di nav bernameya xwendinê de di hemû qonaxan de û birina xwendekaran bo seredana wan. Rêveberîya Xweser jî dikare sûdê ji hin bajarên ku berxwedaneke qehremanî û dîrokî li hember rêxistina sawkar a Daişê nîşan dane bigire, wek Kobanî û qaşo paytexta xîlafetê ango bajarê Reqayê, û cihên taybet wek mûzexane ji bo danasîna qehremanîya ku li van bajaran pêk hat ava bike. Gundê jinan ku li kêleka bajarê Dirbêsîyê hat avakirin jî weke gaveke pêşeng bû. Her wiha dikarin geştîyarîya navxweyî ya xwezayî li herêmê geş bikin ku zêdetir guh bidin deverên xwezayî yên ku herêmê û xizmetkirina wan bi toreke rê û veguheztinê, her wiha çandina daran li wan.

**Pûxte**:

Em dibînin ku li herêmê gelek astengî li pêşîya van pirojeyên piçûk û navîn hene, ku em dikarin bi kurtasî wiha bi lêv bikin:

- Hin biryar û yasayên nelicih yên ku ji alîyê dezgehên îdarî ve tên derxistin ku ji ber kêmbûna karzanîyê û nenasîna  dezgehên pîşesazî û beşdarnekirina kesên peywendîdar di van biryaran de tên encamdan.

- Sînordarbûna bazarên bakur û rojhilatê Sûrîyê û zehmetîyên li pêşîya hinartina berhemên xwemalî bo welatên cîran, di nav de gumrik û burokrasîya li derîyên sînorî û sedemên din.

- Kêmbûna wizeya guncaw ji bo xebatê, û nebûna terxanekên sotemenîyê ji bo xebitandina jeneratorên kargehên pîşesazî.

- Nebûna laboratûwarên guncaw ji bo dîyarkirina pîvanên kalîteya hilberînê ji bo çavkanîyên hinartî û hawirdekirî.

- Wizeya neyînî ya xwe ku di nava pîşesazên de veşartiye û tirsa mayînde ji gefên leşkerî li dij herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê, çi ji alîyê dewleta Tirk a dagirker, rejîma Sûrîyê û hevalbendên wê ve çi ji rêxistinên sawkar ên ku Daiş û komên girêdayî wê nûnertîya wan dikin.

- Hişmendîya pîşesazî nayê bipêşxistin, bi taybetî ku herêm weke herêmek tenê çandinî tê dîtin û zîhniyeta çandinîyê hîn jî li gelek alîyên jîyanê li herêmê serdest e.

Di encamê de bakur û rojhilatê Sûrîyê di hemû alîyên navborî de weke herêmeke xam tê dîtin, û ji ber vê yekê em rûbirûyî qadên berfireh ên kar in û her pirojeye li vê herêma cografî dê serkeftî be. Rewşa sîyasî û aramîya ewlehîyê şertekî bingehîn e ji bo afirandina atmosfereke guncaw ji bo xebata aborî. Her wiha gelek girîng û pêwîst e ku şert û mercên hawirdorî Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyê û çawanîya bikaranîna van şert û mercan ji bo xizmetkirina gel û welatîyan were berçavgirtin û di heman demê de erdnîgarîya herêmê bi tevahî weke herêmeke tranzîtê bi kar bîne. Her wiha divê vebrhênana çakanîyên heyî bi rengekî guncav bê kirin ku di paşerojê de ev heyber û çavkanîyên xwezayî bidomin. Li kêleka wê jî divê guh bi girîngîya cihêrengîyê di binkeya hilberîna herêmî de were dan, weke beşek bingehîn a bicîhanîna pêdivîyên navxweyî û bi qasî ku gengaz peydakirina hewcedarîyên bingehîn, ji bo derbaskirina rewşên keysbazîya derve û xwespartina aborîya civakî, li vir em dikarin bibêjin ku girîng e ku em li ser pirojeyên piçûk û navînbisekinin û piştgirî bidin wan ku bibin hîmên bingehîn ên pirojeyên mezin.

Bê gunam ew xemsarîya ku herêmê di heyamên berê de rû bi rûyî maye, divê bibe sedema sereke û bingehî ji gelên herêmê re ji bo pêşvebirina wê û derxistina wê ji vê rewşê. Helbet ev mijar di serî de barê rewşenbîr û akademîsyenan e, meyla wan a sîyasî û hizbî çi dibe bila bibe. Çimkî cotkar îro berpirsyarê pisporîya xwe ye; ew û kesê pîşesaz, bazirgan û akademîsyen jî. Avakirina welat li ser milê hemû zarokên wê ye, her yek li gorî wize û derfetên xwe. Heger şervan parastina ewlekarîya vî welatî dike, wê demê divê mamoste nifşan li ser hezkirin û rêzgirtina fedekarîyên leşkeran perwerde bike. Her wiha divê cotyar jî vê xaka ku berîya avê bi xwîn û xwêdan tê avdan biparêze. Helbet herêm hîn di destpêka rêwîtîya xwe de ye û ji ber vê yekê jî berdewamî, berxwedan û parastina destkeftîyan beşeke girîng e di paşerojê û rojên bê de. Erdnîgarîya aborî ya bakur û rojhilatê Sûrîyê pir alîkar e di kişandina veberhênan de, bi rêya naskirina Rêveberîya Xweser a ku niha herêmê birêve dibe û çawanîya beşdarîya bi bandor û erênî di nûavakirina welat de.

## Çavkanî û Jêder:

*1- Erdnîgarîya aborî û erdnîgarîya hilberîna jîndarî - Mihemed Rîyad û Kewser Abdilresûl, 1996, Weşanger: Sazîya El-Hindawî, dubarekirî 2015.*

*2- Erdnîgarîya aborî - Dr. Mehdî Ehmed Reşîd, Weşanger: Dar El-Cenadrîyah, dubarekirî 2015.*

*3- Erdnîgarîya aborî - Dr. Mihemed Xemîs El-Zûka, Weşanger: Dar El-Me'rîfa, 1974.*

*4- Erdnîgarîya aborî ya bakur û Rojhilatê Sûrîyê (pela federalîya serkeftî) - Çeleng Ûmer, Weşanger: Kovara Rojhilata Navîn a Demokratîk 2017.*

*5- Li ser aborîyê - Abdullah Ocalan, Weşanxane: Akademîya Zanistên Civakî ya Abdullah Ocalan.*

*6- Weşanên statîstîkî yên demkî ku ji alîyê Wezareta Çandinîyê ya Sûrîyê ve tên derxistin.*

## Hizra Selefî ya Cîhadîst ya derbasî Herêma Kurdistanê bûye, Û selefîyeta xwecihî ya nûjen li Herêma Kurdistanê

**D. Cewad Kazim El-Beydanî**

*Rêveberê Peymangeha Iraqî ya Lêkolînên Kurdî*

### Pêşgotin

Li gor lêkolînkirina rêbazên hizra siyasî ya tevgerên cîhadî diyar dibe ku ew tevger tenê belavkirin û cîhadê dikin, tu karê siyasî yê bibandor nekirine. Hizirvanên van rêxistina jî bawer dikin ku ew nerînên xwe ji şerî'eta Islamê werdigirin; ji xwe di nerîna wan de ku cîhad li ser her kesekî musilman erkek e, her wiha li gorî bawerîyên wan, kesê karê belavkirinê dike mucahid in, girtîyên di zindanan de mucahid in, alîgirên wan jî yên tên kuştin (şehîd) bi nav dikin, kesên xwekuj (daxwazkerê şehadetê) ne. ev karên han nîvê wan bi karên sawkarî des pê kirine. Gelo rastîya vê cûdahîyê çi ye? Van koman îdyolojîyên xwe ji ku wergirtine?

Ramana cîhadê di nava nerînên siyasî yên tevgerên islamî di cîhana islamî bi giştî de di dema cenga Felestînê ya 1948 de, diyar bû, di piratîkê de jî di gelek şêweyan re dederbas bû, lê hin kes jî bawer dikin ku tevgerên cîhadî bi xwe karvedaneke xwezayî li hemberî pêla binpêkirina gelan bûn. Tevî ku ev şîrove di hin waran de bê goman rast e jî, lê sedemên diyarbûn û pêşketina vê diyardeyê gelekî tevlîhev in. Lewra pir şaş e ku mirov çavên xwe ji bandora sedemên aborî yên ku berê xelkê dane tundîyê, bigire. Lê pêşveçûnên siyasî di civaka islamî de hiştin ku şêweyên derbirîna armancên hin ji van koman bi awayên din bin; ji xwe di navbera daxwaza çakkirinê û çûna ber bi tundîyê de, gelek cûreyên derbirînê hene ku di civakên islamî de belav bûn. Diyar e ku ev komên han ji ber xwe de ji civakên xwe dest pê kirin û bilez xwe berdan nava wan civakan û di wan de belav bûn. Hinek ji wan rêxistinan bi karê hûrbînî û rêxistina hevgirtî dihatin naskirin, her wiha cûreyên din hene ku bi

tevlîhevîyê tên naskirin, dibe ku karên serkêşên van koman nîşaneya çawanî û şêweya karên van rêxistinan be.

Ji van koman rêxistina ( Cundûlah, Ensarûlislam, koma Tewhîd a islamî, rêxistina Elqaîda, Daiş û hwd). Gelo ev komên han daxwaza çi dikin? Çi bandora wan ya ramanî li ser Herêma Kurdistanê heye? Çiqeysî bandora wan li ser kolanê heye?

Lêkoler dê hewil bide van pirsan û hin pirsên din bersiva bide, lê berî ku em derbasî nava vê mijarê bibin, gerek e em xalekê girîng diyar bikin ku ew xal jî bi wate û têgînên ku tevgerên islamî navên xwe ji wan wergirtine, girêdayî ye.

Diyardeya îslamî an jî îslama siyasî rastî qeyraneke girêdayî têgehên pê ve girêdayî ye, ku bi têgehên curbicur hatiye binavkirin, dibe ku yên herî diyar ev bin: hişyarîya îslamî, tevgerên îslamî, tevgerên cîhadî, rêxistinên tekfîrî, rêxistinên çekdar an jî radîkalîzma îslamî… HWD. Hevokên nû û têgehên din jî dikarin li gorî guhertina bên sazkirin. Diyardeya îslamî rastî kêşeya têgehan tê: "Ev qeyran di navbera krîza rewşê di bingeha avahiya têgehê û pêkhateyên wê yên cihêreng û bîra wê ya dîrokî de ne." Xuya ye ku ev têgîn bi awayekî dirust nayên bikar anîn; ji ber ku bi awayekî berfireh di alavên ragihandinê yên rojavayî û erebî de tên belavkirin, ku rastîya wan diyar nake. Eger ku bikaranîna van têgînan bi vî awayî berdewam bibe, dibe ku rojekê ji bo Islamê jî bibin peyveke alternatîf, û Kesên nemisilman bi rêya bikaranîna van têgînan û jêderên wan, bêyî ragihînin ku mebesta wan Islam û Misliman in, xirabîyê bi Îslamê bikin; lewra wêneya tundrewî û terorîzmê û di mejiyê gel û hikûmetan de, dibe beşek ji baweriya Îslamê. Her yek ji van têgînan bi wateyên cihêreng ve girêdayî ye, ku ew wate jî di navbera system û sîstemeke din de, ji hev cûda ne, wek mînak têgeha Binyadgirî (fundamentalism/ الأصولية), ku wateyên wê yên cûdacûda li gorî demê hene, her wiha derbarê wateyên din de jî.

Ji bo ku em şîroveya van têgehan dirêj nekin, emê hewil bidin ku hinan ji têgînan bikar bînin da ku rêxistin û partîyên islamî yên herî nerim yan jî yên nerim, diyar û cûda bikin. Wek mînak, dema em dibêjin: (rêxistin yan jî tevgerên cîhadî) tê wateya rêxistin, tevger û partîyên ku ji bo cîbicîkirina armancên xwe yên siyasî, rêbaza (çekdarî) bikar anîne.

## Çawanîya Islamê li Herêma Kurdistanê:

Bi destpêka gihîştina dagîrkerên Ereb yên ku ola Islamê bi xwe re anîn re, gelê Kurd yek ji wan gelên ku bi vîna xwe bawerî bi islamê anîye, pişt re jî kurdan belavkirina ola islamê ji bo bîr û bawerîyên wê, li xwe girtine. Ji xwe xaka Kurdistanê jî bindestî cihnişîna (xilafeta) islamî bû, êdî Kurd jî bûn parçeyek ji cihana islamî, lê belê nerîneke din a cûda hebû, ku li gorî wê, Kurdan cîhadîyeke mezin kirîye, û piştgirên wê nerînê dibînin ku ew gorên li hemberî sînorên Îran û Iraqê, yên ku bi navê "gorên gawiran" tên naskirin, tirbên pêşîyên Kurda ne, yên ku li hember talankirina erebî û islamî, li ber xwe dane. Ya herî girîng di mijarê de ew e ku Islam di giştî herêmên ku Kurd li wan jîyan dikin de, bi awayekî pir fireh, belav bûye.

Seranserî dîroka şaristanîya Islamê ya dûrûdîrêj, rola kurdan a erênî û bibandor li ser hemî astan hebû, ji nava Kurdan jî zanayên mezin, dîroknas, fermandarên leşkerî û wêjevan derketin. Bi derbasbûna demê re kurd fêrî zimanê erebî bûn û ola Islamê jî derbasî jîyana wan bû û bû parçeyek ji dîrok û kelepora wan, lew ra ji alîyên xwe de kurdan jî ola Isalamê belav kir, ta radeyekê ku kurdan di hilgirtina ola Islamê û belavkirina zimanê erebî de, hevrikîya ereban bi xwe jî, kirin. Rola kurdan di berevanîya di ber ola Islamê, şîrovekirina Quranê û berevanîya di ber pîrozgehên musilmanan de, hebû. Ji xwe rola wan a xurt û bibandor di Cengên Xaçparêzan de, nayê paşguhkirin.

Tevî ku piranîya Kurdan rêgeha imamê Şafi'î di têgihiştinê (الفقه) de, û rêgeha imamê Ebûlhesen El-Eş'erî ( 324koçî -935Z mirîye) di bawerîyê (العقيدة)de, li xwe girtine jî, lê vê yekê jî rê li ber lixwegirtina rêbazên Sûfî yên ku di nav Kurdan de belav bûne, negirt. Wek mînak: Rêgeha Qadirî, ku bi ser Şêx Ebdilqadirê Cîlanî ve ye (561koçî-1826Z mirîye), rêgeha rifa'î ku bi ser şêx Ehmedê Rifa'î ve ye (578koçî- 1182Z mirîye), rêgeha Neqşibendî ya ku şêx Xalidê Neqşebendî (1242koçî- 1826Z mirîye) li Kurdistanê belav kir. Di sedsalên borî de şêxên rêgehên Sûfî û peyrewên wan ji zana û meleyan, ji bo birêvebirina ol û sincan di Kurdistanê de, rokleke mezin lîstin; lewra jî her kesê ku dûrî haydarî û ramanên wan diçu mîna jirêderketî bû, û nabe asankirin pê re bibe; Ji ber vê yekê jî , her êrîşek li ser wan mîna êrîşa li ser Islamê bû. Lê piştî ku komek ji ciwanan ramanên selefî li xwe girtin, rewş li Herêma Kurdistanê dest bi guhertinê kir; ji xwe ev li xwe girtina ramanên selefî berovajî bawerîya Sûfî ye.

Jixwe li Herêma Kurdistanê, Tesewuf nîşaneya herî belavbûyî bû, ew jî ji ber hinek sedeman bû, ku dibe ji ber belavbûna rêgehên sûfî û lixwegirtina pêşengên wan ji wan rêgehan re li deverên Beyara û Tewîla li Rojhelatî Silêmanîyê, Kerkûk û Hewlêrê, be. Lê gihiştina ramana selefî û guhestina wê ji bo Herêma Kurdistanê, piştî Şerê Cîhanê yê Duyem, û lixwegirtina komeke Kurdan ji ramanên neteweyî û Çepgirî re, hişt ku piranîya şêxên wan rêgehan, cih û qedrê xwe ji dest bixin, ev yek jî li gel parastina hinek ji wan serkêşan ji meznahî û gewretîya xwe ya olî û civakî re.

Diyar e ku çend sedem hene ku hiştin pêla ramana (selefî) li Herêma Kurdistan belav bibe, ji wan yên herî diyar jî ev in:
1. Bêhêvîkirina ku bi xelkê re çêbû, ew jî bi sedema siyasetên hin oldaran (xwedîyên rêgehên sûfî) yên li dijî hemneteweyên xwe bûn, ku hejmareke nehindik ji wan destên rêjîmên desthelatdar girtin.
2. Binketina Tevgera neteweyî ya Kurd ji bo cîbicîkirina doz û pêşniyarên ku gelê Kurd li xwe girtibû.
3. Dilpijînên madî yên ku hejmareke nekêm ji ciwanan bi se xwe ve kişand.
4. Ev yek jî tevî rola ku hinek oldar bi armanca belavkirina vê bawerêyê, pê rabûn. Mîna mele Hemdî Ebdilmecîd ê selefî[1] yê ku çend xortên kurd ji bo xwendinê, şandin Siûdîyê.

Ji xwe hinek sedemên din jî hene ku hiştin ev pêl mezin bibe, dê lêkoler di nava vê lêkolînê de, wan şîrove bike.

**Bîrûbawerî û armancên tevgerên cîhadîst:**

Diyardeya tundîyê (teror) ku bi komên selefî yên li Herêma Kurdistanê ve tê girêdan, tevî bandora wê ya neyînî jî, lê ew diyarde bi awayekî balkêş li gund û bajarên Herêma Kurdistanê, belav bûye.

Diyar e ku armanca sereke ya van rêxistinan rûbirûbûna partîyên cîhangir bû, gazîyê şoreşgerî jî bal kişandin ser wan rêxistinan, meylên ramanî yên van rêxistinan bandor li gelek ciwanan jî kir, ew meylên ku daxwaza şerê gawiran û derxistina wan (vê carê ji Kurdistanê) dikirin, ji xwe gawir jî di nerîna wan de ew kesên ku bawerîyê bi nerîn û ramanên wan nayînin, ew ramanên ku daxwaza tunekirina perestin û kiryarên ku xweda û pêxember destûr bi wan

nedane. Vê meylê jî ciwanên tax û gundên hejar yên ku hewl didin jiyana xwe ya zehmet biguherînin, bi ser xwe ve kişand.[2]

Li gorî nerîna rojnameya Elşerq Elewset " rewşa hejarî û pêdivîyê, ji bo belavkirina hizir û ramanên wan yên ku regezên şoreşgerî dihilgirin, sedema amadekirina zemîneke guncaw bû, lê tu îdyolojîya zelal li gel wan rêxistinan tune ye[3]. Dibe ku sedema diyarbûna karvedaneke tund, ew siyaseta tund be, a ku li ser islamîyan hat meşandin, her wiha nekarîna partîyên cîhangêr ji bo avkirina îdyolojîyeke nû ku li gorî pêşveçûnên di herêmê de çêbûne û dê çêbibin, be. Xaleke girîng jî heye ku ewjî ev e: Berfirehbûna cûdahî û dûrbûnê di navbera desthelatdar û gel de. Ji xwe hikûmeta Herêmê hewil da ku Kurdistana Iraqê li ser hemî astan nûjen bike, vê nûjenkirinê jî hişt ku rûbirûbûn di navbera kevneşopî û nûjenkirinê de rûbide. Ji ber ku kesên kevneşop tenê teknolojîya ewropa (rojava) dixwazin, lê bawerî û nirxên wê naxwazin.

Van kartêkeran, kirîza di vavbera desthelatdar û hejaran de gur kir, her wiha bûn sedema diyarbûn û peydabûna şepêlên islamî yên tundrew (selefî), diyar e ku hêzên herêmî û yên navneteweyî ji bo livandin û gurkirina wan şepêlan li gorî berjewendîyên xwe, tev gerîyane; vê yekê jî bandoreke neyînî li têkilîya di navbera partî û şepêlên olî û yên cîhangir de, kir.

Komên selefî yên li Kurdistanê, digihêjin cîhana islamî, bi tevgerên selefî yên li dewletên cûda yên cîhanê ve jî, girêdayî ne; ev girêdan jî li ser du bingehan ava dibe: yekem, hevrêzîya rêxistinî, ku bi rêya wê dikarin operasyonan bikin û leşkeran jî hilbijêrin. Duyem, ew rêxistin bi heman îdyolojîyê ve girêdayî ne, ku- li gorî wê idyolojîyê- kesên rikber yan jî yên bawerîyê bi îdyolojîya wan nayînin, bi durketina ji olê û derketina ji Islamê û bêbawerîyê, tometbar dikin; lewra daxwaza rûbirûbûn û şerê wan dikin; çimkî di nerîna wan de ev yek erkê wan yê rewa ye.

Li gorî ku diyar dibe, komên Cîhadîst (selefî) ji milê rêxistinî ve, cûda ne; hinek ji wan bihtir nêzî rêxina çekdarî ku li ser şopa selefîtîyê ne, û avakirina dewletê li ser zemîneke ku zagona islamê li wê deverê serdest be, daxwaz dikin, ew dewlet bila li cihekî biçûk mîna (Beyara) û gundên derdora wê be jî [4]. Hineke din xwe wekî kom didin naskirin, ew jî bi rêya hebûna wan di nava hinek çînên diyar ji civaka kurdî de, ew çînên ku bawerîyê bi îdyolojîya cîhadê

tînin, ew bawerîya ku li ser bingeha karê şoreşgerî yê çekdar ji bo pêkanîna armancên xwe yên siyasî, ava dibe.

Hebûna rêxistinên çekdar li bajar û gundewaran tune ye, alîgirên wan bihtir li gundewarên dûr yan jî li deverên Kurdistanê yên asê dimînin, piranî jî çalakîyên xwe li deverên navborî, dikin.

Tê zanîn ku komên cîhadîst yên (ta radeyekê) di tax û gundên hejar û dûr de, xwedî cemawerin, ew in yên herî bi bandor, ku ew kom pişta xwe bi bidestxistina ciwanan bi rêya alavên xwe yên ragihandinê, xurt dikin. Diyar e ku di vê mijarê de, mizgeft alava herî girin e, ji xwe alaveke din jî heye ku ew jî civîn û hevdîtinên rêxistinkirî ne, an jî hevdîtinên rasterast bi gel re ne.

Diyar e ku ev kom ji ber hewldana bidestxistina projeyeke siyasî -li gorî zanebûna xwe- bi rewşa siyasî ya giştî li Başûrê Kurdistanê û rewşa herêmî û navneteweyî bandor dibin; lewra ew bi bijardeyên siyasî yên tevgerên islamî yên ne tund (nerim) yên ku xwe sipartine kiryarên aştiyane, bi taybetî baskê nerim yê tevgera (Iwanulmuslimîn), bandor dibin. Vê rewşê jî hişt ku ev kom bi komên nerim û partîyên siyasî re tevlî hevrikîyên xurt bibin, di encamê de têkilîya van koman bi bûyeran re rasterast çêbû. Berovajî vê yekî, li alîyê din, komên çekdar ên ku ta demeke nêzîk tu giringî nedidan bijardeyên siyasî, her wiha tu girinîyê nadin hevrikîya siyasî û ramanî bi qeysî ku giringîyê didin karê li ser zemînê, ev rêxistin bi îdyolojîyeke tenê bawer dikin, ku ew îdyolojî di çareserkirina nakokîyên wan bi desthelata Başûrê Kurdistanê re, mafê bikaranîna çekan dide wan.

Rewşa giştî ya ku herêm jiyan dike, hişt ku ev kom rêbazeke cûda bişopînin, ku ew rêbaz ji karê şoreşgerî yê çekdar cûda ye, lewra bijardeya siysî şopandin, her wiha heman rêbaza ku komên islamî yên tund bikar tanîn, şopandin; anku komên di karê xwe yê rêxistinî de li ser du rêbazan kar dikin, bi ser hebûna baskekî wan yê çekdar de jî, projeyeke siyasî jî li xwe girtin, êdî dest bi karê civakî, çandî û werzîşî li gel karê olî jî kirin, ev çalakî jî bûn yek ji bingehên hin baskên komên islamî. Li vir, Pirsek jî heye: gelo îdyolojîya van koman li gorî bawerîyên wan, hatîye guhertin? Gelo çi sedem û palderên wan hene ku rêbaza çekdarî ji bo tekeskirina hebûna xwe, bi kar bînin?

Armanca tevgerên islamî yên tundrew, guhertina civakên heyî ber bi civakên islamî yên rast li gorî pîvanên Quran û Sunet û cîhadê ve ye, ev

rêxistin li kesên dijberî bawerîya xwe wekî kesê ji ola xwe derketî, dinerin. Kesê ji ola xwe derketî jî: ”nabe li ser wê derketinê bimîne; an dê vegere û poşmanîya xwe diyar bike, an jî dê were kuştin” [5]. Li gorî van rêxistinan, cîhad ne berevanî di ber kesayetê de ye, lê di ber jinavbirina civakên berî islamê (cahilîyetê ) de ye: "cîhad bi armanca jinavbirina dema berî islamê (cahilîyet) ye".[6]

Li gorî nerîna wan rêxistinan, ola islamê xwedî sîstemeke îdyolojîk a tekûz e ku têra hemî alîyên jiyana civakî dike û di nav de jiyana siyasî jî, ev sîstema han ji bo jiyana mirovatî ya binirx, sîstema herî gunaw e. Lewra, ev rêxistin nerînên alîgirên baskên din ên islamî napejirînin, rêxistin û komên (Selefî) yên Cîhadîst xwe wek nûnerê tekane ji ola Islama dirist re dibînin, bi rêya vê yekê jî dixwazin guhertinekê di sîstema heyî  ya siyasî, aborî, civakî û çandî de çêbikin, lê ev guhertina han di hin alîyan de li ser wan bi xwe jî çêdibe, lewra di dema hewldanên wan ji bo guhertina derdora xwe de, ew bi xwe jî bi rêya bandorbûna bi derdorê re, rastî guhertinê tên.

Pêwîst e em bizanibin ku ev guhertinên di dema dawî de di nava tevgerên cîhadîst de rûdan, nayên wateya guhertina îdyolojîya wan, tevî ku van rêxistinan (tevger) karê xwe yê leşkerî li dijî partîyên cîhangir û sazîyên wan ta radeyekê rawestandine jî, hîna bi îdyolojîyekê bawer dikin û jê venegerîyane, lê rewşên herêmî û navneteweyî bandor li siyaseta wan kirîye.

Ebdulfetah Botanî dibîne ku[7]: "Islama siyasî, ji bo kontrolkirina kurdan û berdewamkirina kontrolkirina welatê wan, şêwazeke nû ye; çimkî dem êdî nema derfetê dide talankirin, tepeserkirin û lihevkirina ji bo binpêkirina mafên gelan." Botanî berdewam kir:" di dîroka Kurd û Kurdistanê de, hin rewş û qonax hene ku hin komên kurdî bi sedema ol an mezheb, ji gelê xwe dur ketine, û kurdayetîya xwe jî bi sedemên çewisandin, netewperestî û siyasetên desthelatdaran, ji bîr kirine, dibe ku ev jî hin xwestekên cûdaxwazîyê li gel kurdên Îzîdî, Şebek û Elewî diyar bike" [8] Islama siyasî bi hemî şêwe û rengên xwe, pilaneke ji derve de ye, ku armanca wê afirandina tevlîhevîyê di Kurdistanê de ye (li gorî nerîna Ebdulfetah Botanî, Mihemed Nûredîn jî vê yekê erê dike)[9]; li gorî nerîna Nûredîn: hemî projeyên ku islamîyan li Tirkiyê pêşkêş kirin, li dijî kurdan bûn. Ji bo em kaxezan tevlîhev nekin, pêwîst e em bibêjin ku du pêl hene: yek nerm e û ya din tund e. ew pêla tund ya ku em li ser diaxivin, di projeya xwe ya siyasî de, rêbaza Selefî ji

li xwe digire, ew projeya ku li ser bingeha tundî û tunekirina alîyê din, ava dibe. Vê pêla tund şer li dijî Cîhangirîyê ragihand. Ev tevgera han bi navendên derve ve girêdayî ye û ew navend fetweyan jê re radigihîne û siyasetan jî jê re nexşe dike. "li gorî nerîna Hadî Mehmûd, ev şêwaz û rêbaza han ji bo Kurdistanê neguncaw e, ji ber ku piranîya kurdan li ser mezhebê Şafi'î ne "[10]

Tundiya olî ya cîhadîst ku tevgerên cîhadîst li xwe girtine, gelek sedemên wê yên kûr û dûr hene; hineke dibînin ku ev tundî li dijî stemkarîya ku gelê kurd rastî hatîye, karvedaneke normal e. Hineke din jî dibînin ku rewşa aborî roleke mezin ji bo pêşveçûna vê diyardeyê lîstiye.[11] ya girîng ew e ku ev kom di belvkirina ramanên xwe de, hizra çekdarî bihtir ji guftûgoyê, bikar tînin, û gelek caran ji bo balkişandinê, bi karên leşkerî radibin, ew bi xwe jî bawerîyê tînin ku ew bi rêya karê leşkerî dikarin xwe li ser zemînê xurt bikin, ev yek jî dihêle ku ew li dijî islama guftûgoyê be, ew Islama li ser vê ayetê ava dibe: {bi rêya herî baş, bi wan re bide û bistîne} [12]

**Bawerîya cîhadî:**

Diyar e ku selefîyeta cîhadîst ya ku derbasî Herêma Kurdistanê bûye, û selefîyeta xwecihî ya nûjen li wê deverê, li ser projeya xwe ya bingehîn lihev kirine, ku ew proje li ser rûbirûbûna dagîrkeran, û sizadana kurdên beşdarî proseya siyasî bûne, yan jî sizadana kurdên ku desthilatdarîya hikûmeta Herêma Kurdistanê pejirandine yan jî yên di sazîyên wê de kar kirine, ava dibe. Hinek ji wan koman rêbazeke islamî ya tund ji bo guhertinê, bikar tînin. Ew jî di wê rêbazê de xwe dispêrin nivîsên Ebû Ele'la Elmewdûdî, Seyid Qutub, nivîsên komên islamî yên misrî di salên heftêyî de, nivîsên prof. Ebdela Ezam, rêbaza selefî ya cîhadîst ku ew ji berhemên kurdên Efxan û erebebên ku hatine Herêma Kurdistanê ye, û nivîsên kesên selefî yên cîhadîst.

Ev koma han bawer dike ku cîbicîkirina tişta ku ew dibîne cîhade, bi xwe jî erkekî rewa (şer'î) ye. Her wiha hin fetwe ji wê re bûn mîna derfetekê ji bo kuştinê, heta ku sedema wê kuştinê cûdahîyên fiqhî jî bin. Li ser zimanê Ibin Teymiya hatîye ku kesê yek ji fermanên (ferîdeyên) Islamê mîna limêj û rojîyê pêk neyîne, kuştina wî rewa ye. [13]

Eger destjêberdana limêjê yan jî destjêberdana erkekî din ji erkên Islamê, mafê bikaranîna kuştinê dide alîgirên van koman, jixwe nepejirandina

bawerîya wan û ciyawazîya ji nerîna wan jî mafê bikaranîna kuştinê dide wan. Li gorî nerîna wan koman, ew kesên pêwendîdar bi partîyên cîhangêr re mîna gawirên ku xwe bi misilmanan parastine, kuştina wan jî li gorî karê wan rewa ye, pêwîst e werin kuştin, ji ber ku ew li gorî fetweyên Ibin Teymiya (728koçî-1327z mirîye) gawir in, li gor wê yekê jî ji bo kuştina endamên her du partîyên sereke (PDK- YNK) destûr dane, her wiha ji bo kuştina  gawir, yên ji dînê xwe derketî û kesên alîkar bi hêzên gawiran re, destûr dane; Tevî ku ev yek bibe sedema kuştina "misilmanên bêguneh"  yên ku ew wan bi "xwîn parastî" bi nav dikin, yên ku dibe dinav re û bi sedema tundîyê bên kuştin. Tê zanîn ku "mijara mertalîyê" bi xwe li Ibin Teymiya vedigere, ku wî di dema rûbirûbûna moxoliyan de ev nerîn diyar kiribû. Ibin Teymiya dibêje: " Imamên Islamê lihev kirine ku eger gawiran hinek misilman ji xwe re mîna mertal bikar anîn, û eger misilmanan şer nekir, dê tirs li ser wan çêbibe,  destûr ji bo armancgirtina wan misilmanên mertalgirtî heye, û armanca me jî dê gawir bin, û li gorî yek ji du nerînên zanyaran, dibe ku em li ser wan misilmanan jî netirsin.

Ew kesê di ber cîhada ku xweda û pêxemberê xwe ferman pê dane de were kuştin, û ew bi xwe zilim lê hatibe, dê şehîd be, roja Qiyametê jî dê li gorî niyeta xwe were zindîkirin, jixwe kuştina wî jî dê ji kuştina wan kesên bawermendên mucahid dikujin, ne xerabtir be. Eger cîhad bi xwe jî erk be û eger ji musilmanan jimara ku xweda erê kiribe, werin kuûtin jî, hat gotin ku kesê ji misilmanan di rêza wan de ji bo cîhadê were kuştin, ji vê yekê ne mezintir e.(14)

Diyar e ku fetweya Ebû Qetade di mijara pejirandina operasyonên xwekujî de, yên ku komên cîhadîst li xwe girtine, li ser fetweyên Ibin Teymiya ava dibe. Ebû Qetade di fetweyeke xwe de operasyonên xwekujî pejirandin, ku di wê fetweyê de dibêje:" ji tiştên ku tevaya zanyaran destûr pê dane ku kesê misilman birayê xwe yê misilman bikuje, di dema ku ew kesê kuştî xwînparastî be de, ew e destûrdana kuştina wî di dema mertalkirinê de… Piranîya zanyaran, kuştina kesên mertal ji ber sedema hebûna mebesteke şer’î û sûdeke binirx, pejirandine, ev yek jî dijmin bênteng dike û derfetê ji bo şikestina wî û biserketina misilmanan, çêdike.(15)

Ebû Qetade vê kêşeyê vedigerîne bo pêxembr (silavên xweda lê bin) û dibêje: "lêxistina hin cihên diyarkirî li gel metirsîya hebûna kesên

xwînparastî, kesek ji zanyaran vê tevlîhevîya di navbera destûrdayîna aqilmend û gumana biçûk de, qedexe nake. Di encamê de, mirov dikare helwesta wan kesên ku vê yekê qedexe dikin, bi axaftinên zanyaran her wiha bi axaftina pêxember (silavên xweda lê bin) derbarê artêşa ku Ke’be dagîr dikir de, vala derxîne."(16) her wiha fetweyên Ebû Mihemed Elmeqdisî ku yek ji hizirvanên selefîyeta cîhadîst li Urdinê ye û şêwirmendê Ebû Mus’eb Elzerqawî bû, ku ew li ser destûrdayîna zanyaran ji bo kuştina kesên mertalgirtî di rewşên taybet de, axivî bû. Ew kuştin jî bi hin mercan ve girêdabû, Ku ew merc jî ev in:

-Nekuştina kesên mertalgirtî, dê cîhadê rawestîne.

- Nekuştina kesên mertalgirtî, dê bibe sedema ku mirov nikaribe bighêje gawiran û wan bikuje.

- ji encamên nekuştina kesên mertalgirtî, dê musilmanan têk herin, pîrozîyên wan binpê bibin, warê wan jî dê were dagîrkirin, û li dawîyê kesên mertalgirtî jî dê werin kuştin. " tevî axaftina wî li ser giringîya tekezkirina li ser armancên leşkerî, ewlehî û hwd, ku ev yek jî dê dijminê xweda biêşîne, her wiha xwest ku ew ji kuştina zarok û kesên ne şervan yan jî yên ne alîkar bi çi awayên alîkarîyê bi şer re, dûr herin, ji bilî ku ew zarok û kesên ne şervan û ne alîkar di teqîn, êrîş û cûreyên din ên şer de yên ku kesên mucahid nikarin wan kesan nekujin, werin kuştin." (17) Xwedîyên vê nerînê xwe dispêrin nivîsa ku di pirtûka imamê Newewî (676Koçî-1277z mirîye) "Şerih Sehîh Muslim" de hatîye, ya ku kesên zana (feqîh) di pirtûkên xwe de bi navê "mijara êrîşa kesekî li ser hejmara gelek ji dijminan " û carnan jî bi mijara " xwebicihkirina di nava refê dijminan de" yan jî " xwexapandina bo cîhadê" bi nav dikin. Imamê Newewî dibêje: xwebicihkirina di nava gawiran de û xwe şehîdxistin, bi nerîna piranîya zanyaran, eger ne bi zorê be, rewa ye." (18)

Imamê Xezalî (505koçî- 1111z mirîye) di pirtûka "Elihyaa" de, dibêje: " Di mijara ku kesekî misilman bi tenê êrîşî refên gawiran bike û şerê wan bike, tevî ku zanibe dê were kuştin jî, tu pirsgirêk tune ye. Dibe ku bi gomana hinekan ev yek ne li gorî ayetê be jî, lê ew bi xwe ne wilo ye. Ibin Ebas (xwedê ji her duyan razî be) gotîye: ew bi xwe ne xwekuştin e, lê xwekuştin ew e ku mirov di ber pabendbûna bi xwedê de mezaxtîyê neke; anku ew kesê vê yekê neke, xwe dikuje" (19)

Imamê Qurtubî (671Koçî-1272z mirîye) di şîrovekirina xwe de, rewatîya vê yekê li gel hinek zanyarên mezhebê Malikî diyar dike – anku êrîşkirina li ser dijmin- ta ku li gorî gotina Qurtubî, hinek dibêjin: "ji bo ku kesek êrîşî sed yan jî komek leşker yan jî komek diz, şervan û jirîderketîyan bike, du rewş hene: ew di van her du rewşan de rewa ye; eger kesê êrîşker bizanibe û piştrastbe ku dê wan kesên êrîşî wan dike bikuje û dê xwe ji mirinê rizgar bike. Her wiha eger bizanibe û piştrastbe jî ku dê ew bi xwe were kuştin, lê dê dijmin biêşîne û dê bandorekê bike ku misilman sûdê jê bigirin."[20]

Ji xwe rastîya mijara êrîşkirina kesekî -bi tena serê xwe- li ser dijminê mezin, her weha xwebicihkirina di nava refên dijmin de û giyanê xwe ber bi wêrankirinê ve birin, ew e ku bi mijara kesê tekfîrî yê ku xwe xapandiye û di kombûna (kafiran) de bi tena serê xwe bicih bûye û xwe kuştîye, vê yekê jî kuştin, birîndarkirin û nefret di nava wan de peydakir. Komên çekdar (tekfîrî) dest bi pejirandina van nivîsan kirin û kiryarên xwe li gorî tiştên ku di van pirtûkan de hatine behs kirin, rewa nîşan didin. tevgerên selefî/cîhadî yên Kurdistanê li gorî wan fetweyan, ramanên xwe piştrast kirine. û ew bû sedemek ji bo pêkanîna operasyonên xwekujî yên ku Pêşmerge, Asayîş û serkirdeyên kurd kirin armanc, li ser wê bingehê ku ev hêz hevkarîya kafiran dikin, lewra kuştina wan û kuştina yên ku bi wan re hevkariyê dikin, rewa ye.

Ji ber vê yekê, mirov dikare bibêje ku hebûna van koman di nava xelkê de li ser sê bingehan ava dibe: Gazîkirin, rêxistin û şerkirina wan kesên ku hevparan ji xweda re çêdikin. Ew di vê yekê de xwe dispêrin pîvanên olî û dîrokî, jixwe ew li xelkê dinerin wekî ku xelk hevparan ji xwedê re çêdikin, lewra gazîkirina wê xelkê bo Islamê erkekî pîroz e, her wiha jî rêxistinkirina wê xelkê û pêşxistina karînên wan, pişt re jî şûrên xwe bilind dikin û cîhadê jî radighînin, wê demê ji xelkê jî tê xwestin ku rêya xwe hilbijêrin; yan ragihandina poşmanîyê (tewbeyê) yan jî mayîna li ser rêbaza hevparçêkirina bi xwedê re, tu bijarde ji bilî mirinê pê de, li pêş kesê hevparçêker tune ye.

**Encam:**

Komên selefî yên li herêma Kurdistanê di cîhana Islamî de xwedî berfirehî ne, û bi tevgerên selefî yên li welatên cûda yên cîhanê ve girêdayî ne. Ev pêwendî li ser du bingehên sereke ye: yekem hemahengîya rêxistinî ye, ku dikare di pêkanîna operasyonan de û pêşniyarkirina şervanan, de were bikar

anîn. Bingeha duyem jî, nêzîkatîya van rêxistinan di mijara îdyolojîk de ye, ji ber ku dijberên xwe an jî yên ku di warê îdyolojîk de dijberî wan e, bi dûrketina ji olê û derketina ji Islamê, tometbar dikin, û wan kesan wekî gawir dibînin û banga cîhad û şerkirina wan dikin; ji ber ku ew di wê baweriyê de ne ku ev yek li ser milê wan, erkekî rewa ye.

Diyar e ku komên cîhadîst (selefî) di warê rêxistinî de ji hev cûda ne; hinek ji wan nêzîkî rêxistina çekdarî ne, ku rêbaza selefî û cîhadîst dişopîne, û dawaza avakirina dewletê dike, ew dewlet li ser xakekê be ku di bin desthelata şerî'eta Islamê de be, bila li herêmeke biçûk mîna (Beyara) û gundewarê wê be jî.

Hinek komên din hene, ku xwe wek kom didin nasîn, ew jî bi rêya hebûna alîgirên wan di nava beşekê ji civaka kurdî de, ew beşên ku bi îdyolojîya cîhadîst bawer in, ew îdyolojîya ku ji bo pêkanîna armancên xwe yên siyasî, li ser bingeha karê şorişgerî yê çekdar, ava dibe.

Alîgirê rêxistinên çekdar li bajar û derdorên wan ne pir in, alîgirên wan her dem li bajarok û gundan an jî li navçeyên dijwar û zehmet ên Kurdistanê bi cih dibin, gelek caran çalakîyên xwe li van deveran pêk tînin. Jixwe erdnîgariya Kurdistanê ji bo wê yekê jî, alîkariya wan dikin.

Weke ku tê zanîn, ew komên cîhadîst yên ta radeyekê di tax û gundên hejar û dûr de, xwedî alîgirin, ew in yên herî bi bandor; jixwe ew kom jî di mijara bidestxistina ciwanan de, ku ciwan bijardeya wan ya herî girîng in, piştа xwe bi alavên xwe yên ragihandinê, rast dike. Diyar e jî ku mizgeft alava herî girîng û berbiçav e, herwiha alaveke din jî heye, ku ew jî civîn û hevdîtinên birêkûpêk in, an jî hevdîtinên rasterast bi gel re ne.

Diyar e ev komên han û bi rêya hewildana ku bibin xwedî projeyeke siyasî, li gorî zanebûna xwe, bi rewşa siyasî ya giştî li Herêma Kurdistanê û rewşa herêmî û navneteweyî, bandor bûn. Lewra em dibînin ku ew kom bi bijardeyên siyasî yên tevgerên islamî yên nerim, yên ku ta radeyekê xwe disipêrin kiryarên aştîyane, bi taybetî bi baskê nerim ji (Ixwanulmuslimîn), bandor dibin. Vê rewşa han hişt ku ev kom bi komên nerim û partîyên cîhangir re bikevin nava hevrikîyeke xurt de, di encamê de jî ew bi awayekî rasterast, rûbirûyî bûyeran hatin. Li alîyê din, berovajî van koman, rêxistinên çekdar yên ta demeke ne dûr tu giringî nedidan bijardeyên siyasî, jixwe ew

tu giringîyê nadin hevrikîyaên siyasî û ramanî bi qeysî giringîdana bo karê li ser zemînê. Ev rêxistinên han bi îdyolojîyeke tenê bawer dikin, ew îdyolojîya ku derfetê dide wan koman ku di çareserkirina kêşeyên xwe bi desthelata Herêma Kurdistanê de, çekan bikar bînin.

-----------------------------------------------------------------------

**Çavkanî:**

*1- Mele Hemdê Ebdilmecîdê selefî, sala 1958-1959z ji Sûriyê hatîye Iraqê, li Musilê bicih bûye, di belavkirina ramanên selefî de bûye alîkar, li gorî gotina wî ew li Şamê li ber destê şêx Mihemed Nasiredîn Elelbanî fêr bûye, têkilîyên wî yên xurt bi Siûdîyan re hebûn ku wî ew têkilî di şandina ciwanan de bo siûdiyê ji bo xwendinê bikar tanî. Di destpêkê de li gel parêzer Cercîs Fethelah û li gel kesayeta çepgir mele Enwer Elmaî li Mûsilê kar kir. Pişt re jî tevlî tevgera selefî bû, ew jî rihkur bû, gelek goman jî li derdora wî hebûn ku e limêj nake û rojîyê nagire, ev yek jî lo gorî gotina gelekan ji pêşmergeyên ku di wê demê de pê re dijîn 1960-1970z. Mele Hemdî pir zîrek bû, ta ku çend caran şîfreyên artêşa iraqî vekirin. Binehêre, Enternêt, Mele Xorşîd Reşad Zêbarî, Hilgirê Selefîyetê li Kurdistanê di navbera piştevanî û berdandinê.*

*2- binêre: D. Cewad Kazim Elbeydanî, Tevgerên cîhadîst li Kurdistanê, Ç1(Bexdad, Peymangeha iraqî ya lêkolînên kurdî, 214m), R. 30, www.alsaher.net/mjales/144460.htm*

*3- Hîwa Ezîz, tobedarên ji rêxistina Ensarusuna, Elşerq Elewset, hejmara 10537 / Cotmeh/ 2007*

*4- www.aljazera.net/portai/temalater/postiongs*

*5- Muhemed bin Şakir, Helwesta ji nerîna din, kovara Elbeyan a Siûdî, sala 19an, hejmara 206, Şewal 1425, Mijdar/Berfanbar 2004, R.11*

*6- Ehmed Elmûsillî, Ferhenga Tevgerên islamî li Cîhana Erebî û Îran û Tirkiyê, Ç2 (Beyrût, Navenda Elwehade Elerebiya ya Lêkolînan 2005) R 224*

*7- Islama Siyasî li Kurdistanê- Iraq Têbînî û hestên dîrokî û siyasî, Ç1 (Duhok, çapxaneya zanîngeha Duhokê 2012) R.118*

*8- Heman çavkanî, R119*

*9- Tevgera Islamî li Tirkiyê, Belavokên navenda Lêkolînên Asyewî ya bi nave: Tevgerên Islamî li Asyayê, nivîsa û serrastkirina Elaa Ebdulezîz Ebûzêd, Ç1, (Qahira, Navenda Lêkolînên Asyewî 1998), R.178*

*10- Elttewzîf lilfikir Eldînî, ç1, (Duhok, çapaneya Elxanî 2008), R197*

*11- komek lêkoer, Elherekat Elislamiya Elmuasira Fî Elweten Elerebî, ç4 (Beyrût, navenda Elwehde Elerebiye ya lêkolînan) R140*

*12- Sûreta Elnehel, Ayeta 124*

*13- Ibin Teymiye, Teqîudîn Ebûlebas Ehmed bin Ebdilhelîm bin Ebduselam (728h-1327z mirîye), Elfetawa Elkubra,( Beyrût, Dar Elkutub Elilmiye 1408h-1978z) beşa 2, R32. ji bo zanyarîyên bihtir derbarê vê mijarê de, binêre: Cewad Kazim Elbeydanî, Elherekat Elcîhadie fî Kurdistan Eliraq, çavkanîyeke borî ye.*

*14- Ibin Teymiye, Elfetawa Elkubra, (Beyrût, darulkutub Elilmiye,1408h-1987z) Beşa 3, R.522. Artêşa Mexolî, musilmanên dîlgirtî di êrîşên sengeran de bikar tanîn, an jî ew dixistin pêşengîya hêzên xwe yên êrîşker de. Jixwe vê yekê jî hişt ku Ibin Teymiye vê fetweya ku destûrê dide kuştina kesên xwe mertalkirî, derxîne.*

*15- Enternêt, Toreya berevanîya di ber Suna de. http://www.dd-sunnah.net/forum/showthread.php?t ،https://vb.tafsir.net/tafsir18130/.*

*16- Heman jêder.*

*17- Enternêt, Toreya berevanîya di ber Suna de. http://www.dd-sunnah.net/forum/showthread.php?t. .*

*18- Ebûzekeriya, Muhyedîn bin Şeref Elnewewî (676 Koçî- 1277z), Elminhac Şerh Sehîh Muslim Bin Elhecac, (Beyrût, dar Ihyaa Elturas Elerebî, 1392 koçî/795z) Beşa 13, R.46*

*19- Ebûhamid Mihemed bin Mihemed Elxezalî Eltûsî (505koçî- 1111z, mirîye) Ihyaa 'ulûm Eldîn, Beyrût, Dar Elme'rifa, bê dîrok) Beşa 2, R. 319*

*20- Elqurtubî, Ebû Ebdilah Muhemed Bin Ehmed Bin Fereh Elensarî Elxezrecî (671koçî-1272z mirîyê), Elcami' li Ehkam Elquran (Tefsîr Elqurtubî), lêkolîn: Ehmed Elberedûnî û Ibrahîm Etfîş, çapa 2 (Qahira, dar Elkutub Elmisriye, 138 koçî-1964z) Beşa 2, Rûpela 363*

*21-www.aljazera.net/portai/temalater/postiongs*

# Tirkî û Tirkên Çîyê

## Faris Osman

Tu carî ferwerîya tirk doza kurdî li welêt mîna dozeke sîyasî yan jî çandî nehesibandîye ku pêdivîya wê bi çareyeke sîyasî heye, bervajî wê tevgera kurdî bi hemû awayan, tevgereke sawka û cûdaxwaz didîtiye, lewra bi hêza leşkerî nêzîkatî pê re kiriye. Êdî hemû desthilatên tirk û bi teybet artêşa tirk bi sedsalî ev stratejî ji bo nêzîkatîya bi doza kurdî şopandine.

Sîyaseta artêşa tirk bi tenê sîyaseta şewitandina erdê û qirkirina niştecihan bû. Berê û heta niha jî durişma vê sîyasetê “hilkirina sawkarîyê” ye, da ku bihaneyan ji hovîtîya xwe ya li dij kurdan re derxe. Çimkî di hevdîtineke rojnameya Zeman ya tirk de, general “Doxan Gureş”, serokê desteya bineartêş (erkan) ya tirk yê kevin, di civîneke bi efserên tirk re got: “Min ji wan re got fermana ku ez didime we ne rewa ye, em ê pey wan bikevin û wan li her derê bikujin. Heke pêdivî pê hebe, em ê weke e general Muglalî[1] bikin.”

Îro ku em sedsalîya Lozanê bi bîr tînin, axiftina tirkan li dor peymana Lozanê û "mîsaqa milî" careke din zêde dibe ku bûye rojeva ragihandina tirkî. Ragihandina tirkî dibêje ku Lozan bi tu rengî ne girêdayî rastîya dîrokî ye, dibêjin ku “pendên veşartî” di peymanê de hene ku Tirkîyê ji derxistina dewlemendîyên xwe yên binerd bêpar dihêlin yan jî temenê vê peymanê sedsal e û dê Tirkî careke din heyamên şahinşahîya Osmanî vegerîne. Piştî ku Hevpeyman nêzî awayeke dawî bûn ji bo dabeşkirina pêmaya dewleta Osmanî di kongireyên San Rîmo, Qahîre û Lundunê de û piştî ku xwe spartin xalên sereke yên di peymana Sîverê de (1920), ji bilî xalên girêdayî Kurdistanê û Ermenistanê, banga lidarxistina kongireyeke taybet ji bo rêkeftina dawî di navbera hevpemanan û ferwerîya tirk de were kirin, ew jî li

[1] Gerneral Mustefa Moglalî, efserê tirk yê ku di 30 tîrmeha 1934an de sih û sê gundîyên kurd li devera Qilqilîyê nêzîkî bajarê Wanê bi tawana qaçaxîyê bi guleyan kuştin.

bin navê Kongireya Karûbarên Rojhilata Navîn ya ku bi navê “Lozanê” tê zanîn.

Nûnerên "Ingilîzistan, Fransa, Îtalya, Japonya, Romanya, Yûgoslavya" û Amerîka (weke çavdêr) beşdarî konferansê bûn û şandeke Yekîtîya Sovyetê ku nûnertîya Rûsya, Ukrayna, Gurcistan û Bulgaristanê dikir, bi hevbeşî hat vexwendin da ku bi tenê di gotûbêjkirina pirsa tengavan de beşdar bibin, ev bi dilê Tirkîyê bû, çimkî hêvî dikir ku hêzeke mezin weke Yekîtîya Sovyetê li kêleka wê di vê awaya navneteweyî ya girîng de raweste, jixwe ev yek bi rastî jî çêbû, ji ber ku di navbera Sovyet û Tirkîyê de di gelek waran de helwesteke hevbeş hebû.

Yek ji encamên herî girîng ên peymana Lozanê, nepejrandina neteweya kurd bû, ew jî tevî sozên Mustafa Kemal, Îsmet Înonu û hin din ku digotin ev walatê tirk û kurdan e, ew jî li gor belge, daxuyanî, pirtûkên fermî û nameyên ferwerîyê eşkere. Lê piştî ku peymana Lozanê hate morkirin, netewperistên tirk angaşt kirin ku tu netewe bi navê "kurd" û tu ax bi navê "Kurdistan"ê tune ne û yên ku ji bilî tirkî bi zimanekî din diaxivin tirk in û bi koka xwe tirk in, lê ji ber jîyana li çîyayan zimanê xwe yê dayîkê ku zaravayek ji zaravayên tirkî ye ji bîr kirine. Loma divê alîyên fermî yên tirk, bi taybetî yên çandî û zanistî, wan ji nû ve tirk bikin û bi darê zorê tevlî tirkîyetê bikin, ew jî ji bo nasnameya neteweyî ya kurd ji holê were rakirina, tevî cûdahîya wan di her tiştî de, weke nijad, ziman, xak, çand, dîrok, erdnîgarî û kevneşopî.

Di 3 adara 1924 de, di heman rojê de ku Ataturk şahinşahîya Osmanî ji holê rakir, bi biryarnameyekê axaftina bi zimanê kurdî qedexe kir û hemû dibistanên olî yên ku tê de perwerdeya bi zimanê kurdî dihat dayîn hatin girtin. Dirûşmên weke "Yek milet, yek al, yek dewlet û yek welat", "Yek Tirk hêjayî hemû cîhanê ye" û "Kêfxweş e ew kesê ku dibêje ez tirk im" bilind kir. Jixwe ev mandele bi awayekî fermî derket holê, ew jî dema ku serfermandarê leşkerî yê tirk Ebdela Alpdogan, bikaranîna peyva "kurd" ji bo danasîna gelê Kurdistanê bi tevahî qedexe kir, ew weke tirkên çîyayî bi nav kirin û ji medya û sazîyên fermî xwest ku kurdan bi navê tirkên çiyê bi nav bikin. Êdî bi gotinekê navê kurdan û dîroka wan ji holê hat rakirin û roja din navê "Kurd" û Kurdistanê di belgeyên fermî, nameyên ferwerî û ragihandina Tirkîyê de winda bû. Êdî ji ber dijwarîya pêkanîna vê yekê li ser erdê bi hêza çekan, rayedarên Tirk serî li rêyên din dan, di nav de:

1- Ji bo ku angaşta ku dibêje "kurd tirkên çîyayî ne" tekez bikin û awayekî akademîk bidin wê, zanyarên dîrok, nijadnasî (antropolojî) û zimannasiyê erkdar kirin.

2- Ragihandina fermî peywirdar kirin ku wê derewa bi rengê zanistî; belav bikineke, weke azîya radyo û Tv ya dewletê, peymangeha çandê, sazîya ziman û komeleya dîrokî ya tirkîyê, ew jî ji bo bilindkirina dîrokî ya tirkan ya di pêşketina şaristanîya mirovatiyê de, tekezkierina nerîna ku dibêje tirk di dîrokê de kevintirîn gelê ku şaristanî dîtiye û şaristanîya Tirkîyê weke bingeha hemû şaristanîyên cîhanê ye.

3- Qedexekirina bikaranîna zimanê kurdî di sazîyên dewletê de.

4- Guhertina navên gund û bajarên kurdan.

5- Welatî neçar kirin ku nav û nasnavên tirk li xwe bikin.

6- Arastekirina dezgehên ferwerî û dadwerî ji bo pêşxistina vê angaştê

Bi şopandina van sernavan û yên weke wê, em asta xapandina zanistî û dîrokî dibînin ku desthilatên tirk piştî konferansa Lozanê bi kar anîe; ew jî bi armanca tunekirin û windakirina nasnameya kurd, bi mandelkirina koka nijadî yê serbixwe yê kurdan û hebûna zimanekî neteweyî ji kurdan bixwe û angaşta ku zimanê ku kurd pê diaxivin yek ji zaravayên zimanê qereçîyan e. Lewra ev yek bû sedem ku beşekî berfireh ji kurdan ên ku amade bûn ku dev ji kurdîtîya xwe berdin, zû dev ji zimanê xwe berdin û ji axaftina bi kurdî şerm bikin.

Êdî ji ber ku Tirkîyê nekarî nasnameya neteweyî ya kurdî ji holê rake, kuştinên komî û koçberkirina bi darê zorê bi kar anî. Jixwe koçberkirina bi darê zorê ber bi herêmên dûr ve, yek ji wan rêbazan bû ku bi tundî li dijî gelên ku doza mafên xwe dikirin di serî de kurd, dihat bikaranîn. Piştî peymana Lozanê (1923) koçkirina bi darê zorê bi biryarên fermî zêde bû. Mistafa Kemal piştî ku şoreşa Şêx Seîdê Pîran ji holê rakir, di Îlona 1925 de, zagona koçberkirinê "rakirin, belavkirin" derxist ku 206 gundên kurdan hatin wêrankirin, 8758 mal bi temamî hatin şewitandin û rakirin û hejmara kuştîyan bêhitirî 50 hezarî bû û termê Şêx Seîd Piran tevî 47 navdarên Kurdistanê û alîgirên şoreşê, li Amedê li pêş Mizgefta Mezin hatin bi darvekirinê. Êdî dîmenên bidarvekirinê yên berdewam û dubarekirî li

Kurdistanê heya roja îro bûne beşeke ji bîranîna nifşên Kurd. Jixwe piştî jinavbirina şoreşê, li hemû herêman pêvajoya tolhildanê dest pê kir, ne tenê beşdar û alîgirên şoreşê, lê ji wan kesên ku ne bi navê şoreşê û ne jî navê Şêx Seîd bihîstibûn, li dijî kurdan dest pê kir. Weke komkujîya Aleqemeşê ya sala 1926 ku tê de 1343 kes ji vî gundê ku li ser sînorê Tirkiye-Sûriyê ye, hatin kuştin, her wiha di sala 1926 de komkujîya Hasdê ku bû sedema kuştina 21 kesan, di nav wan de melayê gund û 7 feqîyên ku li mizgeftê dersên olî ji wî digirtin.

Piştî şoreşa Agirî “Ararat” a sala 1930, piranîya gundên derdora çîyayê Araratê wêran bûn, ji ber ku artêşa Tirkîyê li ser rêya xwe ber bi serê çiyê ve, zêdetirî 1120 gundên kurdan wêran kirin û hejmara kuştîyan, li gor texmînên fermî, gihîşte zêdetirî 40,000î ku laşên wan Geliyê Zîlan nixumand. Di îlona sala 1930 de rojnama tirkî "Milliyet" di rûpela xwe ya pêşîn de wêneyeke çîyayê Agrî û gorek li ser xêz kiribû û li bin nivîsandibû: "Kurdistana aşopî li vir hatiye veşartin." Her wiha wezîrê dadê yê Tirkîyê Mehmûd Esed Beg, piştî têkbirina şoreşê nivîsarek pêşkêş kir û tê de got: "Divê dost û dijmin bizanibin ku axayên vî welatî (Tirkî) ew kes in ku xwîna tirk ya sade di damarên wan de digere û her kesê ku li welatê tirkî xwîna tirkî a sade di damarên wan de negere, tenê mafekî wî heye, ew jî bibe kole û navmalî."

Piştî demekê ji têkbirina şoreşê û ji bo ku nehêlin kurd malên xwe ji nû ve ava bikin an jî kar û barên xwe bi rê ve bibin, ferwerîyê di sala 1932 de zagonek derxist ku tê de li hemû herêman tevî gundan jî li ser kesên ku zimanên wan ne tirkî ne, ji nû ve avakirina xanîyan qedexe kir. Di sala 1934 de zagona bicihkirinê hate derxistin ku li gor wê divê kurdan ji herêmên wan koçber bikin û tirkan li şûna wan bi cih bibin, ev sîyaset piştî sala 1936 tundtir bû dema ku navê Dêrsimê yê dêrîn ku temenê wî navî bi hezarên salan e, bi Tuncelî guhartin. Ji ber vê yekê di salên 1937-1938 de serhildana Dêrsimê ya bi pêşengîya Seyîd Riza pêk hat, rayedarên tirk komkujîyên mezin weke qirkirinê pêk anîn û herêm bi tevahî ji gelê wê vala kirin. Di 4 gulana 1937 de Encûmena Leşkerî kaxez bi ser bajar û bajarokên kurdan ên li herêmê de avêtin, di kaxezan de ev nivîsîbûn: ”Yên ku bi dilxwazî xwe radestî ferwerîyê bikin, dê bi rengekî dadmendane bên darizandin, lê kesên ku guh li fermanên ferwerîyê nekin, bila bizanin ku artêş li çar alîyên bajêr hatiye belavkirin û dê bi temamî qira wan bîne”. Biryarek ji aliyê Encumena Wezîrên Tirkîyê ve hat

derxistin ku tê de wiha hatibû: (Wêrankirina gundan û koçberkirina malbatan, bûye yek ji wan pêdivîyan ku li Dêrsimê li ser wan hatine sepandin ku wan pêk bînin, êdî eger me êrîş bire ser navendên serhildanê û çek hilgirtin, divê ew bên tunekirin). Artêşa tirk di bin navê ”Pêvajoyên cezakirin û koçberkirin” de, bi hilweşandina malan, koçberkirina xelkê û qirkirina şênîyê gund û hemû herêman, dest bi şerê li dijî gel kir. Her wiha rêbazên ku dûrî mirovahîyê ne; weke dest avêtin jin û zarokan, zikê dayikên ducanî çirandin û pitik kuştin. Hejmara kuştîyan gihişte zêdetirî 70,000 û derîyên şikeftan li herêmên çîyayî hatine girtin, da ku bibin gor. Bi sedhezaran kes ji hemû herêmên wîlayetê li rojavaya Anatolîyayê li ser pîyan bi darê zorê hatine koçberkirin.

**Di Dawîyê De**

Em dikarin li gor danasîna Balyozê Emerîkayê yê li Tirkîyê Hinrî Morî Gentû (Henry Moore Gantaou) di navbera salên 1913-1916 de, wêneyê kesê tirk dîyar bikin: ”Kesê tirk kesekî tirsonek e; dema ku tişt li gor dilê wî bin, şêr e, lê dema ku dijminên wî li wî dicivin, ew bindest, rezîl û bêhêz e. Dijminên xwe pîs dibînin. Bingehên civaka şaristanî; abe, nivîsîn, pirtûk, helbestvan, huner û avahîsazî li nik tune bûn. Tu bajar ava nekirin, ji bilî zorê, tu zagon nas nekirine. Biserkeftin wiha fêm kirine ku êrîşî gelên ji xwe pêşketîtir bikin û şaristanîya wan ji xwe re bibin.

Kesê tirk heman kes e ku di serdemên Navîn de ji deştên Asyayê derketiye û piştî pênsed sal têkilîya bi şaristanîya Ewroûpî re, mîna bav û kalên xwe li ser ramana koletîkitin, talankirin û bêcirbûn bi gelên ku di warê leşkerî de têk çûne”.

Encama herî girîng jî ew e naskirina derûnî, nêrîna mirovê tirk ji xwe re û ya li hemberî cîhanê û dijminatîya ku di hişmendîya wî de li hemberî kurdan veguheriye tirsa ji kurdan (kurdofobîyê) ye.

Bêyî ku mirov xwe bispêre van bingehan, zehmet e ku mirov sîyaseta Tirkîyê ya li hember kurdan rast şîrove û analîz bike.

## Guhertina Tirkîyê ji sîyaseta xwe ya di Sûrîyê de

Hêvî û xewnên Tirkîyê di Sûrîyê de piştî ku xwepêşandanên gel li dij rêjîma Esed, ji xwepêşandanên aştîya ne di 2011 de wergerîya şerekî çekdarî, pir mezin bûn. Rêjîma AKP-MHP ji xwe re derfet dîtibûn ku vî şerî ji xwe re bi kar bînin û serwrîya xwe bi rêya Ixwanûlmuslimîn û islama radîkal re, li ser Sûrîyê bisepînin, lewra Tirkîyê li ser zimanê serokkomarê wê Erdogan destnîşan kiribû ku ew ê rêjîma Şamê helwişînine ku heta dawî alîkarî dabû komên çekdar, her wiha himbêza xwe ji rikberîya Sûrîyê re vekiribû ku di encamê de rikberîya sîyasî jî bi demê re di bin nave Hevgirtina Sûrî girtiye dest xwe, ta sala 2015 gelek ji xaka Sûrîyê ketibû bin destê rikberîyê, lêbelê bi destwerdana rasterast ya Rûsîya di şerê li Sûrîyê de, rewş tev hate guhertin ku lêdanên giran li rikberîyê dabû û rêjîma Sûrîyê bi ser xwe ve hatibû, di 24 mijdara 2015 de Rûsîya dîyar kiribû ku balefirên Tirkîyê F16 derbasî ezmanê Sûrîyê bûne û balefireke Rûsî SO 24 xistiye, ew jî tevî ku Tirkîyê dîyar dikir ku balefira Rûsî di ezmanê Tirkîyê de ketiye. Xistina balefire Rûsî û di pey re jî lêdana 2016 li himber rêjîma Erdogan ku ta neha jî cihê gumanê ye ku pilaneke AKP-MHP bû, ew jî ji bo xurtkirina desthilatdarîya xwe bi buhaneya hebûna kompleyeke hundirîn bi alîkarîya dewletên Rojavayî li ser serwerîya Tirkîyê û rêjîma wê ve, ev her du bûyer hiştin ku Tirkîyê bi Rûsîya re têkilîyan xurt bike û têkeve nava lihevkirin û danûstendinên ku bi navê Asîtana û Sotç hatine pênasekirin de. Di pey van pêşketinan de, rikberîya çekdar ya girêdayî Tirkîyê, ji gelek deverên mîna Heleb, Xûta û deverên din, vekişîyane û di Idlib û Bakûr û Rojavayê Sûrîyê de, bi cîh bûne, anku rêjîma Sûrîyê bi alîkarîya Rûsîya û civînên Asîtana û Soçî, rikberî di goşeyeke biçûk de tengav kiribû, lê li himber van pêşketinên rêjîmê jî, Tirkîyê di 24 tebax 2016 di bin navê pêngava "Mertala Feratê" de, derbasî Cerablos bibû û şalyarê berevanîyê yê Tirkîyê Fikrî Işik yê wê demê, dîyar kiribû ku armanca Tirkîyê ew e ku nehêle kurd her du peravên Çemê Ferêt bi hev ve girê bidin, êdî di 2018 de Efrîn û di 2019 de Serêkanîyê û Girêsipî dagirkirir.

Tevgerên leşkerî yên Tirkîyê ji derveyî sînorê xwe di Lîbîya û Sûrîyê de, hemleyên bê navber li ser Başûrê Kurdistanê, tengavbûna wê di sîyastên xwe

yên derve de, nakokîyên bi Emerîka û Ewrûpa re û sîyastên xwe yên hundirîn, bûne sedem ku Tirkîyê derbasî rewşeke aborî ya pir dijwar bibe û rewşa aborî li ber wê kirîza koçberên Sûrîyê di nava wê de jî gur bibe, ji ber kirîza aborî û sîyasetên AKP-MHP rêjeya alîgirên wan daketiye asteke pir nizim, ew jî di demekê de ku çavê AKP-MHP li hilbijartinên 2023 bûn ku careke din desthilatîya xwe berdewam bikin .

Ji bona ku nûnerê AKP-MHP Erdogan di hilbijartinên 2023 de bi ser keve, pêwist e ku gelek astengîyan ji ber xwe rake, ew astengîyên ku ji ber kiryar û sîyaseta wî ve ya hundirîn û ji derve de pir bûne, di nava van astengîyan de û çi dema ku rêjîmên berîya Erdogan jî ketine van rewşan de, her dem berê xwe dane şerê li himber kurdan, lewra dûbare Erdogan gefên dagerkirineke nû li ser Rojavayê Kurdistanê daye, jixwe herî dawî ji despêka 2022 ta roja îro gefên xwe dûbare dike, her wiha êrîş û hemleyên xwe ji 2015 de li ser Başûrê Kurdistanê, li ser qadên parastinê yên Gerîlayên Kurdistanê ranewestandiye. Li Rojavayê Kurdistanê ji bo êrîşeke nû, tu erêkirinên navneteweyî wernegirtiye, her wiha di çîyayên Kurdistanê de jî, li himber Gerîla bi ser neketiye, di heman demê de kirîza koçberên Sûrîyê di hundirê Tirkîyê de jî pir giran bûye, her wiha hilbijartinên 2023 dema wê pir nêzîk bûye, hingê jî xweguhertin bûye pilana xwemayindekirinê .

**Xapandin Û Keysebazî Ji Sîyaseta Tirkîyê Ye:**

Serokê Tirkîyê ku kesek nema û pê re neketiye nava nakokîyan de, di bêhnikê de hatiye bîra wî ku xwe biguherîne, li şûna gef, zirt û xwenîşandana sultanekî osmanî qehreman, kesayeteke nû derketiye pêş, kesayeteke aştîxwaz, mirovhez  û agirên nakokîyan di navbera dewletan de vedimirîne û ew bi xwe  xwe ji serok û dewltan dixwaze, wî qebûl bikin û nakokîyên berê bibûrin, lewra bi Siûdîyê, Îmarat, Misr û Israîlê re ketibû nava danûstendin û daxwaza dostanî û hevaltîyeke nû kiribû, êdî neha jî di rêza lihevkirina bi Sûrîyê re ye. Rast e di nava ferwerî û dewletan de, ne dostanî û ne jî dijminatîya domdar heye ku her dem berjewendî hene û berjewendî sîyasetên wan dîyar dikin, lê belê dewleteke weke Tirkîyê ji dîroka avabûna wê ve, bawerîya tu kesî pê nehatiye û ne lê ewle bûye, ji ber ku her dem sîyaseta xapandin û keysbazîyê kiriye ku bi vê sîyasetê re jî, bi dehan komkujî li ser gelên resen yên Rojhilata Ravîn û derdora xwe de kirye; çi Ereb, Suryan, Aşûr, Ermen, Yûnan, kurd û hwd û çi di navbera dewletan de, sîyaseta

keysbazîyê meşandiye ji Qesra şêrîn ta Sîver, lozan , Sotç û Asîtanayê û hîna jî di vê sîyasetê de berdewam e ku ev lihevkirinên bi dewlet û serokan re beşeke berdewamîya sîyaseta keysbazî û xapandinê ye, hingê jî di bawerîya min de ew dewlet jî dizanin û vê lîskê bi Erdogan û Tirkîyê re dimeşînin. Ta çi astê Tirkîyê di xweguhertinê de bi ser ketiye? Ta niha jî tevî ku li ber çavan bi ser dikeve, lê belê ew serkeftin pir cihê gumana ne. Di derbarê Sûrîyê de jî, di demekê de ku Tirkîyê gefên êrîş û dagirkirinê li ser Rojavayê Kurdistanê de dikir ku çep û rast gef belav dikirin; him li himber Xweserîya Demokratîk û him jî li himber Rûsîya û Emerîka û her dîyar dikir ku ew ê guh nedin tu kesî û bi serê xwe dê tev bigerin, lê ji nîşkave her tişt hate zîvirandin! Serokê Rûsîya Potîn ji Erdogan re gotibû "Eger tu êrîşekê li ser Rojava yê Kurdistanê bike, dibe ku dewleteke kurdî ava bibe" !!! Jixwe destnîşan kiribû ku pêwist e Tirkîyê bi rêjîma Sûrîyê re tev bigere !!! Gelo mebesta Potîn ji têbînîya ku dibe ku Kurdistaneke çê bibe çi bû? Çi agahî li ber destê wî hebûn? Bê guman ne ji ber xwe ve wiha gotiye û pêwist e baş li ser gotina wî lêkolînkirin hebin, piştî van şîretên Potîn, bangeşeya Tirkîyê li ser hevdîtin û danûstendinên bi Esed re û vegerandina penaberan û pêwistîya jibîrkirina dijminatîya bi hev re ji ragihandin û ji ser zimanê rayedarên Tirkîyê neketiye û yekemcar bi şêweyekî eşkere li Mskovayê vayê serokê saloxgerî û bergerîyê yê Sûrîyê û Tirkîyê bi navkarîya Rûsîya di 28.12.2022 de li hev kombûne.

### Rijdebûna Tirkîyê Di Lihevkirina Bi Rêjîmê Re

Li gor piranîya çavdêrên sîyasî, tevgera Tirkîyê ber bi lihevkirina bi rêjîmê re demikî ye û ji bo rewşeke awarte ye ku tê de Erdogan hewcedarî vê nêzîkatîyê ye ji bo ku bike deskeftiyeke diblomasî û ji hundir ê Tirkîyê re bêje va ye min bi rêjîmê re li hev kiriye û ez ê penaberan vegerînim welatên wan, her wiha ez ê Sûrîyê bikim pireke ji bo derbasbûna berhemên Tirkîyê di nava cîhana erebî de û bi alîkarîya rêjîmê ez ê doza kurdî di Sûrîyê de tune bikiml. Ew jî ji bo ku di hilbijartinan de rêjeya dengan ji bona xwe bilind bike, lê belê ji derveyî van armancan, Tirkîyê di rewşekê de ye ku bawerîya xwe ji Emerîka û Ewrûpayê birîye û dibîne ku bi rûsan re bêtir wê armancên xwe pêk bîne, di heman demê de ji Emerîka re dibêje ku eger tu piştgirîya min nekî ku di hilbijartinan de bi ser bikevim, Rûs amade ne ku kaxetên min yên biserketinê xurt bikin, her wiha ji hundirê xwe re jî dibêje ez dewleteke wiha me ku dikarim bi tena sere xwe sîyaseta xwe ya derve dîyar bikim, eger nekeve

xizmeta Nato de jî wê nikaribe min asteng bike. Bê guman Erdogan lîskekê dilîze ku dê heta dawî nikaribe lîstekvanekî serkeftî be û Rûsîya û Emerîka neçarî xeyalên xwe bike, ev sîyaset bi xwe hebe serkeftineke demekî tê de ji Erdogan re hebe, lê belê di demên pêş de wê rastî xetimandinê were, çimkî pêwist e ku Tirkîyê sîyaseta xwe zelal bike, endamekî Nato ye an jî hevalbendekî Rûsîya ye, çimkî di civîna Natoyê ya li Ispanîyayê de, Nato Rûsîya weke metirsîya sereke li himber xwe nîşan daye, lê Tirkîyê wê yekê nabîne û xebata Natoyê jî lawaz dike, her wiha daxwaza firehkirina Nato jî bi tevlêbûna Siwêd û Finlendayê jî tengav dike, jixwe ev tev jî bê guman pirsin û Nato jî ji xwe dipirse: Tirkîyê hevalbendê meye an yê Rûsîya ye? Lê dîyar e ku Tirkîyê van tiştan baş dizane û tevî wilo jî bi rijd e ku bi Rûsîya yê re tev bigere û tersî sîyaseta Nato û Emerîka bi rêjîma Sûrîyê re jî têkilîyan vegerîne û ji Rûsîya hêvî dike ku rîyên qayîlkirina Tirkîyê di pirsa Sûrîyê de veke, çimkî Tirkîyê jî çembera navneteweyî li dora Rûsîya yê şikandiye û li gor ku dikeve xizmeta Rûsîya de, berfirehkirina Natoyê tengav kiriye. Hingê jî eger gelek çavdêrên sîyasî li xweguhertina Tirkîyê di sîyasetên xwe yên derve de; demekî dibînin, lê em guman dikin ku ne demekîn e, dibe hin armancên demikî hebin, lê belê armanc û pilanên pêşerojê jî di nav de pir in, di beşa armancan de em ê li ser vê xalê rawestin.

### Çi Li Mskovayê vayê Bûye?

Bê guman berîya civîna sêalî di navbera Tirkîyê , Rûsîya û Sûrîyê de, amadekirinên saloxgerî hebûn, ji berîya çend mehan carcaran rayedarên Tirkîyê dîyar dikirin ku hevdîtinên saloxgerî bi Sûrîyê re hene û bi civîna 28. 12. 2022 eşkere ev tişt dîyar kiribûn, êdî di encamê de lihevkombûna serokên saloxgerîyê û şalyarên bergerîyê yên Sûrî û Tirkîyê li Mskovayê li hev civîya bûn, êdî ev cihê lêpirsînan e: Gelo çima Îran jî hevbeşê wan yê Asîtana ne amade bû? Çima Îranê helwesta xwe zû bi zû dîyar nekiribû? Her wiha pirseke din jî heye: Çima Sûrî ewqa ne dilgern bû ji van hevdîtinan?

Di bawerîya min de, civîn ji daxwaza Sûrîyê bêtir, daxwaza Rûsîya bû û dîsa jî ji daxwaza Îranê bêtir daxwaza Rûsîya bû, anku armanc û hêvîyên ji civînê ji her kesî bêtir Tirkîyê û Rûsîya eleqeder dikir, li gor agahîyên piştî civînê ku di ragihandin û rojnemeyan de belav bibû, civîna sêalî li ser van xalan hatinû lihevkirin:

Avakirina komîteyeke sêalî û hevbeş.

Vekirina rêyên navneteweyî û destûrdayîna ji bo derbasbûna alêkarîyên ji bo koçberên Sûrîyê yên li Tirkîyê, di xaka Sûrîyê re.

Danîna rêbazine hebbeş ji bo vegera penaberên li Tirkîyê û amadekirina zemîneke baş ji vê mijarê re.

Li gor ragihandina rêjîma Sûrîyê, Tirkîyê amadekarîya xwe nîşan daye ku wê ji xaka Sûrîyê vekişe.

Xala herî sereke jî ew e ku civîna sêalî ji bo tunekirina Xweserîya Demokratîk û ji hevxistina wê lihev kirine.

Lê gelo bi tenê ev lihevkirinên her sê alîyan e? Bê guman armancên ji civînê Sûrîyê tenê têkildar nake û armancên wan ne tenê pirsa Xweserîya Demokratîk û pirsgirêkên Tirkîyê û Sûrîyê ne, naxwe çi dibe?

**Armancên Demikî**

**-** Dibe Rûsîya texmîn dikir ku şerê bi Ukrayînyayê re çend hefteyan wê derbas neke û wê armancên xwe pêk bîne an jî ji tengavî û ji neçarî derbasî şer bûye, ew jî weke xweparastineke pêşwext ji xwefirehkirina Nato re, lê belê şer wergerîya şerekî demdirêj û vekirî ku li ber çavan bi Ukrayînyayê re ye, lê di rastîyê de bi Natoyê re ye. Ketina Rûsîya di nava şerekî vekirî de û sepandina Ewrûpa û Natoyê sizayên cûr bi cûr li ser Rûsîya yê, Tirkîyê ji xwe re penceeyeke bînberdanê dîtiye, çimkî Tirkîyê tev li wan sizayan nebûye û xwe weke dewleteke bêalî nîşan daye, hevaltîya her du alîyên şer bi hevsengiyeke keysbazî berdewam kiriye, jixwe ev jî di xizmeta Rûsîya yê de bû, her wiha Tirkîyê xwe weke navkarekîyê di navbera Nato û Rûsîya yê de nîşan daye û di heman demê de dergehê xwe ji sermyandarên Rûsî re vekiriye, lewra Rûsîya jî naxwaze Tirkîyê di hin xalan de tengav bike, lewra dixwaze ku bi rêya vegerandina têkilîyên Tirkîyê û Sûrîyê, xeleka tengavîyê li dora stûyê Erdogan fireh bike, mîna mijara koçberan û krîza aborî ku ji Erdogan re ji bo hilbijartinên 2023 de pirsgirêk in, ew jî bi rêya lihevkirina bi Sûrîyê re.

- Rûsîya dixwaze di Sûrîyê de serwerîya xwe nîşan bide û armancên ku dîyar kiribû pêk bîne, anku vegerandina serwerîya rêjîmê li ser tevaya xaka Sûrîyê, lê belê hebûna Emerîka di deverê de jê re astenge, lewra pêkanîna

lihevkirinekê di navbera Tirkîyê û Sûrîyê deç, fişareke Turkî li ser Emerîka di Sûrîyê de xurt dike, her wiha rêveberîya Xweser jî neçar dibe ku bi rêjîmê re bi hin deskeftîyên biçûk li hev bike, jixwe rakirin an jî lawazkirina Xweserîya Demoqratîk armanca sereke ya Tirkîyê ye û Rûsîya dizane eger ev pêk were, dê Tirkîyê dest ji wan çeteyên li ba xwe berde, anku Rûsîya armancên xwe pêk tine.

- Rêjîma Tirkîyê ji bo derbasbûna hilbijartinên serokatî û perlemanî bi dilekî germ û ji xwe bawer bi taybet Erdogan hêvî dike bi lihevkirinên bi rêjîmê re, rêjeyeke mezin ji koçberan vegerîne, her wiha Xweserîya Demokratîk nemîne an dagirkerîyê bike û an jî rêjîm destwerdanê di Rojavayê Kurdistanê de bike. Di Bawerîya Tirkîyê de, îro ew e ku rêya herî hêsan û ji bo xwebigihîne armancên xwe li Sûrîyê, bi hemahengîya bi Rûsîyayê re ye, ew jî li hember neqayîlbûna Emerîka û Ewrûpa ji daxwaz û tevgerên Tirkîyê di Sûrîyê de.

- Sûrî di bin desthilatdarîya sîyasî û leşkerî ya Rûsîya û Îranê de ye û pejirandina rêjîma Sûrîyê ji hevdîtinên sêalî re di bawerîya min de, pê nebawer e; bi taybet ji Tirkîyê ne bawer e, lê belê qayîlkirineke ji Rûsîya re ye, lê mercên lihevkirina bi Tirkîyê re ku rêjîm dîyar dike, em guman dikin ku mercên Îran û rêjîmê ne, lewra di navbera Rûsîya û Îranê de di gelek mijaran de, nehevgirtinek heye, lê Sûrî di heman demê de hêvî dike ku Tirkî ji tengavî kişandina xwe ji Sûrîyê bipejirîne.

### Armancên Demdirêj

Ji hatina Erdogan li ser serdestîya Tirkîyê ve, her dem bi Nato û Emerîka re ketiye nakokî û hevtengijandinê û çi dema ku hin nakokî bi wan re dîyar bûne, gefa dê ber bi hevalbendîyên nû ve here ku berbijêrkên Emerîka û Ewrûpa hene, li wan xwarîye, di heman demê de jî li helwestên xwe di zîvirî û dîyar dikir ku Nato û Emerîka bêyî Tirkîyê nikarin çalak bin an jî ser bikevin, her wiha xwe ji Nato cûda nedikir, bê guman ev helwestên ha; ne ku binezanî dibûn an jî di bin , Tirkî xwe amade dike ku dewleteke navendî be û ji rola xwe ya ku Natoyê ew erkdar kiriye ku her dem leşkerekî Natoyê be û karmendê wê yê li ser sînorê Natoyê yê Başûr be riha bike, anku ew jî yek ji dewletên navendî û xwedî biryara xwe be, êdîs ji bo gihiştina vê pêvajoyê bê guman demeke veguhêz gerek e ku di vê dema veguhêz de Tirkîyê nikare

heta dawî Nato û Emerîka paşguh bike an jî heta dawî bi Rûsîya re ewle be, lewra vê sîyaseta keysbazîyê dide pêş, anku yek ji armancên demdirêj ji Tirkîyê re ew e ku Natoyê neçar bike ku di bin fişarên tevgerandina bi Rûsîya re; Tirkîyê dewleteke navendî bipejirîne.

Tirkîyê di wê metirsîyê de ye ku pêlên guhertinan di Rojhilata Navîn de wê ji xaka wê ne dûr be û guman dike ku ji hêla Ewrûpa û Emerîka ve, pilan hene ku Tirkîyê jî perçe bikin, jixwe metirsîya herî mezin a ku Tirkîyê jê ditirse ew e ku pirsgirêka kurdî têkeve nava pirojeyên ji nû ve sazkirina Rojhilata Ravîn de, jixwe ne tenê Tirkîyê lê belê Îran, Sûrî û Iraqê jî têkilarî pirsgirêka kurdî ye, êdî sîyaseteke hevbeş ya van dewletan li himber doza kurdî ji Tirkîyê re pir giring e, bi taybet li himber Rojavayê Kurdistanê ku Tirkîyê hesab dike ku eger Rojavayê Kurdistanê bibe sabar (statû) wê bandoreke mezin li Bakûrê Kurdistanê bike, lewra yek ji armancên din yên demdirêj ji Tirkîyê re bidestxistina piştgirîya Rûsîyayê û hevkarîya Îran û Sûrîyê ye ku doza kurdî ber xwe nebîne.

Rûsîya jî baş bi giranîya Tirkîyê ya stiratîjîk ji Natoyê re dizane, her wiha baş dizane jî ku eger Tirkîyê bi dest xwe ve bîne an jî ji Natoyê dûr bixe, hevpeymana Natoyê tevî dê ji hev bixîne an jî wê Nato derbasî tevlihevî û nakokîyên hundirîn bike, çimkî Rûsîya ku bermahîya Yekitîya Sovyêtê ye, naxwaze ku xwe hêzeke nesereke an jî di bin gefên Natoyê de bibîne, ji bona têkbirina pergala cîhanî ya yekserwer (Emerîka) dixebite û dûrxistina Tirkîyê ji Natoyê an jî çandina nebawerîya Nato û Tirkîyê bi hev giringiyeke mezin e.

Rûsîya di Sûrîyê de, bi Îran re di parastina rêjîmê de hevbeş e, lê bandora Îranê li ser rêjîmê dîyar dibe ku ji ya Rûsan bêtir e û Îran di Sûrîyê de berfireh dibe ku ev jî ne di rajeya (xizmet) Rûsîya yê de ye, lewra hebûna Tirkîyê di Sûrîyê de û bi lihevkirina bi Rûsîya re, Îranê jî lawaz dike, her wiha rêjîmê jî dixe bin gefan ku ta dawî bi Îranê re li ser hesabê rûsan tev negere, anku yek ji armancên demdirêj yên Rûsîya yê sepandina serwerîya xwe li ser Sûrîyê ye, ew jî bi tengavkirina Îran û Emerîka, jixwe ew jî li ser hesabê dayîna hin deskeftîyên demikî ji Tirkîyê.

Ji bilî armancên van dewletan yên cûda armancên demdirêj yên aborî di navbera van dewletan de têne pilankirin.

**Derfetên Bi Encambûna Lihevkirinên Sêalî**

Gelo gengaz e ev maseya sêalî ku li ser Xweserîya Demokratîk jî di heman sîyasetê de heveş in, wê karibin di mijarên din de hevbeş bin? Her wiha ji derveyî maseya sêalî, gelo Emerîka, Israyîl û Îranê wê bê deng bin?

Eger mirov helwestên her sê dewletên civîna sêalî bişopîne, wê tê derxe ku tevlhevîyek heye, Tirkî pir bi hêvîbû piştî civîna sêalî û piştî hevdîtinên şalyarên berevanîyê yên wan welatan, dema rûniştina şalyarên karên derve jî hema hema dîyar kiribû ku di meha reşmîyhê de ye, lê belê cihê civînê destnîşan nekiribû, di heman demê de şalyarê karê derve yê Sûrîyê, mercên hevdîtinê dîyar kiribû û gotibû: ”çi hevdîtin bibin pêwist e ku berîya wê Tirkîyê ji xaka Sûrîyê vekişe û dest ji komên sawkar berde”, her wiha serokê Sûrîyê jî ev nêrîna wî bû, lê belê Rûsîya geşbînbû ji hevdîtin û lihevkirina Sûrî û Tirkîyê, derfeta herî guncaw ji çareserîyan re dibîne, jixwe herî dawî jî şalyarê karê derve yê Rûsîyayê Birîmakov destnîşankiribû ku ji mafê Tirkîyê ye ku ji sîyaseta Emerîka ya ku dixwaze dewleteke kurdî li ser sînorê Tirkîyê ava bike bitirse, bê guman ev jî ji Tirkîyê xweşkirineke ji bo ku di helwesta xwe ya di derbarê lihevkirina bi Esed re berdewam be, her wiha Îran jî dereng nema û şalyarê kare derve piştî civîna sêalî şandiye Şamê û li ser civîna sêalî dîyar kiribû ku pêwist e lihevkirin di rajeya her du alîyan de be, lê wa dîyar dibû ku ji helwesta Îranê ku nameyan dişîne ji Rûsîya û Tirkîyê, anku ez jî li vir im, lê eger mirov bipirse; di nava nêzîkatîya helwestên Tirkî û Rûsîya ji hev re û neredkirina Îran ji hevdîtinan re, naxwe Sûrîya ku li jêrkontrola Rûsîya û Îran de ye, helwesta xwe ya tund li himber Tirkîyê ji ku ve digre, bê guman ji Rûsîya an jî ji Îranê digire, lê ya nêzîktir Îran e ku naxwaze hevdîtinên Sûrîyê û Tirkîyê di Sûrîyê de bibin deskeftî ji Rûsîya re, ew jî di demekê de ku Îran Sûrîyê hewşa xwe û rîya xwe ya ber bi Libnan û derîyaya Spî dibîne, hinge jî hevdîtin red nekiriye, lê di heman demê de jî rêjîm livandiye ku lihevkirinan red neke, lê daxwazên xwe jî bilind bike ku daxwaza vekişîna Tirkîyê ji xaka Sûrîyê weke daxwazeke rew û ya serwerîyê diyar bike, bê guman Rûsîya jî dizane Îran li paş perdeyê be. Êdî ji van helwestên neyeksan di nava van dewletan de dîyar dibe ku armancên her aliyekî ji yên din cûda ye û ne hêsan e ku zû bi zû xwe komî li ser armancên hevbeş bikin. Sûrî, Tirkî û Îran jî naxwazin Xweserîya Demokratîk rewa bibe, her wiha her sê alî jî dixwazin Emerîka ji deverê vekişe, jixwe ev xaline hevbeş in, lê gelo di rêbazên

pêkanîna van armancan de hevbeş in? Ma bi rastî jî Tirkî qaîl e ku rêjîm bikeve herêmê? Ma rêjîm qayîl e ku Tirkî deverê dagir bike? Ma Îran qayîl e ku Rûsîya serwerîya xwe li ser deverê bike? Ma Rûsîya qayîl e ku Îran di bin navê artêşa Sûrîyê de deverê bigre dest? Ev tev de pirsên ku bê guman hewcedarî bersivan e, her wiha di mijara rikberîya di bin desthilatdarîya Tirkîyê de, piranîya komên ku Tirkîyê piştgirîya wan dike, li ba Rûsîya, Îran û Sûrîyê sawkar in û pêwist e xwe radest bikin an jî tune bibin, lê li ba Tirkîyê rikberî ne û ne wawkar in û pêwist e Sûrîyê wan bipejirîne, di heman demê de, eger Tirkî dest ji wan berde û xwe ji xaka Sûrîyê vekişîne, wê çi çarenûsa wan koman be? Wê çi çarenûsa 4 milyon penaberên di wan deveran de be ku piranîya wan ji ber rêjîma Esed revyane û ji ber ku malbatên endamên wan koman di wir de bicîh bûne? Egr Tirkîyê vekişe, ma pêlên koçberên ku ber bi Tirkîyê ve herin ji ber bi Esed ne ewle ne, wê nebin kirîzeke nû ji Tirkîyê re? Di hêvîyên herî li pêş de ku lihevhatineke bû, wê Tirkîyê çawa penaberên di nava xaka xwe de vegerîne, ma gelo rêjîm dikare di van rewşên aborî û ewlehî de ku pir xerab in, wan himbêz bike?

Ji derveyî dewletên astana û civînên sêalî ve, bê guman Emerîka û Israyîl jî hene ku di Sûrîyê de ew jî xwedî piroje û berjewendî ne, lewra eger Emerîka armancên dewletên civîna sêalî bipejirîne, ev tişt tê wateya ku êdî Emerîka û pê re Ewrûpa jî destê xwe ji Rojhilata Navîn berdidin û radestî Rûsîya, Îran û Çînê dikin, her wiha Tirkîyê li ser hesabê berjewendîyên xwe qayîl dikin û berdeçûna Tirkîyê ber bi Rûsîya ve dipejirînin, ma gelo gengaz e ku di serdema ji nû ve sazkirina pergala cîhanê de û gurbûna agirê Ukrayînya û xwefirehkirna Çîn û Rûsîyayê de, Emerîka û hevalbendên xwe dest ji Rojhilata Navîn berdin û xwe di nava sînorên xwe de bêdeng bikin? Bê guman sînaryoyeke bi vî şêwazî tê wateya ku Emerîka dest ji hêzbûna xwe diqere û pêşengtîya cîhanê radestî Rûsîya û Çînê dike.

Her wiha gelo wê Israyîl qayîl bibe ku bêyî pêkanîna ewlehîya wê û armancên wê di Sûrîyê de, lihevkirin çêbibin û komên çekdar yên Îranî xwe bêtir di Sûrîyê de berfireh bikin?

Lewra em guman dikin ku ta şerê li Ukrayînya bi encam nebe, wê sîyasetên navneteweyî jî li ser Rojhilata Navîn zelal nebin, her wiha li ser lihevkirinên sêalî jî hebe ku Sûrîyê û him Îran jî, wê dereng bixin, ew jî li hêvîya hilbijartinên nîva vê sale yên Tirkîyê û kaxeteke serkeftinê wê radestî

Erdogan nekin, çimkî tu bawerîya  wan bi Tirkîyê û ne jî ya Tirkîyê bi wan heye, tenê metirsîya ji doza kurdî wan li hev dicivîne, her wiha Rûsîya ya ku di çirava Ukrayînya de digevize, wê ne di wê astê de be ku helwestên rêjîm û Îranê paşguh bike û ta dawî ji bo lihevkirinan fişaran bike, ji xwe Emerîka û hevalbendên wê bi zelalî dîyar kirin ku em lihevkirina bi Esed re napejirînin û çareserî li cinêvê ye, ew jî li gorî biryara  encûmene ewlehîyê 2254 e.

# Daiş û baweriya leşkerkirinê

## Pêşgotin

Tê zanîn ku çeteyên bi navê DAIŞ'ê li herêmê binpêkirinên sincî yên hovane pêk anîn, ku herêmê ji serdema piştî rûxandina dagirkeriya Osmanî ev yek nedîtiye, li cihê ku şerê tunekirinê ji xew şiyar kir û ji bo çewisandin û desteserkirinê çanda terorê vejand; bi serjêkirin û şewitandina bi saxî, destdirêjî li jinan, kolekirina zarokan, her wiha lêborîn, dilpakî û dilsozî di hucreyên tarî di hundirê ziqurata tirsê de zindankirin û bi awayekî li gorî xwe navê xîlafeta Îslamî lê kir û Misilman xistin ber sitemkariyeke din ku ji wan re bobelatin nû anîn û ew kirin mertal ji bo pêşîgirtina li ketina mûşekan û çekên kesên li hember wan radibin û Kahînên wan nikarîbûn rastbûna xeyalên ku pêşkêşî wan kiribûn bisepînin, ji ber vê yekê serokê wan di tunelekek mîna tunelên mişkan de hat kuştin; piştî ku ji hêla "kûçikekî" Amerîkî ve hate eşkere kirin. Yên ku li ser destên wan hatibûn xapandin, li kampa Holê û yên din kom bûn, û ji rastiya ku çavê xwe jê digirtin matmayî man. Bi hezaran kahînên teslîmbûyî û girtî di zindanan de ne û hin ji wan bûne sîxurên îstixbaratî yên welatên herêmê ku ew bi kufrê sûcdar dikirin. Xeyal xwedî enerjiyek hêzdar xuya dike, ku xwediyê wê dikare mirovan bike heyînên kontrolkirî, sadîzma ku ji kesên din re tê rêve kirin û mazoşîzma ku ji serweran re tê rêve kirin ber bi astên tund ve dibe. Bi sedan nezan neçar bûn ku bi hezaran kîlometran ji welatê xwe dûr bikevin da ku di vê xeyalê de bijîn û ev tişt li Sûriye û Iraqê pêk hat.

baweriya leşkerkirinê ya DAIŞ xwe dispêre li ser bingeha pêşxistina xapandinê, ya ku hin birînên derûnî derman dike, birînên mirovên ku rastî kiryarên hukûmet û serokên talankerên çandên herêmî yên kevnar, gumana nezanên ku di deryaya efsaneyên serweriya olî de xeniqîne, hatine. Di encamê de bobelateke hovane hat serê mirovan, dar û keviran ku çemên Dîcle û Firatê nikarin şop û bandora wan ji holê rakin, nemaze piştî ku hevrêyekî wan ava her du çeman li pişt bendavên nefret û sitemkariyê girt.

Bîranîna wî dê di paşerojê de; di mîrateya çandî ya gelêrî de bibe çîrokên tirsnak û yên ku şerê wî kirine dê bibin leheng û ji bo nifşên paşerojê bibin pêşeng ku di serdema xwe de li hember kiryarên xwînmijan serî hildin .

Hin lêkolîner, siyasetmedar û pisporên medyayê, jêhatiya leşkerkirina DAIŞ'ê zêde dikin, Dibe ku jî sedem bangeşeyek bazarkarnî be; ji bo ku balê bikişîne ser nerîn û baweriyên xwe yên taybet. Li ser vê mijarê bi sedan lêkolîn û rapor hene. Hinekên din jî hene ku bi teoriya komployê bandor dibin û DAIŞ weke afirîneriya hêzên ku hewl didin cîhanê kontrol bikin dibînin. ji bo wê jî ew xwe dispêrin projekirina têgînên kaosa afirîner û stratejiya mijûlkirinê li ser rastiya siyasî ya tê jiyankirin. Ev mijar bi şarezayiya hin welatan ve girêdayî ye ku rêxistinê wek (bihaneyekê) ji bo xizmetkirina stratejiyên xwe bikar bînin, dibe ku jî ew rêxistin berhema siyaseta dewletekê be, dibe jî ew rêxistin bandorê li siyaseta hin welatên ku têkiliyên xwe li ser bingeha helwesta ku ew li hember wê digirin bike. Ev rêxistin jî di wê baweriyê de ye ku hêzeke xedayî heye leşkeran jêre pêşkêş dike û efsanyan di vê der barê dihûne ku ew bijartya rizgarker e. Nêrînên din hene ku nêzî rastiyê ne, ew jî mijara sûdwergirtina DAIŞ ji serdema têkçûn û daketina El-Qaîde ji ser hiyerarşiya ramana cîhadî piştî kuştina gelek serkirdeyên wê, û nekarîna El-Qaîde ku xwe li gorî jîngeha ewlekarî û paradîgmaya nû ya radîkalya biguncîne ku dibe karaktera gelên ku serhildanan li dijî zordestiya serdestên xwe pêk tînin, ên ku xwe bi îdeolojiyên neteweperestî an olî xemilandibûn,

Ne pêkane ev nerîn bi temamî werin mandlekirin, bê guman di piraniya wan de pêbaweriyeke rêjeyî heye, lê bi giştî ji bo ku mirov bikaribe îdeolojiya leşkerkirina DAIŞ’ê nas bike, divê mirov derûniya kesên ku tevlî wê bûne û rewşên ku hiştine ew propagandaya rêxistinê ya ku xwe dispêre ser geşkirina tundirwtiyê ya kesên belengaz, hem jî demagojî û hem jî yûtopyaya dewleta xîlafetê ya îslamî baş nas bike, ku sûdê ji komek faktorên subjektîf û objektîf werdigire, yên ku bandorê li jîngehên navxweyî dikin. Û tişt dê lêkolîn li ser bisekine, analîzkirina têgeha îdyolojiya leşkerkirinê ji bo DAIŞ'ê ye, li gorî nêzîkatiya dahûranî ya raveker, û carinan bi karanîna nêzîkatiyên înduktîf û berawirdî ku balê bikişîne ser têgeha baweriya leşkerkirina li gel DAIŞ'ê, taybetmendiyên wê û navgîn û amûrên ku tê de hatine bikar anîn, û hewl bidin ku faktorên bandorê li wê dikin nas bikin û gengeşekirina çareseriyên

pêkan ji bo rûbirûbûna vê propagandayê li ser asta herêmî. Ew jî li gorî hevpeyivînên ku NRLS bi çend endamên rêxistinê yên berê re kiriye, dahûrandina bûyerên ku ji hêla şaneyên razayî yên rêxistinê ve hatine kirin, û xwendina hejmarek lêkolînên ku li ser vê mijarê sekinîne, her wi Ji bilî xwendin û dahûrandina komek pirtûkên ku ji hêla aliyên ku cîhada tundûtûjiyê dipejirînin hatine çapkirin, ên xwe dispêrin ser baweriya tekfîrê.

**Baweriya leşkerkirinê li gel Daiş, rêgez û taybetmendî.**

baweriya lekerkirinê girêdayî baweriya şer. Ne pêkane şer beyî leşkeran here serî. Ev bawerî jî girêdayî şêwaza besrsvê ku bi sê pirsan ve girêdayî ye: Helwest ji mijara leşkerkirinê çiye?, Sedema leşkerkirinê? çawaniya vê lekerkirinê?. helbet dê bersivên leşkerkar û leşker ji hev ciyawaz bin, jixwe baweriya leşkerkirin li gel Daişê di bin vê sîwanê de ne.

Xwe dide nîşan ku endamên wan"parêzerê umetê ne û pasvanên baweriyên wê ne, xemxurên wê ne û di ber de parastinê dikin. Di çarçoveya ku şerê wan wê heta roja qiyametê berdewa bike. jixwe doza wan jî xwe dispêre ser rêgeza"kuştinê"ku ew amûra razîkirina xweda ye, anku"qurbaniyên mirovî ji bo razîkirina xweda". wek tê zanîni ku têgeha baweriya leşkerkirinê li gel Daişê; çarenûsa kesên ku baweriyê bi bîr û baweriyên wan naynin, kuştin e û wek pêşiyên xwe (el- Qaîde) teqez dikin: Em ê şerê xwe bikin ta hemû gelên cîhanê bibin misilman û em ê hino hino wan fêrî şerîeta misilmatiyê bikin.

Rêxistina DAişê di heyama sala 2014an de heta têkçûna wê di sala 2019an de jîngeheke nû ya ewlehî, siyasî û çandî li Sûriye û Iraqê ava kir, ku bala cîhanê kişand ser xwe û di encamê de krîza Sûriyê kete qonaxeke nû. Gelek lêkolîn li ser wê hatine kirin, der barê analîzkirina bîrdozî, reftar û bilidbûn û paşketina wê de, cudabûn derket pêş û mijara tevlîbûna hinekan tevî wê hovîtiyê, dibe cihê pirsê.

Di vê çarçoveyê de sê nêrîn hene ku balê dikişînin ser vê mijarê: nerîna yekem ya “Mihemed Silêman Ebû Ruman” yek ji lêkolînerên Ereb ku di Saziya Frêdriş Ebert de dixebite dibêje: “ji serdema berfirehbûna di sala 2014 de piştî zayînê, rêxistina Dewleta Islamî hîn yek ji wan diyardeyên ku hevtayê wê di dema me de kêm e, ji ber ku DAIŞ gihişt astên leşkerkirina pir xurt ku di dîroka nûjen de tu rêxistinek din; di leşkerkirina vê hejmara şervanan de

bi awayî bi ser neketiye. Ew xwediyê şiyanên pîşeyî û taktîkî ye ku medya, propaganda û amûrên ragihandinê baş bikar tîne ku ji stratejiyên tevgerên cîhadî yên din pir zêdetir in. Nerîna duyem jî; nerîna Sara ye, yek ji jinin Mexribî ye, ya ku ji dûrahiya hezarên kîlometryan hatiy û tevlî Daişê bûye û paşê got: Min dev ji wan berda:" Li dewletên Rojava yê ku di jiyana xwe ya pratîkî de têk diçe, xwe dikuje, lê li cîhana erebî, ye ku bi ser nekeve, diçe mizgeftê, riha xwe dirêj dike û kirasê kurt li xwe dike, sedem jî paşxaneya olî ye".

Lê nerîna sêyemîn ku li ser zimanê şervanekî(mislman) ji Yekîniyên parastina Gel(YPG) hatiye got ku ew beşdarî rizgarkirina Şingalê ji Daişê bûye, dibêje"DAIŞ komeke sîxur û çetene, êrîşî welatê me kirine ji bo me bikujin û me ji malên me derbixin; bermberî seks, pere û desthilatdariyê, ketine nava hevpeymaniya rejîmên netewî yên dewletên kûr ên Tirk, Ereb û Faris; ji bo qirkirina gelê Kurd û bindestkirina gelê Ereb, sûcdar in tirsonek in ku girtiyan dikujin, zarokan dikin kole û destdirêjiya jinan dikin".

Ev her sê nêrîn, îdeolojî, bêhêvîtî û çeteîtî wekî sedemên sereke yên tevlîbûna rêxistinê bi nav dikin. Piraniya kesên ku tevlî refên wê bûne, yan ji aliyê aborî ve, yan jî ji ber helwêsteke redkirinê ya li hember civakên ku lê dijîn, yan jî ji ber balkêşiya îdeolojîk a ku ji aliyê rêxistinê ve li ser bingeha têkçûna rêxistinên din, hatiye afirandin, bi behaneya ku nikarîbûn pirsgirêkên misilmanan çareser bikin. Bangeşeya rêxistina Daişê di vê mijarê de roleke serkeftîr ne lîst û ne jî tiştekî nû di vê çarçovê de peyda kir, lê tenê bû sedemek alîkar ji bo bihêzkirina vê baweriyê bi xapandina kesên din ku ew koma rizgarker e.

Der barê rêxistina Daişê; aliyên leşkerkar di dînamîkaya xwe de, xwe dispêre ser qaşo ew koma rizgarker ku pêximber di gotarê xwe de ev yek aniye ziman, her wiha têkçûna rêxistinên cîhadî yên din, di avakirina dewleta xîlafa islamî jî ji xwe re dike bihane û dixebete ku hesta kesê misilman han bike, bi awayekî ku ramana wî ya vacî lawaz bike û tenê bibe xemxurê rêxistinê û pirsgirêkên wê yên mirovî werin paşxistin. dibe ku taybetmendiyên baweriya leşkerkirina DAIŞ'ê li gorî tiştên ku di operasyonên leşkerkirinê de derdixe pêş û angaşt dike bi vî awayî were destnîşankirin: "Misilman di bin sitemkariya mezhebî ya giran de dijîn ku bû sedema

paşdemayîn û hejariya wan, û ji ber ku zorbazan xelk neçar kirin ku ji ola xwe dûr bikevin ku di encamê de ji nasnameya xwe ya resen dûr ketine.

Ji nû ve vegerandina vî gelî li ser baweriya xwe û dîsa karibe li ser lingan xwe bisekine, piştî bidestxistina kesayetiya xwe ya winda, encax bi xwedîderketina li rêbaza rast a danûstandin û xebata li gorî nêzîkatî û rêbaza Dewleta Xîlafeta Îslamî li Iraq û Şam pêk were. Ji bo vê yekê jî divê Misliman emîrên rêxistinê bipejirînin û yê vê yekê nepejirîne dê rastî cizayên mezin werin. Bi hêsanî tê dîtin ku serkirdeyên DAIŞê di propagandayên xwe yên ji bo leşkerkirinê de, hêza peyvan bikar tîne, ev pey jî  xwedî du cure têgehan ne, cureyek ji bo pesnê rêxistinê û ya di  jî ji bo reşkirina dijminê  rêxistinê, bi awayekî ku piştgirîya propagandaya leşkerkirinê û angaştên serkirdeyên DAIŞê dike ku dibêjin ew koma ku dê Mislimanan ji hejariya wan derxîne, û ew kesên bijartîne ku welatên kufrê dagîr bikin û li wir misilmantiyê belav bikin , her wiha dibîjin ku ew ê navê Xwedê li ser rûyê erdê bilind bikin û kî ji derveyî rêxistinê bimîne kafir tê hesibandin ku xwîn, pere û namûsa wî ji talanê re rewa ye. Ji bo damezrandina Dewleta Xîlafeta Îslamî, divê cîhada cîhanî bi can, pere û malbata xwe di bin ala rêxistinê de were ragihandin û ji bo piştgiriya vê pirojeyê, divê ji her çar aliyên cîhanê “mucahid” ber bi welatê Şam û Iraqê ve werin şandin û di axaftineke xwe de yên îdeolojîk de di kovara xwe ya (Dabiq) de got: "Jiyana cîhadê ne pêkane e heger hûn buxçikên xwe nedin ser mile xwe û tevlî dewleta xilafeta nebin û di bin sîwanê wê de nejîn.

Ji bo leşkeran, piraniya wan ji civakên ku bi ser mezheba Sunî ve ne, ev civak jî piraniya wan xizan û bindest dijîn, ku leşker şîrove yan jî tefsîrên olî yên rêxistinê wekî rêyekê dibînin ku gazind û bêmafiya xwe çareser bikin an jî xwestekên xwe bi cih bînin û bibin leheng û di berê nêzîkî heftê perîyên bedew de bijîn. Ev yek piştî ku ew kesê heza olî li gel peyda dibe, utopyaya DAIŞ'ê dibîne û wê bi rewşa xwe ya xerab re berhev dike, hestiyariya wî li hember deshilatdarîya sitemkar zêde dibe. Ev yek dihêle ku biryarekê bigire, ku bêtir nêzî rêxistinê bibe, nemaze piştî ku metirsiya Şîetî, Xirîstiyanî û sekulertiyê dibîne, û li dijî wê helwestek berevaniyê digire heger bawerî an şêwaza jiyana wî ya kevneperst gef bike. Ev bangeşeya Daiş li ser kar dike; bi awayekî zêde nîşan bide, jixwe bangeşeya van operasiyonan carinan roleke neyînî dilîze, ku ev yek helwesta tundrew li hember wan zêde dike.

Ji aliyekî din ve, rêxistinê bi rêya medyaya civakî ji bo belavkirina bangeşya xwe, hewl da ku endamên ji derveyî Sûriyê û Iraqê tevlî xwe bike, bi rastî jî karîbû bi dehan kesên oldar yên ku bi çanda welatan re neguncayîne tevlî xwe bike.

Li gorî tiştên me anîn zman, em diKarin komek taybetmendiyên girîng ên ku baweriya leşkerkirina DAIŞ'ê diyar dikin, hibijêrin:

**1- Xwe dispêre ser Îdyolojiya tevlihev a Baas û El-Qaîde**

Gelek bûyerên ku berî belîbûna wê derketin holê, diyar dikin ku îdeolojiya DAIŞ’ê encama meleziya ramanî ya di navbera îdeolojiyên El-Qaîde û Partiya Baas de ye, destpêka wê ji Iraqê bû û hêza wê li Sûriyê xurt bû. Îdyolojiya Baas û El-Qaîde bi deh salan li herêmê pir kûr û belav bibû û di rewşeke dijminatî û hevrikiya îdeolojîk de bûn û her yekî ji wan dixwest desthilatê bidest bixe. Lê belê piştî rûxandina rejîma Baasê li Iraqê di sala 2003an de ji aliyê artêşa Rojava ve, her du aliyan ji bo rûbirûbûna dijminê hevpar bûn hevalbend. Jixwe tê pêşbînîkirin ku nêzîkbûna yekem jî li zindana Boka bû, ku dikeve başûrê Besrayê pêk hat. Li wir hêzên hevpeymaniya navneteweyî ya ku rêjîma Sedam Husên hilweşand, bi dehan serkirdeyên Baas û El-Qaîde yên Iraqî girtin. Piraniya wan jî ji tundrew û efserên berê yên pasvanê komarî yên Iraqê yên berê bûn. helbet ev yek di pisporiya şer û dijminatiya rêxistinê ya li hemberî gelê Kurd de bi zelalî hat dîtin.

**2- Serweriya olî**

Tu dikare bêje ku piraniya lêkolînan didin zanîn ku bikanîna olê ji bo armancên siyasî, rêbazeke pir kevn e ku piraniya civakên Ewropî, Asyewî û Afrîkî, têre derbas bûne û hîn jî ev yek berdewam e, ku xwe dispêre ser ferzkirina serweriya ramanî li ser hişmendiya mirov û hestên wî, ta digihêje asta tundrewiyê, mirov dikare navê"koletiya ramanî" lê bike ku di encamê de mirovan hogirî xwe dikin ku çi ji wan dixwezin bê didlî pêk tînin

Rêxistin di rêya qaşo ku ew komika rizgarker e û partiya xwedê ye ku di quran û axaftinên pêximber û sehabiya de hatiye bibîrxistin, dixwaze yasabûna xwe ava bike, ji bo wê jî dixwzin bûyerên di serdema pêximber de çêbûne di roja îro de cîbicî bikin ku ji hêla dem û şert û mercan, ve pir ji hev cudaye.

Her wiha ev rêxistin, diyar dike ku ew tenê bijarteya ku wê dewleta islamî ava bike, ji ber wilo çênabe tu kes sere xwe li hember rake û divê her kes pabendî zagon û fitweyên wê bibin. ji bo van kiryaran bi rêve bibe, dîwana el- Hisbê damezrand. Baweriya leşkerkirinê û şer li gel cîhdîstan ku

xwe dispêre li ser baweriya û Îdeolojiya cîhsdîstan Ku ji nû ve pênaseyên têgeha cîhadê û utopyaya dewleta xîlafeta îslamî û ferzkirina koçkirina ji welatên kafirê hat daraştin û kirasekî nû lê kir. Ji bilî bikaranîna têgeha tekfîrê, jixwe welatê cîhanê kirin sê beş, welatên kafirê, welatên şer û welatên islamê û li ser peyrewên xwe ferz kiri ku ji welatên kufir û şer berî bidin welatê islamê û divê şer bikin heta ku welatên şer û kufrê werin tunekirin. di vê derbarê de jî serkirdeyên rêxistinê fermana didin û ji peyrewean tê xwestin ku bê rexnen, hizir û giftûgo pêk bînin. Êrîşî çend zanistên yasayî mîna"Fiqha teysîrê" ku ew tawan kir u ol lewaz dike û rê dide şaştiyan û dibe piştgirî ji bo kafiran li dijî misilmanan û wî alîgirê têgehên nermbûnî bi kifrê tewanbar kir; bi bihaneya ku ew bi sivikatî nêzî ol û perestê dibin, û amade ne ku guhertin, pirnengî û demokrasî, ku ji aliyê xaçperestên hatine ferzkirin qebûl bikin, lê ji bîr kirine ku piraniya birayên wan ên misilman beriya 1400 salan ola xwe parastine.

Xuya ye, ya ku bûye sedema gurbûna vê yekê nexwendewarî û nezanîya di nav piraniya civakê de ku bangeşya rêxistinê pir bandor li wan kiriye, yan jî windakirina baweriyê bi rêxistinên din ên tundrew û dogmatîk, ku di encamê de, rêxistinê serweriya xwe ya ramanî û bîrdozî li ser peyrewên xwe û li ser her kesê ku ketibû bin kontrola wê, ferz kir. Rêxistinê ji bo her binpêkirina maf, namûs û mal û milkê kesên ku di bin kontirola wê de ne, fetweyek derxist, kesê ku ji bin sîwana wê derkeve, cezayên giyanî lê dibire ku kafire û cihê wî dojehe, û eger ev ceza pêk nehat dê cezaya dinyewî piker bîne, jî kuştin û îşkenceye û ev yek tê wateya koletiya ramanî û laşî ya kesê ku bi dilxwazî an jî bi zorê tevlî wan bûye.

### 3- Efsanekirin

Rêxistinê gelek efsane li dora xwe xêz kirine, wek nimûne, dide zanîn ku dewleta wê "mayî û berfereh dibe" û ew koma rizgarkerin û serketina wan ji cem Xwedê ye û hemî kirinên wan bi îlhama wîê ne, da ku ew carinan di şer de vê ayetê dibêjin"Ne hûn wan dukujin lê belê xwedê wan dukuje"û vê yekê

di şerê li dijî niştecihên misilman ên herêmê de ji xwe re dikin rêbaz, û xwe pabend dibînin ku cîhanê bi tevahî bikin misilman û şerê tecal bikin. Û wan dewleteke xîlafeta îslamî damezirand ku bi dadmendî, şerîeta îslamî û xweşguzarî ji bo hemî misilmanan pabend e. Li gor ku ji hêla hin endamên rêxistinê ve ku ji Erebistana Siûdî koçî deverên ku di bin desthilata rêxistinê de ne bûne, hatine ragihandin, ji rastiya heyî matmayî mane û destnîşan kirin ku hatine xapandin. Derbarê sepandina Şerîeta Îslamê de, yek ji yasadanên wan ji me re got ku wî bihîstiye ku çend endamên rêxistinê destdirêjî li jineke bêxwedî kirine û ew revandine û kirine kole û li gorî vî yasadanê, wan tawanê zînayê kirine, lê wî cezayê zînakar li ser wan ne sepand, ji ber ku ew ji karên şerîetê nizan in. Bi dehan mînakên serjêkirina bi tawana ku ew kurd bûn hene, jixwe sûcên Komkujiya Kobanî û hoza Şeytatan durûtî û derewên rêxistinê li ber çavan rave dike.

Jixwe Mebesta Daişê ji efsanekirinê, cîbicîkirina serweriya xwe ya olî li ser alîgirên xwe . Îdeolojiya wê ya derbarê ramanên cîhadî de ji hêla alîgirên wê bi tundî li dijî wî derketibûn û ew bi "têkxistina pevçûn û xerabiyê di nav komên cîhadî" de tawanbar kiribûn .

### 4- Demagojî

Demagojî stûna propagendaya siyasî û olî ya ku rêxistin ji bo pêkanîna armancên xwe bikar tîne, ji ber ku xwe dispêre li ser derxistina angaştên ku tirsa gel zêde dike, û paşê jî dozger xwe wekî rizgarkerekî nîşan dide û soz dide ku dê van metirsiyan çareser bike, ger gel rêça wî bişopîne. Ev taybetmendî hem bi teoriya komployê re û hem jî bi propagandaya reş re, lihev dike, weke ku Ferec fodê dibêje: "Terorîzm tenê di bin siya demagojiyê de dijî û mezin dibe...".

Rêxistinê di sîstema xwe ya çapemenî û propagandayê de şarezayên gotara demagojîk pêşxist, bi balkişandina ser mijarên ku Misilman ji wan dûr ketine, wek mijarên seksî, mêtingerî, xizanî û windakirina nasnameya çandî û xapandina wan ku hêzên siyasî yên cîhanî yên cihêreng ku rêxistin wekî "kafir" wan bi nav dike. Vê yekê bi rêya bi têgînên Demokrasî, nermbûn û aşitiyê, bi rêya rêbaza "şaşiya pelewanî" an "şaşiya mirovê ji pûş" li welatên misilman bicîh bikin ku mebest jê peydakirina fobiyekê li hember van têgînan çêbike ku dibe alîkar ku teokratîka xwe bihêz bike û leşkerkirinê zêde bike.

Rêxistin li welatên dûrî demokrasîyê, hem jî dûrî hestên xwedîtiya neteweyî ne û li deverên xizan ên dorpêçkirî bi baregehên leşkerî yên welatên bihêz, nemaze yên nêzîkî çavkaniyên enerjiyê (petrol û gaz) û rêyên veguhestinê yên girîng, bi hêz bû.

Rêxistinê li ser bingeha demagojiyê karîbû bi dewleta Tirk re li ser esasê dijminatiya mafê çarenûsî ya gelê Kurd hevpeymaniyeke bihêz çêbike. Tevî ku ev rêxistin li ser asta navneteweyî rêxistinek xirab û cir nexweş e, dewleta Tirk di serdema ku rêxistinê li ser sînorê bajarê Til Ebyadê yê Bakurê Sûriyê dagir kiribû, bi wê re têkiliyên aborî danî.

Êrîşên wan yên leşkerî li gel xelkê bakur û rojhilatê Sûriyê hevdem bû, bi taybet armancgirtina misilman, êzîdî, kurdên sekuler û xiristiyan. ji bo vê yekê jî îstîxbarata Tirk, Îran û Baasiyan xist xizmeta operasyonên xwe yên leşkerkirinê ku wisa dixuye di vî karî de bi serketiye. Tiştê ku vê yekê piştrast dike ew e ku Ebû Ubeyda El-Tirkî di hevpeyvînekê de got, "Em di civîneke bilind de ku El-Bexdadî jî tê de beşdar bû, û li ser êrîşa li ser gelê kurd û pêkanîna teqînan dijî navendên kurdî li bakurê Kurdistanê gotûbêj kirin, tevî redkirina hin kesên amade bi behaneya ku dem ne guncaw e, lê kesê bi navê Ebû Zeyneb El-Reqawî ku berpirsê ewlehiyê li Tirkiyê bû, li ser wê yekê rijd bû û piştî demekê rêxistinê bi agahiya îstixbarata Tirkiyê êrişî kombûnên Partiya Demokratîk a Gelan kir.

## 5. Handan û tirsandin

rêxistinê ev her du şêwz li gorî gotina"heger  tu ne bi min re bî, tû li dijê min  î"; bi awayekî hevdem di pêvajoya leşkerkirinê bikar anî ku kesên hejar û bindest  kirin armanc. ji bo wê jî bi awayekî giyanî û ber bi çav  bangeşeya xwe li ser ava kir. kahinên Rêxistinê dibêjin: kesê ku tevlî rêxistinê bibe yan xwe bispêre rêxistinê ew ê biheştlî be û di dinyayê de wê bi xenîmetên madî û mirovî xweşiya xwe derbas bike. Lê yê ku leşkerkirinê red bike çarenûsa wî dojehe û lê dinyayê wê rastî serjêkirinê were û wê namûsa wî bê binpêkirin, zarokên wî bibin kole, mal û milkên wî bên talankirin. Ji ber vê yekê sê rê li pêşiya mirov heye, yan tevlî rêxistinê bibe, yan jî li ber xwe bide, yan jî jê bireve. Bêguman her yek dê  li gorî rewş û baweriyên xwe  rêçekê hilbijêre. Ji bo kesên  biyanî jî, ew rêbaza xapandinê ya rêxistinê pir bandor li wan kir,

û wan tê de çavkaniyek xwenaskirinê û çareyek ji lawaziya xwe re di tevlêbûna bi derdor û civaka xwe re dît.

Rêxistinê hertim hebûna xwe wek utopyayeke îslamî û cihê têrkirina kiryarên seksî û êrîşkar di çarçoveya yasayên xwe de nîşan dide, ku ew nikarin li herêmên xwe li ser kesên ku rêxistin wan dijminên xwe dibîne, pêk bînin. û bi awayekî nerasterast jî cîhada nîkahê(zewacê) pêş xist.

**6. Gelemperîtî**

Di leşkerkirinê de, rêxistin, ne tenê bi zilamên misilman re sînordar bû, lê belê jin û zarok jî kirin lêşker û endamên xwe û girûpek ji tabûran ava kir, di nav wan de ketîbeyên El-Xensaa û Eşbel El-Xîlafe, ku niha li pişt kuştinên ku li kampa Holê li dijî penaberan pêk tên. her wiha peyrewên olên êzîdî û xiristiyanî bi rêya dualîtiya handan û terorîzmê araste kirin, bi hezaran jin û zarok neçar kirin, piştî kuştin û revandina zilamên wan, îdyolojiya rêxistinê bipejirînin. Li milekî din jî karîbû endamên partiyên çep tevlî xwe bike, wek Ebû Cîhad El-Tirkî (Savaş Yildiz,endamê Partiya Eniya Rizgariya Gel a Tirk), berpirsê beşê ewlekarî yê şaxê DAIŞê li Tirkiyê, yê ku bi organîzekirina teqînan Kombûnên Partiya Demokratîk a Gelan li Edeneyê û Mêrsînê di sala 2015an de, tê tawanbarkirin. Ji aliyekî din ve, çalakiyên xwe tenê bi yek erdnîgariyê re sînordar nekir, lê belê endamên xwe li seranserî cîhanê belav kir, û ya ku herî zêde jêre bû alîkar ku gelek rêxistinên radîkal li Asya û Efîka tevlî rêxistinê bûn, her wiha zordestiyê rêgeza tekfîrê derbas kir ku tu misilman jê , ta gihişt ku hin komên radîkal ên ku desthilatdariya wê red dikirin; kirin tekfîr, wek perçebûn ji Cebhet El-Nusra (Hay'at Tehrîr el-Şam)

**7. Kînîtî**

Nefreta bê sedem dibe enerjiya giyanî ya ku tundrewiyê gur dike, û ew çandeke dûrxistinê ye, ku xwe dispêre li ser kesayetiyê ya ku îdeolojiyên netewî, olî û mezhebî teqeziyê li ser dikin, yên ku ji mêj ve li pey desthilatdariyê digerin ku kufr, xiyanet û biçûkxistina çandî ji xwe re dike bingeh. Di encamê de, DAIŞ di operasyonên xwe yên leşkerkirinê de rasterast xwe dispêre vê çandê û ji nefreta ku ji aliyê îdyolojiya neteweyî, olî û mezhebî ve li herêmê hatiye çandin, sûdê werdigire. Îdeolojiya Baas a niştimanî li Sûriye û Iraqê bi nijadperestiyê gelek hestên nefretê li hember neteweyên din derdixist, ku hin komik ji wan jî bertekek berevajî vê yekê nîşan dan. Bi

heman awayî, îdeolojiyên Wilayeta el-Feqîh, El-Qaîde û Ixwanulmislimîn hestên olî û mezhebî yên tundrew li hember kesên xwedî baweriyên cuda pêk anîne. jixwe bûyerên ku beriya serhildana Qamişlo ya 12ê Adara 2004ê nîşana vê yekê ne. Kiryarên tundûtûjiyê yên hevbeş di navbera van îdolojiyan de, van hestan di bîrdanka piraniya civakên herêmê de bi cih dike. Ji ber vê yekê, kesê ku bi kîn û nefretê serî wî hatiy dagirtin, bê guman dê berê xwe bide rêxistina ku vê nefretê bi wî re parve dike, û ev yek jî pêk hat û dibe ku ev reftar û kuştinên hovane yên Êzîdî, Misilman, Kurdên sekuler, û Xiristiyan, Şîe, Ereb û hin xebatkarên medyayê û rêxistinên alîkariyê vî tiştî rave bike. Rêxistin xwe dispêre rêgeza dûrûtiyê ji bo ku sûcên xwe veşêre û nehêle wijdanê peyrewên xwe dûrî  poşmaniyê bixe, dema ku li dijî civakên herêmî komkujiyan pêk tîne, ew jî di rêya gurkirina hestên tolhildanê. Li gor angaştên xwe kuştina bi hezaran zarok, jin û kal û pîr di encama "şerê xaçparêzan" yên li Efxanistan, Iraq, Çeçenîstan, Filistîn û Somaliyê bibîr dixe, tevî ku li ser destên wan 250 zarok, jin, kal û pîr di komkujiya Kobanî de di 25ê pûşbera 2015an de hatin kuştin, û ji bilî qurbaniyên teqîna Qamişlo di Tîrmeha 2016an de, û komkujiya El-Şeitaat û yên din piraniya wan misilman bûn ku tu têkiliya wan bi şerê xaçparêzan re tune bû. Heta bi nefreta tundrewan ayeta Qur’anê jî binpê kirin: “Ji bo kesê ku şerê we nake, wek zarok û jin , nabe hûn wan bikujijn , Xwedê ji yên dadperwer hez dike.” El-Mumtehane.

Ji aliyekî din ve, rêxistinê sûd ji rexnekirina hin hunermendên rojavayî yên li ser sembolên îslamê girt, da ku kîn û nefreta li dijî civakên Ewropî geş bike, tevî ku ew civakiên bi awayekî tundtir rexne dikin. weke ku hin weneyên ku islamê rexne dikin li ewropayê hatin hildan, rêxistinê nefreta tundrewan li dijî Ewropiyan bikar anî. Di vê derbarê de jî yek ji serkirdeyên El-Qaîde, ku DAIŞ jê veqetiyqa, ev yek di  xutbeyekê de bikar anî, têde got: “gelî misilmanan: agir vêxin, şerkî berdewam bigrin dest. Em ji wan lêborînê naxwazin, lê em ji wan rûreşî, heqaret û şikestinekê dixwazin, ku sere wan bê çimandin û pozbilindiya wan riswa bike…"

## 8. Destgirtina sincê

Heger em destpêka dîroka civaka mirovî baş mêze bikin, em ê bibînin ku sinc yekemîn siyasete ku  civakan ji bo bi rêve birina têkiliyên xwe yên navxweyî û têkiliyên xwe yên bi civakên din re bikar anî. Sinc  dibe wek navgîneke xurt ji bo bidestxistina aşitî, ewlehî û jiyana hevbeş di navbera

mirovan de, û carinan dûrketina ji sincê, dibe sedema şerên navxweyî ku piştre dibin sedema hilweşîna şaristaniyan û pêketina şoreşan ku piştre dibin sedema avabûna şaristaniyên din. Tevî wê yekê ku pragmatîzm di dîroka me ya hevdem de di têkiliyên siyasî de, taybetmendiyek girîng e û lîberalîzm di siyasetên navxweyî yên gelek welatên ku wekî demokratîk têne binav kirin de taybetmendiyek berbiçav e, gelek civakên li seranserê cîhanê hîn jî rêzê ji exlaqên mîrata xwe ya çandî re digirin. Di dîrokê de hatiye nivîsandin ku gava yekem a qirkirinê komî ji cem ew kesên ku serî natewînin dest pê dike ku ji sinc û mirovantiyê tê valakirin û ev ji bo şer û talanê kiryarin kevn in. Lêbelê, divê em ji bîr nekin ku pişguhkirina sincê bilind ê kesên din kiryareke bi sincî diyar dike.

Tundrewî di jîngehên civakî yên kevneperest de ku komeke taybet ji endamên wan xwedî sincên qirêj in, ji bo pêşketin û berfirehbûnê, derfetekê ji bo xwe dibîne, her weha, têkiliyên seksî yên bê kontrol bandoreke wê ya neyînî û bêrkêûpêk li ser hest û baweriyên giyanî heye, û piraniya nîqaşên serdestiya ramanî yên bêber di navbera şopînerên îdeolojiyên cihêreng de, bi ne pejirandina pergala exlaqî ya alîyê din û berevajîkirina sincên wê têne destnîşan kirin. Ev nakokî bi pêşkeftina mezin a ku di veguheztina nûçe û ramanan de bi riya medyaya civakî ve tê dîtin, derbasî qada sîberê bûye. Bi dîtina dîmenên dûrî sincê, şaşitiya kesayetîbûnê di nirxandina sincî ya civakê de derketiye holê û ev şaştî li ser wê civakê û heta welatên ku bi wan dîmenan re têkildarin tê belavkirn. Li ser vê mijarê, baweriya leşkerkirina DAIŞ'ê kar dike da ku mijara sincê bike navgînek ji bo şeytanîkirina kesên din û nîşandana civakên ku îdyolojiya rêxistinê napejirînin wekî rewşek dîstopyayê. Demagojî û nefreta tundrewî wek taybetmendiyek ji taybetmendiya baweriya leşkerkirina DAIŞê rola xwe di mijara yekdestdariya rêxistinê ya li ser sincê de dilîze. Xuya ye ku serokên rêxistinê bi asta rola sincê di parastina nasnameya etno-çandî ya kesan de têdigihîjin, û ji asta hestyariya civakan li hember binpêkirinên sincê piştrast in. Ji ber vê yekê, rêxistinê hemû hewlên xwe daye û hîn jî berdewame ji bo ku xwe xwedî sinc nîşan bide, û di propagandayên xwe de bi şêweyekî demagojîk bikar tîne da ku serpereştiya xwe ya olî û hestên nefretê xurt bike ku bi awayekî xizmeta çalakiyên xwe bike û peyrewên xwe bi efsaneyên xwe, bawer bike. Wek mînak, yek ji tekoşerê ramana cîhadî ya tund, civakên rojavayî bi bêsincî û dûrketina ji sincê tawanbar dike û dibêje: “Ew dixwazin ku em ji civakên wan

yên lawirdar re ku tenê xwarin, vexwarin û şahiyên qedexe dizanin vekirî bin û ji me dixwazin ku em nêzî xirabiya sincî bibin a ku bûye taybetmendiyeke bêhempa ya civakên wan ên hilweşiyayî re ku gihiştiye asta êdî bav kurê xwe nas nake".Tevî ku Ewropî ji Misilmanên ku li gel wan penaxwazin her maf dane wan ku rêûresmên xwe yên olî pêk bînin, parastin, guhdana tenduristî û civakî ji wan re peyda dikin. tê zanîn ku rêjeyek mezin ji civakên rojavayî gelên kevneperest in û ne wek ku ew mirov angaşt dikin, her wiha civakên herêmî li Sûriye û Iraqê, berî derketina rêxistinên neteweperest û îslamî li herêmê, xwedî sîstemeke exlaqî ya pêşketî ne.

Faktorên biker di baweriya leşkerkirinê ya li ba Daişê bi giştî, xwe dispêre taybetmendiyên vê baweriyê; çi ev faktor xweyîtî bin çi jî bêalî bin. Ji bo faktorên xweyîtî, ew li dor arîşeya meyla ber bi dijminatiyê ya kesên bindest û pozbilind yên ku di civakên xwecihî yên çewisandî de dizivirin. Xizanî, bêdadî û çewsandina siyasî dihêle kesên bindest bêtir bi gotara şoreşgerane (taybetmendiyên wê çi bin bila ew bin) bandor bibin. Ew vê şoreşê weke derfetekê dibînin da ku enerjiya bêzarî û nerazîbûnê ya ku di hundirê wan de hatiye çewsandin, bi awayê rêkarên tund li dijî her kesên ku ew wan weke sedema trajediya xwe dibînin, derxînin. Her wiha xweradestkirina li desthilata rêxistinê dihêle kesên bindest bi awayekî hêsantir werin kontrolkirin. Mirov dikare xwe di vê yekê de bispêre nerîna Ibin Xeldûn ku di bêje: ``… kesê bindest her tim dixwaze di dirûşim, cil û berg û hemû awayên xwe de weke kesê serdest bike. Sedema vê yekê ew e ku mirov her tim di wê baweriyê de ye ku tekûzî di kesê serdest de ye. Ev yek yan ji ber ku wî kesê serdest di serê xwe de mezin kiriye yan jî ji ber ku wî ji we ye ku zodariya kesê serdest ne tiştekî xwezayî ye lê belê ji ber tekûziya wî ye. Dema ev yek di serê mirov de rûne, digihêje baweriyê û bi rêya wê kesê bindest di her tiştî de xwe dike weke kesê desteser. Jixwe ji vê yekê re dibêjin pêrewî ango pêşengî…`` (Muqimet Ibn Xeldûn). Ramangerê kurd Ebdela Ocelan nerîneke mîna ya Ibin Xeldûn dide; çimkî ketina bin desthilatdariya kesekî de, mîna pişaftina ku koleyan çêdike, tê hesibandin. Ev kole ji kesên bêsinc û hişmendî bi nirxekî arzantir tê çêkirin. Birêz Ocelan di vê derbarê de dibêje: ``…Koma çewisandî ya ku nasnameya wê hatiye jevketin û berxwedana wê hatiye şikandin, dibe komek ji koleyan ku xizmeta kesên desthilatdar dikin. Peywira sereke ya koleyê çewisandî li vir tenê ew e ku xwe bi serwerê xwe bişibihîne û xwe bike weke wî…bijarteya tekane ya li pêşberî wî ye da ku karibe bijî, ew

e ku kêliyekê berî ya din dev ji nasnameya xwe ya civakî ya kevin berde û xwe bi şêweyê herî baş bi çanda serwerê xwe re biguncîne…`` Îcar kesên bindest ên ku xwe bi ramanên rêxistinê ve digirin, ew jî faktoreke bikêr in ji bo belavkirina baweriya leşkerkirina ji bo wê. Ji bo kesên pozbilind jî, siyaseta piştguhkirin, dûrxistin û malgirtina olîgarşiya alîgira desthilatê ji destkeftiyên şênberî û razberî re, bi rolekê dilîzin ku hin ji wan kesên pozbilind propogendayê ji bo rêxistina terorîst a dijberî desthilata heyî, çêkin. Jixwe kesê pozbilind her dem tiştekî wisa dibêje: ``Eger xenîme li ser min hatin qedexekirin û rêzê ji pozbilindiya min re nehat girtin, ez ê bidin pey pêşewayekî din.`` Ji bo pozbilindên ku kestin bin serweriya rêxistinê, rê li pêşberî wan hat vekirin ku xerîzeyên xwe yên veşartî û çewisandî têr bikin û ji bo wan fetweyên ku bi îdyolojiya rêxistinê hatine nixumandin, hatin pêşkêşkirin. Jixwe careke din fetweya xwetêrkirin û xweamadekirina bi rêya pereyên gawiran û bi rêya sebîkirina (dîlgirtin) jin û zarokan hat dariştin; ew jî piştî ku têgeha gawirî û cîhadîstê ji nû ve hat danasîn. Pê re soza serkeftina di jiyana piştî mirinê de ji bo wan wan dan. Ji ber wê jî Daiş tecrubeyeke nû ye ji bo kesên dixwazin xwe bikin tiştek û rê li ber xwestekên wan ên çewisandî yên kesayetî vekir. Jixwe li gor wan tişta herî nebaş a ku heye were serê wan, mirin e û ew jî li gor ku Daiş wê dide nasîn, qonaxa veguhestina ji vê jiyanê ber bi Buhiştê ve ye. yek ji semînervanên ku baweriya leşkerkirina cîhadîst didin ku têgeha cîhadê li gor wî kuşta kesên cuda ye, wisa dibêje: ``… Xwe bi xak, xanî, kar û esîmanekî ve girê mede; xak xaka Xwedê ye, mirov mirovên Xwedê ne û biryar ya Xwedê ye. Tu li ser xaka xwe bî yan jî li koçberiyê bî tu yê bimirî, tu cudahî tune ye. ji ber wê ma tu yê çima xwe girê bidî û bidî pey dozên şeytan…koçberê di ber Xwedê de û yê ku daye ser şopa pêxemberê wî, bimire yan were kuştin, jê re nexem e, çimkî cihê wî Buhişt e…Yezdan dibêje: `Kesê ji bo Xwedê koçber bûye û paşê miriye yan hatiye kuştin, Xwedan dê rizqekî baş bide wan.`… Ev biryarên Yezdan in, bi roj û şev li ser te tên dubarekirin, ji ber wê ji bo xwedê rabe, koçber bibe û têkiliyên vê dunyayê yên ku te xwe bi wan ve daleqandiye, qut bike, çimkî wan têkiliyan berê te daye bêrûmetî û stûxwariyê û vê jî hiştiye kesên herî pîs li ser me bibin serwer û desteser…`` Di encamê de, ev bawerî li ser kesê dide pey şopa wê, disepîne ku bi awayekî mecazî di şkeftekê de bijî û perestina ku wê baweriyê nivîsiye (ku ne weke ya misilmanên din tevan e) bike. Ev kes ji vê şkeftê dernake ne ku ji bo kuştina kesên vê baweriyê xwîn, mal û milk û

rûmeta wan helal kiriye, bêyî ku guh bide zayend, temen û çanda wan, çimkî ew li gor vê baweriyê ``mirovên herî pîs in`` Li vir pirsek di serê mirov de digere, gelo madem ew van kesan pîs dibînin, çima tiştên ku wan çêkirine bi kar tînin û bi zanistên wan xwe ji nexweşiyan rehet dikin. Gelo eger ev kesên pîs (li gor wan) bi heman rêbazî danûstandinê bi pêrewên rêxistinê re bimeşe, dê rewş çawa bibe?

Li gor vê yekê, xizanî, lawaziya têgihiştina zanistî û windabûna rêgezên demokrasiyê û nemana lêborîn û qenciyê, faktorên xweyîtî yên bibandor di baweriya leşkerkirinê ya Daişê de ne. xuya ye rêxistin vê yekê dizane, nexasim ji ber ku îdyolojîknasan, kesên ku ramanên cîhadîst pêşwazî dikin û pêşkêş dikin, li ser sê biran dabeş kirine: Kesên derûniya wan hedar û rehet; ev kes yekser bi propogendaya rêxistinê bandor dibin û didin pey. Jixwe ev cûre ji kesên ku mejiyê wan fêrî pêrewiyê bûye, pêk tê. Cûreya duyem ew kesên ku derûniya wan gazinok e. Ev cûre, piştî ku were qaylkirin tev li rêxistinê dibin. Ev cûre, ji kesên ku mejiyê wan ezezî û dudilî ye, pêk tê. Cûreya sêyem, xwediyê derûniya ku dide pey tiştên xerab û her tişa xerab wî bi ser xwe de dikişîne; wate, ew misilmanê ku tiştên nebaş di dilê wî de hene lê hewil dide wan bi rêya oldariyê destpilîn bike. Ev yek li ba xwediyên armancên kesayetî heye.

Ji bo fktorên bêalî, pêngavên komployî yên dewletên ku li ser herêmê pev diçin, hin propogendayên diberî propogendayên rêxistinê, dîroka siyasî ya herêmê, tunebûna hêza hizirî ya kûr ya li hember îdyolojîka rêxistinê û çewsandina birayên heman baweriyê yên li welatên din, ev tev weke bingeh in ku rêxistin di baweriya leşkerkirinê de xwe dispêre wan. Rikberiya rûsî-rojavayî û tirkî-îranî-erebî li ser herêmê û bicihbûna wan li herêmê, bala kesên tundrew ên ku şer bi wan re dikin, kişand. Ya ku rewşa ewlekariyê aloztir kir, siyaseta girêbestan di navbera dewletekê û rêxistinê de da ku aliyê din bişikîne. Alîkariya ku Tirkiye pêşkêşî rêxistinê di şerê wê yê li dijî kurdan li Şengal û Rojava kir, beşekî sereke ji pêngavên komployî yên dewleta Tirk li hember kurdan e. Her wiha tewanên rûsî û amerîkî li dijî hev ên der barê handana her aliyekî ji wan ji şaneyên Daişê re li dijî aliyê din, dikeve çarçoveya pêngavên komployî. Di salên dawî de, rêjîm bi piştgiriya rûsî û îranî, pêngavên çareserkirina rewşa ewlehî ya endamên rêxistinê li herêmên xwe rabû. Di operasyona ``Birûska Cizîrê`` de hat diyarkirin ku komên xwecihî

yên nêzî saloxgerên rêjîma sûrî û rêjîma tirkî di gurkirina hestên êlî li hember çeteyên ku di vê pêngavê de hatin girtin, lîst. Armanc ji vê yekê gurkirina endamên êlan li dijî HSDê bû, her wiha da ku vê pêngavê weke rêkareke çewsandinê li dijî êlan bidin diyarkirin. lê belê endamên êlan ên ku dîdar bi wan re hat çêkirin, diyarkirin ku ew serwextî vê fêlbaziyê ne û ew alîgirên HSDê ne. Gelek pisporên ewlehiyê tekez dikin ku HSDê xwe sipart gelek gilî û gazinên xelkên herêmê heya ku dest bi vê pêngavê kir ku şaneyên rêxistinê li hemberî wê mat man. Van siyasetên komployî derfet da Daişê da ku baweriya leşkerkirinê li herêmê ku ew di wan de çalak e, belav bike û sûd ji propogendayên her aliyekî li hemberî aliyê din girt. Em dizanin bê çawa bi dehan qoqazî hatin Sûriyê da ku şerê rûsan bikin û bi dehan efganî û selefiyên ereb hatin herêmê da ku şerê dewletên rojavayî bikin. ji aliyekî din ve propogendaya reş a ku her aliyekî li hember dijminê xwe diweşand û piştguhkirina propogendaya Daişê, hişt ku hin kes bi propogendaya Daişê bandor bibin û tev lê bibin. Bi awayekî giştî, berjewendiyên Tirkiye, rêjîm, Îran, Rûsiya û Daişê di babeta dijminatiya Rêveberiya Xweser û HSDê de hene; ji ber wê jî madem baweriya leşkerkirinê li dijî HSDê ye, ev dewlet ne li dijî ne. ne tenê wisa lê belê ew piştgiriya wê ji aliyê ragihandinê ve dikin bi rêya diyarkina vê pêngava li dijî Daişê weke pêngavekê ji bo çewsandina êlên herêmê. Ev dewlet agahiyên saloxgerî yên der barê vê torê de li ba wan hene vedişêrin, ev jî amaje dike ku hevrêziyeke saloxgerî bi awayekî di navbera wan de heye.

Ji aliyekî din ve, carinan bi awayekî bê hemd propogendaya li dijî rêxistinê pişta wî digire. Weke mînak, carinan Daiş vîdyoyekê der barê jêkirina seriyan de belav dike armanceke wê ji bê vîdyoyê heye, îcar navgînên ragihandinê yên cihêreng wê vîdyoyê belav dikin da ku hovîtiya Daişê bidin diyarkirin. Bi vî awayî ev navgîn bêyî ku pê bihisin, xizmetekê ji bo Daiş dikin û vîdyoyên wî belav dikin. Nexasim dema ev navgîn girêdayî aliyekî zordar (ji aliyê siyasî yan olî ve) be. Weke mînak kenalên şîî û yên bazirganî yên ku van vîdyoyan diweşînin da ku kesên şîî û raya giştî armanc bigirin, lê hin kesên sinî hene çewsandî ne yan ji xwe çewisandî dibînin, van vîdyoyan dibînin ku li ba wan hesên piştgiriyê bi zordar re ne bi kesên qurban re peyda dibin û ev kesê zordar di çavên wan de dibe leheng, çimkî ew tola wî ji şîiyên ku sedema çewsandina wî ne, dihilîne. Jixwe şîiyên ku temaşeyî vê vîdyoyê kirin, dê wî kesên sinî biçewisînin çimkî kesê zordar ji mezhebê wî ye û bi vî awayî kîna li

hember ramanê dê veguhêze kîna li hember kesan û dê hewil bidin tola xwe jê hilînin. Her wiha dîroka siyasî ya herêmê bi rolekê di baweriya leşkerkirinê ya Daişê de lîst. Weke mînak erebê xwedî baweriyeke siyasî û neteweyî yan jî sinî, li ser baweriya xwe ji projeya vejandina osmanî û kevana şîî ya ku bi îdyolojiya ``wîlayeta feqîh`` nixumandî ye, ditirse. Ji ber wê berê xwe dide propogendaya Daişê ya ku angaşt dik ku ew ê xîlafeteke erebî ya sinî damezirîne. Her wiha komkujî û binpêkirinên ku civakên navxweyî (ereb û kurdên sinî) di serdema osmanî û sefewî û paşê di serdema dewleta tirkî, pehlewî û xumeynî de rastî hatine, bandorê li baweriya ku propogendaya Daişê wê armanc digire, dike. Paşxaneya siyasî ya van civakan, nahêle ew baweriyê bi van dewletên zordar û propogendaya wan bînin. Li hember wê Daiş heya astekê nû ye û hêzdariya wê li herêmê di destpêkê de ye û hêzeke ramanî ya li pêşberî wê bibe kelem tuneye, loma ew mîna penagehekê bo civakên bindest e. lê tevî wê jî rêxistinê cihê xwe di bîrdanka siyasî ya civakan de weke hêzeke hovane girt, nexasim piştî ku komkujî û binpêkirinên hovane li herêmê kirin.

Mijara çewsandina birayên baweriyê li welatên din, ji destpêka derketina Daiş û heya têkçûna wî, bingeha ku di baweriya leşkerkirinê de xwe dispêriyê, dimîne. Gotara kîn, cudaker û tenaziyê ya welatên rojavayî der heqê islamê de, çewsandina misilmanan li başûrê rojhilatê Asiya û Efxanistanê, binpêkirina mafên mirovan li Îran û hin welatên ereban û jidestdana jiyana xwe ya hin sivîlan ji ber tundrewiya hêzên israîlî, derbeyên asîmanî yên Hevpeymana Navneteweyî, Rûsiya, Îran û Rêjîmê û ji bilî van sedeman, dihêlin mirovê ku li ser ramanên tundrew vekirî ne, yekser berê xwe bidin rêxistinên radîkal da ku tola birayên xwe yên baweriyê hilînin û rê li ber êrîşên pêkan di pêşerojê de li dijî malbata wî û birayên wî yên baweriyê bigire. Ji ber wê jî babeta tolhildan û xweparastinê ya li gor nerîna îdyolojîk a olî, bi rolekê di pêşwazîkirina hinan ji baweriya leşkerkirinê ya Daişê de vedike. Ibin Xeldûn di vê derbarê de dibêje: ``…Ji ber ku derew behsa nûçeyê dike û sedemên wê hene (her wekî alîgiriya hin nerîn û mezheban), dema mirov di pejirandina nûçeyê de bêalî û navînî be, wê baş lê binere û lê bikole da ku rastî ji derewa wê nûçeyê binase, lê dema bide pey nerînekê yan jî alîgirê wê be, dê nûçeyê bipejirîne û dê ew alîgirî weke perdeyekê li pêşberî çavên wî be û nahêle rastiya wê binase yan jî wê rexne bike û lê bikole…di

encamê de mirov dê rastiyê bipejirîne û wê veguhêze…`` (Muqedimet Ibin Xeldûn, r125).

Bi awayekî giştî faktorên xweyîtî, ji faktorên bêalîbûnê bêtir bi rolê dilîzin û carinan dibin sedema hêza faktorên bêlaîbûnê. Bi rêya xwespartina li analîzkirina helwesta hin kesên alîgirê komên radîkal, mirov dikare faktorên herî sereke yên ku dihêlin mirov bide pey propogendaya leşkerkirina daişî diyar bike. Ew faktor jî di van xalan da tên nimandin: lawaziya hestên erênî li hember nasnameya niştumanî, nerazîbûna ji rewşa siyasî ya heyî, gotara kînê, xizanî û lawaziya têgihiştina zanistî.

- **Ji bo lawaziya hestên erênî li hember nasnameya niştimanî û nerazîbûna ji rewşa siyasî ya heyî:**

Di Rojhilata Navîn de bi sedan rêxistinên siyasî yên xwedî nerînên neteweyî, mezhebî, tîreyî û olî  û çepgir û rastgir hene. Ew tev jî xwedî ejindeyên desthilatdar in; hin ji wan gihaştin lutkeya desthilatê (Partiya Bas, AKP û koma wîlayet el-feqîh) û hinên din çalakiyên çekdar û siyasî ji bo desteserkirina desthilatê dimeşînin (Ixwan, şaxên Daişê û Qayîde). Ev rêxistin tev xwedî alîgir in li piraniya welatên herêmê. tundrewiya ji bo îdyolojiya van rêxistinan û zordariya rêxistinên desthilatdar û hevpeymanên ku li dijî hev dirêsin, sedemên sereke yên lawaziya hestên erênî li hember nasnameya niştumanî û carinan tunebûna wan hestan bi yek carê. Ev yek di aloziya Sûrî û Iraqaê de diyar e. kes û desthilat bi hev re beşdarî vê lawaziyê dibin. Rewşa siyasî ya herêmê diçesipîne ku baweriya (tîreyî, olî, îdyolojî) desthilatê desteser dike, çanda kînê di navbera civakên welatên derveyî  sînorê vê baweriyê de belav dike. Weke mînak, li gor lêkolîneke navenda RAND, desteseriya şîî û elewî li Sûrî û Iraqê, dihêle hin civakên erebî yên sinî bêzar bibin. Ji ber wê jî gelek dewletên herêmê astengiyan ji ber tunebûna ewlehiya niştumanî û mirovî dikişînin. Ev jî dihêle girêdanên siyasî di welatan de ku wan rêxistinan ew afirandiye, belawela bibin. Weke mînak, Hikûmeta islamî ya cîhanî heya derketina Îmamê Mehdî yan jî Kevana Şîî yan jî Welatê Şîî. Hin mînakên din: Xîlafeta Islamî, welatê erebî, welatê osmanî, Sûriya mezin û ji bilî wan…Jixwe her rêxistinek welatê xwe weke yûtûbiya û welatên rikberên xwe weke dîstûbiyayê dide diyarkirin. Ev jî hestên tirsê di li ba kesan û carinan li ba civakan (weke civaka kurdî ya êzîdî) peyda dike.

Bi awayekî giştî, serkeftina rêxistineke tundrew di damezirandina statûyeke taybet bi wê û belavkirna propogendayê ji bo wê, dihêle gelek kesên xwedî hest û ramanên mîna yên wê rêxistinê, bidin pey û hêdî hêdî ber bi tundrewiyê ve herin. Ev yek bi mubayea (hilbijartin) hejmarek rêxistinên terorîst li Aferîka û Asiyayê ji rêxistina Daişê re, tê çespandin. Ji aliyekî din ve taybetmendiya terorîst û tundiyê ya zêde ji hêla rêxistinên tundrew li hember dijminan, dihêle gelek kes li hember van rêxistinan an jî tevlîbûna li wan, bêalî bimînin; da ku xwe ji rêkarên wê biparêzin an jî da ku hin berjewendiyên darayî bi dest bixin. Çimkî xwesteka xweparastin û dabînkirina ewlehiya bo kesên nêzî xwe û rûbirûmayîna li hember gefên nişkivîn, hiştiye her kes xwe radestî hestên tirsê bike û di encamê de ew bê hemdî xwe ji bo radestî desthilateke tundrew bin, amade dibin. Weke ku tê gotin, li hemberê metirsiya mirinê her tişt serbest e. Lê tirs şîretkarekî nebaş e û gerek e em ji kesên ditirsin, bitirsin.

Lawaziya nasnameya niştumanî dibe sedema zehmetiya qirkirina radîkaliya tundrew di nav gelên piştguhkirî de yan jî gelên ku di jîngehên zehmet, terajedîk û paşmayî de dijîn. Ew jî ji ber ku ev gel di bin sîwana desthilateke zordar de ne. Jixwe tê nasîn ku her çiqasî tirajediya mirov zêdetir dibe, bêtir bi tiştên ku li balê kêm in, bandor dibe û hizirîna mentiqî li balê kêm dibe. Ev jî mirovê zehmetkêş û tirsonek diafirîne yan jî li bal wî mirovî baweriya ku ew di bin zordariyê de ye diafirîne. Bi vî awayî têkiliyên civakî lawaz dibin û mirov ji dunyayê qut dibe û bi tena xwe dimîne. Bi vî awayî jî girêdanên niştumanî û civakî lawaz dibin û atmosfereke guncav ji bo hembêzkirina ramanên tundrew peyda dike ku ew raman nasnameyeke nû ya civakî li balê peyda dike, ew jî nasnameya biratiya baweriyê ye. Xwediyên vê nasnameyê weke komeke hevgirtî li hember jiyana heyî tev digerin bêyî ku guh bidin duristî yan çewtiya van ramanan. Ya girîng ji bo wan ew e ku ev raman kêfxweşiya razberî û şênberî ji bo wan peyda dike û hevkarî, lêborîn û qenciyê li hember kesên din li ba wan tunde dike.

- **Ji bo gotara kînê:**

Kîna tundrew, taybetmendiyeke serke ya baweriya leşkerkirina daişî ye û ew yek ji şîroveyên tundrewiya hovane ya endamên Daişê der heqê bi hezaran kes (jin û mêr û biçûk û mezin) de ye. piraniya analîzan amaje dikin ku tundrewî di jîngehên tije çanda kînê de bêtir derfeta mezinbûn û

ferehbûnê dibîne û dihêle mirov kesên din, bawerî û reftarên wan nepejirîne; her wekî gotara nakokiya tîreyî û olî yan jî gengeşeyên serkeftina nijadî yên bêwate yan jî kirina hin reftrarên ne ji rêza xwezaya mirov an jî dijberî baweriyan, her wekî şûkkrina hemzayendê û beravêtina ji ber sedemên ne durist. Her wiha kar û çalakiyên ku kîna tundrew li hember baweriyekê didin diyarkirin an jî qedexekirina wê bi mebesta têkbirina wê, enerjiyeke veşartî ya metirsîdar li hember wan hewildanan derdikeve pêş. Bi vî awayî tundrewî dibe enerjiya razberî ya tekane ji bo parastina nasnameya olî û tişta ku mirov baweriyê pê tîne. Di vê derbarê de lêkolerê fransî ``Tezfîtan Todorof`` dibîne ku ``…destwerdana di cihê olê di di civakê de, tê wateya şikbûna bi waneyê ku her mirovek li ser nasnameya xwe ya civakî û nasnameya xwe ya zayendî pêk tîne… Bawermendên misilman di cîhaneke hişmendî de ku ji cîhana bawermendên xiristiyanî cuda ye, dijîn…`` Analîza derûnî amaje dike ku mandelekirina baweriyê, tenaziya pê yan jî çewsandina wê, trajediyeke rastîn bo bawermendan pêk tîne û ev yek ji faktorên sereke yên veguhestina islamê ber bi radîkaliyê ve ye. Tê naskirin ku armanca sereke ya piraniya pêngavên xwekuştinê ku tundrew navê wan dikin (pêngavên şehadetê), olî ye, ne siyasî.

Li Sûriyê –weke mînak- gelek pêkhateyên ku ji aliyê îdyolojîk ve dijberî hev in, hene; her wekî şepêlên islama siyasî (ixwan, selefî, neqişbendî, elewî, şîî û ismaîlî) û şepêlên nidadî yên ku hemû pêkhateyên welat napejirînin û tevgerên çepgir ên dijberî van îdyolojiyan. Her wiha dûrbûyîn di navbera nirxên sincî û reftarên neyînî yên nakokdar yên li dewletên belav. Weke mînak di perwerdehiyê de xwendekar tên fêrkirin ku zina, reşwe (bertîl), sitemkarî, dizî, vexwarina meyan…heram in; lê tevê wî jî mirov dikare van tiştan bi hêsanî li her derê bibîne.

Ji aliyekî din ve, propogenda û ragihandina ku rêzê ji taybetmendiyên çandî û etnîkî re nagire û meqresiyê bi hestan re dike (her wekî pêşandana hin vîdyoyên ku tê de kuştin û pîskirina pêrewên baweriyekê hene yan jî weşandina hin nerînên kesayetî yên nedurist der heqê baweriyekê de yan jî tenaziya bi wê baweriyê… yan jî çêkirina propogenda der barê çandekê de û piştgiriya wê bi awayekî zêde yan jî weşandina hin karên hunerî (fîlmên sînemeyê, yan jî stran, yan jî çîrok, yan jî pêşangeh yan jî konser) di van

derbaran de…enerjiyeke mezin a ber bi tundrewiyê û belavbûna wê ve peyda dikin

Ji aliyekî din ve, siyaseta zordar a desthilatê û gendeliya wê, yek ji sedemên peydabûna kînê di hestên welatiyan de ye. Dema rêgezên birêveberiya durist di saziyan de neyê meşandin û demokratîk di siyasetê de neyê pêkanîn, hestên mezlûmiyê li ban hin çînên civakê peyda dike. Di encamê de atmosferke guncav ji bo derketina faktorên handana wê çînê ber bi tundrewiyê ve peyda dike. Analîzên derûnî didin diyarkirin ku têkilî di navbera hestên bindestî, bêrûmetî û stûxwariyê ji aliyekî ve û rêjeya tundrewiyê ji aliyekî din ve heye. Nexasim di bin sîwana sîstemên desthilatê yên zordar, xizaniya li gel nezaniyê de. Tundrewiya ku bi aloziya Sûriyê re ji hêla aliyên cûr bi cûr ve hatiye, vê yekê tekez dike.

Sedema metirsiya kîna tundrew a ku baweriya leşkerkirinê ya daişî xwe dispêriyê, karîna wê ya guhestina mirovê girêdayî xwe ber bi kesekî ve ku karibe ziyanê (di nav de kuştin jî) bigihîne heta xizm û cîranê xwe jî; tenê ji ber ku ew ne li gor îdyolojiya Daişê ne. ev faktor bi awayekî diyar li ba piraniya çekdarên biyanî xuya dibe. kîna tundrew hişt ku ev çekdar bi hezarên kîlomitreyan dev ji welatên xwe berdin û berê xwe bidin Sûriyê û sûc û binpêkirinên hovane pêk bînin bêyî ku mûyek ji laşê wan bilive. Ji aliyekî din ve, li kêleka xesaretên şênberî û qurbaniyan, binpêkirinên Daişê birînek di binyata razberî ya civakê de pêk anîn (çi di çarçoveya qurbaniyan û malbatên wan de be çi jî di çarçoveya sûcdar û malbatên wan de be). Bi vî awayî bawerî û pêwendî tune dibe, çanda kînê çalak dibe û dibe ku rewş kambaxtir bibe û bertekên tund di navbera her du aliyan de derkevin. Ev yek bi awayekî nerasterast di pevçûnên êlî yên gundewarên Dêra Zorê, Reqa û Hesekê di navbera dem û demkê de, diyar dibe. bi vî awayî rewş careke din ber bi komkirina mirovan di bin sîwana tundrewiyê de diçe û careke din babelîsoka tundiyê digere.

- **Ji bo xizaniyê:**

Gelek dibînin ku xizanî yek ji jêderên nebaşiyê ye, lê reftarên kesên xizan berovajî vê yekê diçesipînin. Xizanî habdera piraniya şoreşên li dijî sitemkariyê bû. Dema mirov li têkiliya di navbera beşdariya di nav komên tundrew û xizaniyê de binihêre, dê bibîne ku nerazîbûn, bêçarebûn û hestên

raperînê li dijî wî kesî an go alî ne ku sedema xizaniyê ne, loma ev yek dibe sedem ku kesê xizan tev li komên tundrew bibe. ya ku dîmenê diyartir dike, siyaseta xizankirinê ya ku desthilatên zordar li hember civakên xwe pêk tînin da ku wan di bin serweriya xwe de bihêlin. Ev siyaset ji hêla piraniya sîstemên desthilatê yên Rojhilata Navîn ve hatiye bikaranîn, bi taybet li Sûriye û Iraqê. Sozên komên tundrew ku ew ê dabara jiyanê baştir bikin ku xwe di vê yekê de dispêrin yotyobiya ku îdyolojiya wan wê disêwirîne. Her wiha pêşkêşkirina alîkariyên darayî ji bo kesên beşdarî wan dibin û kirina sedema xizaniyê di stûyê hikûmet û hêzên navneteweyî de alîkariyê di propogendaya leşkerkirinê de dikin. Baweriya leşkerkirina daişî guh daye babeta xizaniyê û ew ji bo kişandina gelek mirovan ber bi xwe ve bi kar aniye. Wê hin fetwe jî derxistin ku rê didin pêrewê wê ku dizî, şelandin, kolekirin û sebîkirinê bikin û heta şûnwaran jî bidizin. Îcar bidestxistina xenîmeyên cûrbicûr bala gelek çekdarên rêxistinê kişand, bi taybet kesên di jîngehên xizan de dijîn. Bi vî awayî rêxistin bû jêdereke têrbûnê. Bi vî awayî bi rêya baweriya leşkerkirina daişî, xizaniya ku sedemeke şoreşê ye, dibe jêdera nebaşiyê.

Li gor endameke rêxistinê ku di kampa Roj de ye, Daişê hewil da xizmetguzariyên belaş ji bo endamên xwe yên dilsoz peyda bike da ku kesên xizan û yên li jiyana xweş û pitir digerin handanî tevlîbûnê bikin. Bi rêya nivîsgeha karûbarên mucahidan, Daişê guhdana tenduristî ya belaş ji bo endamên xwe peyda kir. Ew jî bi rêya kerta mêr û bi rêya dermanxaneyên rêxistinê û xizmetên din ên belaş, her wekî v, kehrebe, telefon, xanûberên malê, xaniyên belaş û dabînkirina bidestxistina siwareyekê û belaşbûna ardû û çeksazkirina wê, belaşbûna çeksazkirina xanî û belaşbûna şûkirinê û dana fonên bi qasî 500-700 dolarî… wate, Daişê jiyana belaş a balkêş ji bo endamên xwe pêşkêş kir ku gelekî ji jiyana wan a derveyî rêxistinê cuda ye. Li hemberî wê divê ew bibin pêrewê wê û cîhadê di ber de bikin. Daişê bi zanebûn bi mejiyan û bi valahiya darayî û olî ya ku endamên wê astengî ji ber dikişandin, lîst.

- **Ji bo lawaziya hişmendî û zanistî:**

Di civakên Rojhilata Navîn yên oldar de, hizirîna hestî serdestî ya zanistî ya bêalî ye. piraniya babet, diyarde û bûyeran li gor nerîneke bawermendî ya giyanî şîrove dikin û dinirxînin. Bi awayekî giştî ew bawermendiyê di ser ramanên bêalî û zanistî re digirin. Ev civak ola ku di bingeha xwe de weke

şoreşeke civakî ye, di mijarên zanistî yên xwerû de sînordar dikin. Jixwe tewana zindîqbûn û gawerbûnê ji bo her kesê hewil dide ji vê rêgezê derkeve, amade ye. tê zanîn ku nirxê her baeriyekê di rêgezên reftarî û sincî de ye ku bi rêya wan, ewlehiya şênberî û razberî di jîngeha xwe de pêk tîne. Berê jî kesên mîna Ibin Sîna û Ibin Rişd û ji bilî wan astengî ji ber vê babetê kişandine. Di serdema nû de jî em gelek lêkolînan di biwarê zansitên piratîkî û xwezayî de dibînin ku xwediyê wan ên misilman wan lêkolînan bi ayet û gotinên olî dest pê dikin û paşê dest bi lêkolîna xwe dikin ku tu têkiliya wê bi wan ayet û gotinên olî re tune ye. Mîna ku ew bixwazin baweriyê ne ramaneke zanistî biçesipînin. Ev yek jî jîngeheke ramanî diafirîne ku kesên tundrew ên ku di gengeşeyên fiqhî de zana ne, dikarin bi rêya wan ramanên xwe yên tundrew tekez bikin û wan ramanan bi mirovan bidin qayîlkirin.

Dema em rewşa perwerdehiyê li welarên Rojhilata Navîn (bi taybet li Sûriye û Iraqê) bişopînin, em ê bibînin ku aliyê teorî û şîroveyî di ser aliyê piratîkî re tê girtin. Her wiha biranşên wan ji aliyê agahî û ramanan ve lawaz in û ev ramanên heyî jî bi têgehên neteweyî û olî yên ku raboriyê pîroz dikin û hestên serkeftinê yên derewçîn tije ne. Ev yek jî moral û xwesteka pêşketina zanistî û ramanî ya bêalî li ba wan lawaz dike.

Lawaziya têgihiştina zanistî, şerê taybet yê ku armanca wan hilweşandina sîstema nirxên sincî û niştumanî yên civak û welatan hêsan dike û bi awayekî bilieztir tên desteserkirin. Ev yek jî xizmeteke belaş e ji bo baweriya leşkerkirina daişî ye; çimkî bawerî di navbera hikûmet û welatiyên wê û pêrewên baweriyên olî û zanistperestî de namîne û teoriya komployê xurt dike.

Her wiha baweriya leşkerkirinê ya daişî xwe dispêre lawaziya têgihiştina zansitî, bi taybet di biwarê zansitên olî û analîza siyasî ya bêalî de. Bi vî awayî hewil dide kesan bixe pêrewên xwe yên dilsoz. Bi rêya vê yekê rêxistin wîsayeta xwe ya olî li ser kesan disepîne û hestên rexnegir der heqê baweriyên wê yên îdyolojîk, dûr dixe û kîna tundrew li hember kesên derveyî sînorê wê yê ramanî gur dike. Ev faktor bi awayekî giştî û zelal li ba endamên wê yên girêdayî civakên xwecihî yên sûrî û iraqî dixuye.

- **Alav û rêbazên baweriya leşkerkirina daişî:**

Rêbazên bikaranîna darê zorê, biserxwedebirin (kaşkirin) û iqnakirinê rêbazên herî berbelav ên ku Daiş di pêngavên leşkerkirinê de bi kar tîne.

Serkeftina her rêbazekî ji van xwe dispêre rewş û baweriyên ku dijîngeha armancgirtî de berbelav in baweriya leşkerkirinê ya daişî xwe sipart van rêbazan û ji bo wê propogendaya komployî, leşkerkirina neçar û teror weke rêbazên pêngavên leşkerkirinê bi kar anîn û bi rêya hejmarek alav ev rêbaz bi kar anîn.

Ji bo propogendaya komployî, li gor lêkolerekî, propogendaya tundrew bi awayekî giştî ji sê pêkhateyan pêk tê: ``Yekem: Dana şîroveyên çewt, Duyem: Dana pêşbîniyekê ji bo tişta gerek e were kirin, Sêyem: Dana sedemeke mentiqî der barê kesê ku dê bi vî karî rabe û çima dê pê rabe. Weke mînak: Daiş angaşt dike ku islam û misilmanên sinî rastî êrîşekê tên (şîroveya çewt), paşê dide diyarkirin ku pêwîstî bi damezirandina xîlafeyekê heye (pêşbînî der barê tişta ku gerek e were kirin), paşê dibêje gerek e tu jî bi çi awayî be beşdarî vê damezirandinê bibe (sedemeke mentiqî der barê kesê ku dê bi vî karî rabe)…`` Daişê propogendaya xwe wisa belav kir ku cîhan cihekî gendel e, misilman tê de binpêkirî ne, Daiş hat da ku wan rizgar bike û kesê bide pey şopa wê ew misilmanê durist e û kesê dijberî wê rabe, cezaya wî kuştin e û ew ê êşkenceya mayî li Docehê biqedîne. Ji bo vê yekê û li gor îdyolojiya xwe ya ku pişta van sêwirandina digire, bi dehan wêne, sirûd, vîdyo, muzîk û gotaran pêşkêş dike. Jixwe ew enternetê weke alaveke pêwendiyê ya ne yekser bi kar tîne. Di encamê de van vîdyo, wêne… bala bi hezaran kesên mereqdar, bêhiş û hestiyar kişand û karîbû bi hezaran kes ji xwe re bike leşker. Van kesan yan li bajarên xwe yan jî bi rêya hatina li Sûriyê, ferman û biryarên Daişê pêk dianîn. Piraniya endamên Daişê yên biyanî (jin û mêr) – weke gava yekem- bi rêya malperên civakî  hatin leşkerkirin. Li gor navenda RAND a lêkolînan, heya sala 2017an, 1.35 melyon kesî alîgirên Daişê li ser Twitter, Berger û Motgan bûn.

Ji bo pêwendiya yekser, Daişê endamên xwe yên dilsoz weke alav bi kar anîn da ku bikevin gengeşeyên îdyolojîk, gotarên olî bidin, zanistên olî bidin û belavokên tên xwedin, bihîsin û temaşekirin belav bikin. Karê van kesan bêtir li navendên olî (mizgeft, dibistanên olî û xelekên nîqaşa olî) û meclisên civakî (mêvanxane, meclisên ezayê û mewlûd û boneyan) bû. Ev alav ji bo leşkerkirinê li gund û jîngehên xizan ên ku enternet li wan nîne bêtir bikêr bû.

Her wiha wê bi dehan kesên hezkerên zayend û pereyan bi ser xwe de kişandin. Daişê bi rêya dana xenîmeyan, vekirina bazarên firotina jin û koleyan, kirîna jinên dîl, dana fonên mehane yên bilind û handana dizî û şelandina civakên rastî êrîşan dihatin…endamên nû bêtir bi xwe ve girê didan.

Ji bo terorê, rêxistinê reftarên hovane der heqê dîlan de pêk anîn; her wekî jêkirina seriyan, parçekirina laşan, şewtandina bi saxî, kuştina bi guleyan di rewşeke pîs de, destwerdana di terman de…da ku civakên xwecihî bitirsîne û ew civak xwe ji şerê wê biparêzin; yan bi rêya xweradestkirinê, pê re jî diketin bin serweriya wê; yan jî bi rêya revînê û pê re jî berxwedan tune dibe. ji bo kesên diketin bin serweriya wê, ew neçar bûn cîhadê li dijî civakên xwecihî bikin da ku alîgiriya xwe ya ji Daişê re bidin diyarkirin. Daişê şûkirina endamên xwe bi jinên civakên xwecihî jî sepand û sazî ji bo mubayea şêx û rûspiyên êlan li Dêra Zorê, Reqa û Mûsilê saz kirin da ku xwe weke beşekê ji rewşa civakî li herêmê bisepîne û rewşeke civakî ya nû li herêmên ku dagir dikirin biafirîne. Ji bo ku kesê dijber an jî yên êzîdî xwe ji  koletiyê rizgar bike, neçar bû tev li îdyolojiya wê bibe. Daiş komkujî der heqê hin êlên ku nexwestin pê re şer bikin, pêk anîn, her wekî êla şiêtat a sûrî û êla bûnimir a iraqî. Piştî ku desthilata wî li herêmê di sala 2019an de ji hev ket, Daişê xwe sipart şantajê li dijî sivîlan; ew jî bi rêya xwarina gefan ku ew ê bi pêngavên tolhildanê li hember wan rabe eger ew tev li wê nebin yan jî alîkariyê pêşkêşî şaneyên wê nekin. Ev yek bi rêya hin jêderên ewlehiyê yên nêzî HSDê hat nasîn. HSDê  di pêngava Birûska Cizîrê de xwe sipart gilî û gazinên welatiyan ku wan da diyarkirin ku ew rastî şantaja darayî ya bi navê zekatê û rastî tirsandinê hatine, eger ew alîkariya Daişê nekin. Her wiha Daişê dabû diyarkirin ku her kesê alîkariya Rêbeveriya Xweser bike ew ê ziyanan bigihînine. Ya ku vê yekê tekez dike, daxuyaniya ragihandinê ya HSDê ya di vê derbarê de: ``…Pêngava Birûska Cizîrê, weke berdewamî ji têkoşîna leşkerî ya hêzên me li hember şaneyên Daişa terorîst e. Ev pêngac li gor pilan û lîsteyekê ye ku li gor pêwîstiyê hatiye û li ser herêmên Hol, Tilhemîs û Tilberakê tekez dike. Ew jî ji ber ku hin şaneyên terorîst hewil dane niştecihan bi êrya şantajê neçarî îdyolojiya xwe ya tundrew bikin û hin endamên nû bi ser xwe de bikişînin. Ew jî bi rêya arastekirina peyam û gotara ragihandinê ya ku xwe dispêre tengkirina olî. Hin kesên jirêderketî yên dijminê Rêveberiya Xweser alîkariya Daişê di vê yekê de kiriye, lê ew hatin girtin û

torên wan ên leşkerkirinê (di nav de leşkerkirina zarok û ciwanên nûhatî) hatin jevxistin...``

Ji bo leşkerkirina bi zorê, Daişê bi rêya sûdwergirtina ji sepandina serpereştiya xwe ya olî, her kesê kete bin serweriya wê neçar kir beşdarî çalakiyên wê yên leşkerî bibin (çi yên şer, çi ewlekarî, çi locistîk çi jî leşkerkirin). Ev tev di bin navê ``cîhadê`` de. Ev yek kir weke şertekî ji bo her kes alîgiriya xwe ya ji bo Daişê bide diyarkirin. Ev yek bi rêya saziyên xwe yên leşkerî û dezgehên xwe yên ewlekariyê pêk dianîn, her wekî dîwana leşkeran, artêşa xîlafetê, artêşa Dabiqê û artêşa Usreyê û şaneyên ``Inximasî). Piştî têkçûna Daişê, wê xwe sipart şantaja terorîst da ku mirovan neçarî tevlîbûna xwe bike.

- **Rawestîna li hember propogendaya leşkerkirinê:**

Baweriya leşkerkirina daişî, hişt ku aloziyeke ramanî ya mezin di hin civakên sûrî û iraqî de pêk were. Rêxistinê sîstemên sincî û urfên çandî yên pêrewên xwe hilweşandin û hişt ku îdyolojiya wê bipejirînin bi rêya handana wê li ser şer. Ew jî bi rêya tijekirina mejiyê wan bi têgehên baranoyî. Vê jî hişt hilweşîneke şênberî û razberî ya mezin di heft salan de çêbe. Piştî ku ew di avdara 2019an de li Baxozê têk çû, heman rêbazê xwe yê leşkerkirinê yê berî derketina wî di sala 2014an de meşand. Ji ber wê jî babeta rawestîna li hember propogendaya leşkerkirinê ya li ba rêxistina belawela, şertekî sereke ye ji bo pêkanîna xweparastinê li hember êrîşên wê û ji bo danîna sûrên ramanî, razberî û hestî da ku careke din xwe di nav civakên xwecihî de belav neke. Mirov dikare bi rêya xwesipratina li diyalktîkê di analîzkirina taybetmendî û faktorên xweyîtî û bêalî yên aktîv di baweriya leşkerkirinê ya li ba Daişê, van sûran damezirîne û çareseriyekê pêşkêş bike ku bigihêje baweriyeke nû ku em dikarin bi awayekî mecazî navê wê bikin ``baweriya ewlehiya ramanî``. Ev bawerî dê bibe yek ji stûnên sereke yên xweparastinê.

Rawestîna li hember baweriya leşkerkirina taybet bi Daişê, xwe dispêre guhertina mejiyê li ber propogendaya wê lawaz e. Mirov dikare vê yekê bi rêya alavên maddî û manewî pêk bîne. Berî ku em bikevin vê mijarê de, gerek e em mejiyên ku bi propogendayan bandor dibin, binasin. Di nav van mejiyan de yê herî diyar, mejiyê pêrew e, jixwe ev mejî gelekî pir in. Hema hema ew taybetmendiyeke çîneke mirovan di dîroka siyasî ya herêmê de ye ku

digihêje civaka çînî ya somerî. Desthilatdaran karîbû enerjiya vê çînê ji bo parastina desthilata xwe û xurtkirina wê bi kar bînin. Ew jî bi rêya derxistina têgehên giyanî û çandî ji qalibên wê yên sincî û bişaftina wê di nav qalibên xwe yên îdyolojîk û desthilatî de û bi rêya xweûibandina bi xwedawendan di cezakirina reftaran de.

Bi giştî û bi rêya encamên ku ji derdorê hatine bidestxistin, mirov dikare kesên xwedî mejiyê pêrew (çi bindest bin çi serdest bin) bi vî awayê li jêr dabeş bike:

1. Kesên vîna wan li hember xweşî, pere, hêz û zayendê lawaz e.
2. Kesên bi reftarê keriya pez re diguncin.
3. Kestên tundrew (olî û nijadî).
4. Tirsa ku pê re ewlehiya mirovî ya kesan tune ye. wate, mirovê ku bi ewlehiya şênberî û razberî nahise.

Ji bo mijarên xizanî, nezanî û tundiya siyasî, ew faktorine hander ên ne sereke ne. sedema vê yekê ew e ku kesên akademisyan, dewlemend û kesayetên ku astengî ji ber zorbaziyê nekişandine hene. Ya ku vê yekê tekez dike, hebûna çekdarên ewropî di refên rêxistinê de ku ew ji dewletinan hatine ku bi demokrasiya xwe û dewlemendiya xwe nakirî ne. Hin ji van kesan mirov dikare mejiyê pêrewiyê li ba wan bi wayekî hêsan biguhere; ew jî bi rêya çarserkirina faktorên madî û manewî yên ku dibin sedema vê hişmendiyê. Lê ji bo kesên dogmayî, guhertina nerînên wan zehmet e, lê mirov bi rêya girtina rê li ber hincetên wan dijminatiya di hundirê wan de tev nede.

Ji bo rawestîna li hember baweriya leşkerkirinê ya li ba Daişê, pêwîst emejiyên armancgirtî û mejiyên ku li hember vê baweriyê radiwestin, rastiya projeya Daişê, rastiya çanda wê binasin û zanibin çawa xwe dûrî çanda toklaniyê kesayeta xwe pêk bînin.

Tevî ku rêbazên rawestîna li hember baweriya leşkerkirinê ya daişî pir in, lê bi awayekî giştî du rêbazên sereke ji bo rizgarkirina mejiyên di bin desteseriya îdyolojî ya Daişê de û ji bo rawestîna li hember baweriya leşkerkirinê û ji bilî wê ji rêxistinên tundrew û çete li bakur û rojhilatê Sûriyê û dibe ku li Rojhilata Navîn û tevahî cîhanê hene: ew rêbaz jî ev in: bradîgmaya neteweya demokratîk û alîkariya kesên bindest û pozbilind da ku xwe dûrî bandorên îdyolojiyên tundrew pêk bînin.

Bradîgmaya neteweya demokratîk ji aliyê pratîkî ve, tecrubeyeke hinekî nû ye di nav civakên xwecihî yên bakur û rojhilatê Sûriyê. Vî rêbazî heya astekê karîbû xwesteka dijminatiyê ya ku bi rêya îdyolojiyên tundrew (olî û nijadî) dûr bixe. Van dijminatiyan gelek kes û mejî bi jehir kirin û hişt binpêkirinên mezin li dijî civakên xwecihî ji dehên salan ve pêk werin. Vê bradîgmayê heya astekê karîbû rêkeftineke karê a hevbeş di navbera kesên navînî yên yên ji baweriyên cihêreng de pêk bîne û di heman demê de taybetmendiyên her baweriyekê parastin, ew jî bi rêya diplomatîka aştiya navxweyî û ewlehiya civakî di navbera civakên xwecihî de (islamî, xiristiyanî û êzîdî) û di navbera aliyên siyasî yên navînî (neteweyî, olî, zanistperestî, çepgir û rastgir) de. Dema mirov serdana goristanên şehîdan bike, dê kêlên şervanên ji pêkhateyên cihêreng bibîne. Ya ku ev kes li hev kom kirine, ev bradîgmaya ye. mirov dibîne ku kesên dijberî vê biradîgmayê ne, girêdayî komên olî û nijadî yên tundrew in, her wekî koma Wîlayet el-Feqîh, Partiya Basê, Ixwan, AKPa tirkî, Daiş, Qaîde, Ertozeksên potînî (eger ev têgeh çêbe). Van koman hin alîgirên xwe li herêmê dîtine. Mirov dikare rola wan di berdewamiya aloziya Sûriyê de bibîne û bibîne bê çawa dewletên mezin wan bi kar tînin da ku tevlîheviya bizanebûn zêde bibe. Ev hêz nikarin niha şerekî rasterast li dijî Rêveberiya Xweser û HSDê bikin. ew jî ji ber hejmarek sedem, her wekî piştgiriya civakên xwecihî ji wan re û hebûna şirîkatiyeke leşkerî di navbera HSDê û Hevpeymana Navneteweyî de. Ji ber wê jî bi dilê van hêzan e ku Daiş li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê çalak bibe. ev hêz bi rêya propogendaya xwe ya reş bi awayekî yekser an jî neyekser xizmeta baweriya leşkerkirinê ya Daişê dikin da ku aramiya li herêmê ji hev bixin.

Baweriya leşkerkirinê ya Daişê li vê bradîgmayê diqeilbe, loma şaneyên Daişê yên terorê li dijî alîgirên xwe bi rêya kuştin an jî gefxwarina rasterast bi kar tînin; Her wekî kuştina Mueyidê Reyaş (endamê Meclisa Zagonsaz a Dêra Zorê), Kuştina Hind el-Xidêrî û Seide el- Hermas (berpirsên rêveber ên bajarokê Tiş Şayir li gundewarên Hesekê) di sala 2021ê de û ji bilî wan. Daiş bi rêya nîvcokirina ayet û hedîsên Pêxember û derxistina wan ji rastiya wan a sincî û dîrokî, fetweyên ku vê bradîgmayê dikufirînin, derdixe. Dibe ku ev yek dihêle ku tatbetmendiyên baweriya leşkerkirinê ya daişî li pêş çavê her kesî diyar be. Ew jî bi rêya dijberiya taybetmendiyên bradîgmaya neteweya demokratîk bi taybetmendiyên baweriya leşkerkirinê ya daişî re. Ji ber wê jî

her ku bradîgmaya neteweya demokratîk bêtir li ser rûyê erdê were bikaranîn, ew qasî dê baweriya leşkerkirinê ya daişî lawaz bibe.

Ji bo xwepêkanînê, dibe ku hin kes bipirsin gelo çi sûda vê yekê di lawazkirina propogendaya leşkerkirinê de heye. Lê şîroveyên xwestekên ku dibin sedema beşdarbûna bi dehan kes di nav refên Daişê de, li xalekê digihêjin hev. Ew xal jî bi gerîna mirov li pêkanîna kesayeta xwe û dana wateyekê ji bo hebûna xwe û rola xwe di jiyanê de tê nimandin. Mirov xwe di vê yekê de dispêre rêgeza ``di vê jiyanê de her mirovek xwedî wateyekê ye. Ev yek bi awayekî yekser bi mezinbûna mirov a ber bi aliyekî bawerî-pîşeyî ve girêdayî ye. Ji ber wê jî hin kes berê xwe didin huner, wêje, werzîş, zanistên pratîkî, siyaset, artêş, aborî û her wekî din. Derûnnas amaje dikin ku xwepêkanîn, hestekî kêfxweşî û serfiraziyê li ba mirov peyda dike mîna ku ew enerjiyek be hestên mirov têr bike.

Bê guman bi guhertina rewşên ku bandorê li jîngeha derdorê dikin re, nerînên mirovan jî diguherin. Weke mînak, kesekî baweriyê bi mezhebê şîî tîne û di çarçoveyeke ku piraniya wê sinî ye de dijî û ew tev astengiyan ji ber zordariya desthilatê dikişînin û tev ji ewlehiyê mehrûm in û tevgerên şoreşgerane yên demokratîk di çarçoveya wan de çalak in, helbet dê tevgerên şîî yên xwedî têgehên şoreşgerane yên ku doza wekheviyê di çarçoveya biratiya baweriyan de dikin, bala wî bikişînin. Kesayeta wî dê di kesayeta koma ku tevlî dibe de were helandin û serkeftina koma wî dê kesayeta wî pêk bîne. Her wiha hem tişt ji bo xwediyên baweriyên din ên di rewşên weke vê re derbas dibin, derbasdar e.

Ji bo têgeha xwepêkanînê, piraniya analîzên girêdayî wê berê xwe didn teoriya ``pîramîda Maslo ya pêdiviyên mirovî``. Ev teorî ji hêla derûnnasê amerîkî Abraham Maslo ve di çarçoveya keda mirov ji bo dabînkirina sêgoşeya pêdiviyên xwe yên sereke (tîmar, parastin û zayîn) hatiye pêşkêşkirin. Ev pîramîd li ser pênc qonaxan tê dabeşkirin. Mirov dikare wan wisa pêşkêş bike. Rêza wan ji aliyê girîngiyê ve wisa ye: pêdiviyên byolojîk û fîzyolojîk, pêdiviyên selametî û ewlehiyê, pêdiviyên heszikirin û girêdana civakî û pêdiviyên rêzgirtin û qedrê xwe girtin û pêdiviyên xwepêkanînê ku mirov nikare wê pêk bîne heya yên berî wê pêk neyîne.

Ev teorî dibîne ku ji bo her mirovekî pîramîdek ji pêdiviyan heye, gerek e were pêkanîn. Pêdiviyên kêm, mirov han dide da ku kar bike û wan dabîn bike. Ev pêdivî li gor girîngiya wan tên rêzkirin û heya ya yekem neyê têrkirin, mirov nikare xwe biguhêze yên din û bigihêje lutkeya pîramîdê. Li lutkeyê jî pêdiviya ``xwepêkanînê`` heye, lê gelek nikarin xwe bigihîninê ji ber yan rewşa wan an jî lawaziya karînên wan. Kesên ku di pêvajoyên leşkerkirinê vê yekê bi kar tînin û didin diyarkirin ku rêxitina wan dikare vê pêdiviyê dabîn bike. Hat dîtin ku rêxistin, stratejiyeke metirsîdar ji bo têrkirina pêdiviyên sereke bi kar tîne. Ew jî bi rêya handana xwesteka dijminatiyê li ba kesên bêhêvî heya ku bigihêjin asta hovîtiyê. Vê yekê bi rêya fetewayên olî yên ku li gor îdyolojiya xwe derxistine. Her wiha bi rêya kirina kuştin û binpêkirina dijminên çêkirî (ya laşî, şênberî û razberî) weke dabînkirinekê ji van pêdiviyan re. Pêdiviyên fîzyolojîk û bîyolojîk bi xenîme, sebî û kolekirinê hatine nixumandin, pêdiviyên selamet û ewlehiyê bi sozên derew ên ketina Buhiştê û razîbûna Xwedê hatine nixumandin, pêdiviyên hezkirin û girêdana civakî bi hevgirtina birayên baweriyê û girêdana bi civakeke derew ya di bin navê dewleta xîlafeta islamî de hatine nixumandin. Ev babet gihaştiye pileyên nejirêzê bi rêya cîhada şûkirinê û armancgirtina kesên bêrî li gelek welatan bi bihaneya beşdarbûna welatê wan di şerê li dijî Daişê de. Mirov dikare vê yekê di kombûnên tundrew ên endamên Daişê li Holê bibîne. Ji bo pêdiviyên rêzgirtinê û xwepêkanînê, ew bi karîna cîbicîanîna tekûz a berpirsiyariyên li ser milê wî û pêkanîna îdyolojiya rêxistinê hatine nixumandin. Mesele bi hinan ji wan re gihaştiye asta xwekuştina di nav komên mirovan de.

Li gor vê yekê, pêkanîna ewlehiya mirovî, rêbazekî girîng e ji bo têkbirina propogendaya Daişê. Ev yek dikeve ser milê civaka navneteweyî, Rêveberiya Xweser û payebilindên civakên xwecihî. Ev yek bi destpêşxeriyên tekane û yekalî pêk nayê. Çareseriya siyasî û dadmend a aloziya Sûriyê, jinûveavakirina wê, pêkanîna rêgezên demokrasiyê di birêvebirina welat de û vebûna li ser welatên derve dûrî tewereyên nakokiyê yên navneteweyî û herêmê, dê baweriya leşkerkirinê ya daişî weke diyardeyeke dîstobiyayê bi awayekî eşkere bide diyarkirin.

Ji aliyekî din ve, baş xuya ye ku hevbandorkirin di navbera biradîgmaya neteweya demokratîk û babeta xwepêkanînê ya dûrî îdyolojîka Daişê de heye.

Dibe ku pêkanîna vê yek ji aiyê piratîkî ve bi awayekî rasterast zehmet be û dibe ku sal jê re bivin heya ku baş were pêkanîn. Ji ber wê jî heke em bixwazin bigihêjin çareseriyên lezgîn, gerek e em hejmarek bergirî pêk bînin. Ev bergirî bi taybetmendiyên baweriya leşkerkirinê ya Daiş û faktorên xweyîtî û bêalî yên tê de aktîv re heye. Baştirîn bergirî jî, pêkanîna stratejîka xweparastinê ji hêla mirov û civakê û rêveberiya wan a xweser ve li hember hizirên tundrew. Ew jî bi rêya girtina rê li hember şantaja mejiyên ku meyla wan bi ser de ye û mejiyên ku pêrew. Ew jî bi rêya girtina rê li hember faktorên ku dihêlin mirov bi propogendaya leşkerkirina Daişê bandor bibe. ev yek pêk tê dema nasnameya niştumanî were xurtkirin, şerê gotara kînê were kirin, pirsgirêka xizaniyê were çareserkirin û hişê zanistî were geşepêdan.

Bi awayekî giştî hejmarek nerîn hene, mirov dikare weke bergirî li hember baweriya leşkerkirinê ya daişî xwe bispêre wan; ên herî girîng ji wan ev in:

1. Pêkanîna ewlehiya mirovî bi hemû rehendên wê, dikare rê li ber belavbûna tundrewiyê di nav mirov û civakên xwecihî de bigire; bi taybet di biwarên guhdana tenduristî û civakî (her wekî peydakirina derman, cihê niştebûnê, kar, alîkarî, kehrebe, av…). Ji aliyekî din ve kêmkirina bêkariyê û handan veberhênanên kesayetî, dê bihêle mirov ji propogendaya rêxistinê xwe dûr bixe û dê alîkariyê di pêkanîna ewlehiya mirovî de bike; ew jî bi rêya xwespartina li gotina ``sermayedariya zana``. Ev gotin di analîza aborî de berbelav e, mebest jê ew e ku xwediyên pereyan her bi rêya çalakiyên cûr bi cûr hewil didin pereyên xwe zêde bikin, lê ya herî girîng li ba wan parastina sermayedaariya wan e da ku rastî bêperetiyê neyên. Ji ber wê jî her ku mirov hay ji pereyên xwe di jîngeheke biewleh de hebe, ew qasî ew bi jîngehên derdorê re biewleh e.

2. Şikandina siyaseta tirsandinê pêk tê dema pêşketina erênî di têkiliyên civakî de di navbera civakên herêmê de çêbe. Ew jî bi rêya xurtkirina rêgezên demokrasiyê û derxistina zagonên ku kîna tundrew qedexe dikin (çi ev kîn bi rêya nerîn, îdyolojîkên tund ên neteweyî, olî, zansitperestî bin), nexasim dema ev kîn ziyanên şênber û razber bigihîne xwediyê xwe (çi niha be çi piştre be). Hin ji şêweyên wê kînê wisa ne: tinazî, guhertina rastiyan, rexneyên dijwar, sixêfkirin, biçûkirin, ziyangihandin, xerabkirin, belaxwetêdan, şîroveyên çewt ên bizanebûn, heramkirina danûstandina

darayî, heramkirina pêwendiyên civakî û ji bilî van reftaran ku rêzê ji taybetmendiyên baweriyên din re nagirin û kîn û tolhildanê belav dikin. Dema mirov xwe dûrî van tiştan bike, dê baweriya leşkerkirina daişî nikaribe bi aqil û hestên mirovan bilîze û dê nikaribe wan bi ser xwe de bikişîne û dê sedemên bindestiyê li gor îdylojiya Daişê şîrove neke.

3. Bêalîbûn û zelalbûn di birêveberiya desthilatê de û qirkirina gendeliyê û pêwendiya erênî û domdar û pevguhertina nerînan di navbera hikûmet û payebilindên niştumanî (ên civakî, siyasî, mafnasî, çandî û aborî) bi rêya navgînên ragihandinê yên xwecihî yên cûr bi cûr, dê rehetiyê li ba piraniya gel peyda bike û dê bi awayekî berpirisiyar rewşa heyî bipejirînin. Ev yek jî dê çavdêriya ewlekarî ji hêla civakê ve li hember hewildanên ku dixwazin civakê ji nirxên wê yên sincî û çandî dûr bixin, xurt bike.

4. Agahdarkirin û peydakirina sedemên ku rê li ber nebaş û bikaranîna hişbiran digirin û peydakirina alîkariyê ji bo kesên dixwazin bizewicin û cihêkirina keberê û cihên weke wê ji civakê, dê rê li ber belavbûna nebaşiyê di nav civakê de bigire û heya astekê nirxên wî yên sincî biparêze. Bi vî awayî rêxistinên tundrew ên ku li pişt perdeya parastina nirxên sincî de dixebitin, dê balêşiya xwe ji dest bidin.

5. Pêwîst e babeta nepejirandina endamên ku berê danûstandin bi Daişê re dikirin û paşê dev jê berdan, wer çareserkirin. Ji aliyekî din ve û ji ber ku şerîetên olî bi zêdeyî awayekî tên şîrovekirin, nabe mirov tevahî bawermendên wê baweriyê sûcdar bibîne û wê baweriyê sûcdar bibîne; çimkî ev helwest di gelek aliyên xwe de mirov ber bi çanda kînê ve dibe. ya baş ew e ku diyalog û danûstandina erênî û rêzgirin hebe da ku hestên tundiyê weke bertek gur dikin, werin dûrxistin. Lê di heman demê de gerek e tundiya di bin sîwana zagonê de birêxistinkirî, li hember reftarên tundrew û dijminane were bikaranîn. Her wiha gerek e kesên tev li kiryarên tundrew bûne, werin perwerdekirin û hêzên giyanî û derûnî yên ku wan li ser tundiya korane han din, werin lawazkirin. Ew jî bi rêya pêşkêşkirina hin babetên olî yên berovajî nerînên wan ji hêla oldarên navînî ve.

6. Mirov bi xwezaya xwe her çiqasî rastî şikestina şênberî werin jî şikestina raberî napejirînin. Ji ber wê jî siyasetên xeniqandina olê û hewildanên têkbirina wê, bê sûd in. berovajî wê, ev yek dihêle ew ol xurttir

bibe û berê wê dide tundiyê, bi taybet ji ber ku ew di çanda civakî ya herêmê de ji herzarên salan ve kokdar e. Di vê derbarê de ramanger Ebdela Ocelan wisa dibêje: ``Hizirîna ku dogmaî, ol û sêwirandin dê ji hebûnê were tunekirin, ne tiştekî pêkan e. Ev yek bi xwezaya mirov re heye. Xwezaya mirov neçare e beşekê li gor pêdiviyê ji bo xeyal, dogmayî û babetên olî yên ku ew wan weke nirxên pîroz dibîne, bihêle. Her wiha sinc û tiştên razberî jî. Li vir em ê behsa tiştên razberî bikin. bêyî van tiştên razberî, ne pêkan e jiyana mirov ji zehmetî û arîşeyan vala bibe û bi wan jiyana wî durist û rast dibe…dibe ku sedema hilweşîna komînîsta damezirandî, bikaranîna babeta olê û tiştên razberî bi awayekî ne durist… bikaranîna şênberiya tundrew an jî giyaniya tundrew, dê rewşine aloz biafirîne…`` Ji ber wê jî dema hikûmet û payebilinên niştumanî olê weke şoreşeke civakî li hember zordarî û efsûneyan û weke mîrateke çandî ya sedê salan bibînin, dibe ku ev yek aliyê sincî û aştiyê di baweriyên giyanî de xurt bike û rêz ji sînorên demê yên mijar û şîroveyên şerîetê re were girtin; çimkî ev sînorên demê handana ramanên olî yên navînî dide û rê li ber hewildanên tundrewan digire. Di encamê de parastina azadiya baweriyê di çarçoeya nirxên sincî de û nepejirandina çanda kînê, bi gelekî ji sepandin an jî çewsandina bawerî yan îdylojiyê çêtir e. Çimkî tundî ji bilî tundiyê (weke bertek) tu tiştên din nayîne.

7. Bi dehan malbatên muhafiz û yên ku ji aliyê olî ve tundrew hene, lê eger handanek bi rêya fetwayê tune be, ew berê xwe nadin tundiyê. Ji ber wê jî saziyên olî yên civakî berpirs in ku ew bi roleke ronakbîrî û agahdarkirinê rabin da ku rê li ber terorê bigirin û wê qir bikin. Ew jî bi rêya diyarkirin û eşkerekirina rêbazên terorê yên gotarî yên ku dixwazin çîna ciwanan ji rê bibin û bikin leşkerên xwe. Daiş vê yekê bi rêya gotara siyasî û olî ya ku bi kirasê şerîeta islamê nixumandî, pêk tîne. Ew enerjiya xwe ji şîroveyên çewt, nedurist û jirêderketî yên girêdayî ola islamî digire. Weke mînak Daiş xwe dispêre destûreke fiqhî ku dibêje ``gerek e rê li ber rêyên gunehan were girtin``. Ev destûr dibêje, her tişa mirov ber bi heramiyê ve dibe, heram e. li gor vê destûrê Pêxember nehişt mizgeft li ser goran werin avakirin da ku di pêşerojê de ew gor neyên pîrozkirin û perestin. Daiş jî bi behaneya ``teterusê`` (xweparastina bi welatiyên dijmin/çi dîl bin çi ne dîl bin) ya ku ji hêla fermandar û zagonsazên rêxistinên cîhadîst ve tê derxistin, rê dide endamên xwe ku xelkê bi teqîn û kuştinên komî bi rêya pêlêkirin, kuştina bi guleyan, şewtandin, jehirkirin û hwd ji nav bibin tevî ku kesên bêguneh jî

hene. Lê di rastiyê de fetwaya teterusê tenê girêdayî artêşên ku şerê hev dikin. Dema kesên tundrew xwe dispêrin fetwaya teterusê, ev yek jiyana tevahî endamên civakê bi hemû çîn, temen, bawerî, nasname û etnîkî dixe metirsiyê. Çimkî li gor Daişê ew tev dijminine pêkan in. JI ber wê dema rastiya van şîroveyên olî yên ku mirovan ji rê derdixin, were nasîn, dê hemû endamên civakê rahêjin berpirsiyariya rawestîne li hember van şîroveyan û dê bi saziyên ewlekarî yên niştumanî re bibin alîkar da ku rê li ber wan bigirin. Ya ku pişta vê yekê bêtir digire, şîroveya bêalî ya fetwaya ``red el-sail`` (wateya wê wisa ye: dema kesek bê sedem êrşî kesekî bike û mal û mulkê wî dagir bike, ji mafê kesê din e ku şerê wî bike û mafên xwe jê bistîne ) û ji bilî van fetweyan. Gerek e ev fetwe bi awayekî rast û durist werin şîrovekirin da ku rê li ber veberhênana wan ji hêla tundrewan ve were girtin û ev tundrew wan fetweyan li gor ejindeyên xwe şîrove nekin û bi rêya wan cîhada xwe ya tund rewa nekin. Her wiha gelek mijarên fiqhî yên din jî hene, her wekî gawerikirinê û ji bilî wê

8. Asta zanistê li gel pirbûna hilberînê, nîşane û pîvaneke cîhanî ya pêşketina civakan e. rastiyek heye gerek e di serê pêrewên baweriyên giyanî de were çandin, ew jî wisa ye: Pirtûkên esîmanî pîramîd endezyar nekirin, bendav, avahî…çênekirin û rokêt, kumîtur, derman û derzî ….bi pêş nexistin. Ew pirtûk tenê weke destûr ji bo şoreşên civakî yên di rewş û demine diyar de bûn. Ya ku hiştiye ew pirtûk ji hezarên salan ve bimînin ew e ku ev pirtûk di hin aliyên xwe de nirxên sincî dihewînin û pêdiviyên giyanî yên mirovan têr dikin û mirov di rewşên zehmet û bêhêviyê de xwe li wan digire. Ev pirtûk bûne beşekî bibandor ên çanda civakî. Gerek e ew weke çavkaniyekê ji bo kuştin û binpêkirina kesên din neyên bikaranîn. Ji ber wê jî çawa ku gerek e ol ji siyasetê were cihêkirin, gerek e ew ji zanistan jî were cihêkirin. Çimkî ol xwedî zanistên xwe yên taybet e. Jixwe dema rewş zehmet dibin û êdî mirov nema dikare li hember wan raweste, pêwîstiya wî bi tiştên giyanî derdikeve pêş. Ji ber wê jî handana lêkolîna zanistî û afirandinê, naskrina çandên din, damezirandina sazî û dezgehên lêkolînê, avakirina zanîngeh, peymangeh, dibistan û navendên lêkolîn û teqîgehan û derxistina zagonên ku pişta afirandin û pêşketinê digirin, dê mejiyên hizirîner dûrî rêya tundrewiyê bike û dê pêşbaziya li ser serkeftin, pêşketin, çareserkirina arîşeyan û kûrbûna di vedîtinan de bibe ji tiştên pîroz ên ku rêgeza ``karê ji bo xêra giştî`` were xurtkirin.

9. Gerek e hemû çalakiynê ragihandinê ynê girêdayî rêxistinê û tişta bi navê ``malzaroka pîşeyî ya tundrewiyê`` werin şopandin (çi dibistanên taybet, çi yanegeh, çi komelgeh, çi perestgeh, çi xelek, çi peymangeh, çi kampe û çi enternet be). Her wiha gerek e agahiyên nerast û yên ku mirovan ji rê derdixin ku ber bi welatan ve tên hinartin û bi rêya derew û propogendayan ji nav weşanên eleketronîk, kaxezî û dengî yan jî bi rêya kesan tên derxistin, werin şopandin û analîzkirin û bergiriyên pêwîst ji bo xweparastina ji wan werin stadin. Ew jî bi rêya weşanên analîzî yan jî giliyên agahdarkirinê yên kurt yan jî daxuyaniyên nerazîbûnê yan jî daxuyaniyên zelalkirinê yên fermî yan ji bi rêya hevdîtinên ragihandinê. Ew jî bi rêya hevrêziya bi saziyên ragihandin û weşanê, navendên lêkolînan, zanîngeh, meclisên giyanî (olî), yekîtiyên pîşeyî û aborî, meclisên gelêrî, dezgehên çavdêriyên yên cihêreng û saziyên girêdayî babetên ewleariyê. Bi vî awayî têgihiştina siyasî û ewlehî ya gelêrî pêk tê û ejindeyên dijminatiyê tên nasîn û bi awayekî piratîkî li hember hewildanên gurkirina kînan di navbera civakên herêmê de xurt dibe.

**Dawî**

Daiş serwextî çareseriyên ku pêdiviya civakên xwecihî bi wan heye, nebû û bi rêbazê şivan bi kerî re danûstandin bi wan re kir. Daiş bû sedema gelek bobelatan bi ser niştecihên herêmê de û pêşeroja nifşê zarokan hilweşand. Ew nebû hêzeke aştî û pêşketinê û nebû sîwaneke ewlehiyê ji bo endamên xwe. Daiş li Sûrî û Iraqê ji hev ket, çimkî wê nikarîbûçandên xwecihî yên resen ên kurd, ereb û siryanan binpê bike û nikarîbû hembêzên gelêrî ji xwe biafirîne ku ew faktora sereke ya biserketina her rêxistinê ye. Dema baweriya şer a civakên xwecihî di bin sîwana HSDê de bû yek, desthilata wî hilweşiya. Daiş piştî bikeftina xwe hewil dide careke din xwe bi rêxistin bike û torekê ji şaneyên veşartî çêke da ku bi kiryarên tolhildanê rabe û baweriya xwe ya leşkerkirinê bidomîne. Lê serkeftina Hêzên Ewlekariya Hundirîn û HSDê ya girtina bi dehan endamên wê, nekarîna rêxistinê ku ew bi hin pêngavên berbiçav ên ku desteseriya wî ya meydanî vedigerînin, rabe û kuştina hevpeymanê wê (rêjîma tirkî) ji pêşewayê rêxistinê (Bavê Heseê Qureşî) re li Cindirêsa dagirkirî û çalakbûna şaxên wê li Aferîka û Efxansitanê û di heman demê de bûna Desteya Tehrîr el-Şam (Cebhetinesre berê) hêza cîhadîst a selefî ya sereke li Sûriyê û nepejirandina wê ji çalakiyên Daişê li herêmên

desteseriya xwe, radestbûna endamên wê ji pêngava sererastkirina rêjîma Sûriyê re…ev tişt tev nîşaneyên  bihêz in ku êdî rêxistinê karîna xwe ya komkirina hêzên xwe û leşkerkirina endamên nû li Sûrî û Iraqê ji dest daye. Rêxistinê karîbû bi rêya xwesipartina li baweriya leşkerkirinê ya ku li ser derew, teror û efsûneyan ava bûye, heya astekê hin sûdê wergire, lê siyaseta wê bê stratejîk bû; çimkî ew nikare girêdana endaman bi xwe ve bidomîne bi rêya xwesipartina li hêvîdan û zordariyê. Her wiha şerê Daiş ê li hember cîhanê ji ber ku cîhan tev ne li gor îdyolojîka wî ye, mîna yê ku avê bêjing dike ye.

Dema mirov li gelek pirtûkên ku babetên şerîetê girtine dest, bigere (di nav de yên nêzî hizirê daişî), em ê bibînin ku nakokî di navbera baweriya leşkerkirinê ya daişî û gelek hedîs û ayetan de heye. Weke mînak propogendaya rêxistinê ya ku tê de xwe weke misilman dide diyarkirin û xwe weke koma ku hatiye milet rizgar bike dide diyarkirin, dikeve çarçoveya têgeha ``riyaê`` (xweqenckirina li pêş çavên xelkê da ku milet bibêje ev kes qenc e yan jî bi rêya wê dixwaze xelkê ne Yezdan razî bike).  Ji vê yekê re şirka biçûk (gawiriya biçûk) tê gotin. propogendaya Daişê riya bi xwe ye (Pêxember gotiye tişta herî zêde ya ku ez li ser we jê ditirsim, şirka biçûk e. sehabiyan gotiye: şirka biçûk çi ye? Wî gotiye: Riya e). Dema Daiş wîsayeta xwe ya olî li ser misilmanan disepîne, ew xwe weke navbeynkar di navbera Yezdan û evdên wî de dihesibîne. Ev yek jî mirov ji islamê derdixe û dihêle Daiş bibe weke pêşbînkar (kahîn) kevin. Lêkolerek wisa dibêje: ``Kahînan ol neafirandiye lê wan ew ji bo mebestên xwe bi kar aniye mîna siyasetmedarê ku xwestekên zikmakî, adet…yên mirovan bi kar tîne…``

Dema Daiş xwe dike wesiyê mejiyan, ev yek weke dagirkirina wan mejiyan e. Jixwe ev yek ji hêla piraniya rêxistinên siyasî-olî yên islmaî, xiristiyanî, cihûyî, hindosî û hwd ve tê bikaranîn. Dibe ku ev yek sedema zêdebûna rêxistinên islamî yên tundrew ên nakokdar be. Li vir baş e ku mirov nerîna xelîfeyê misilmanan ê çarem (Elî Ibin Talib) bîne ziman ku ev nerîn di pirtûka Nehc el-Belaxe de hatiye: ``Mijarek ji kesekî re tê da ku hukmê xwe tê de bide, radibe li gor nerîna xwe hukm dide, paşê heman mijar ji bo kesekî din tê, radibe berovajî wî hukmî dide. Paşê qazî tev li ba îmamê xwe yê ku ev hukm ji wan xwestibû kom dibin û nerînên wan rast dike…tevî ku xwedayê wan yek e, pirtûka wan yeke û pêxemberê wan ye. Gelo Xwedê emrê

cudahiyê li wan kiriye, loma wan biya wî kiriye, yan ew li ser wan qedexe kiriye, rabşûne bêemriya wî kirine, yan Xwedan oleke kêm daxistiye û xwe sipartiye wan da ku temam bikin an jî ew şerîkên wî bûn û gerek e ew biya wan bike, yan xwedê oleke tam daxistiye û Pêxember xweşik negihandiye û pêk neaniye?! Mane Yezdan dibêje: `` Me tu tişt di pirtûkê de ji bîr nekiriye`` û gotiye: ``Tê de diyarkirina her tiştî heye`` û gotiye ku pirtûka pîroz hev temam dike û piştrast dike û tu cudahî tê de tune ye: Eger ji ba kesekî din ji bilî Xwedê bûya, dê gelek guhertin tê de hebûya`` û daye diyarkirin ku Quran ji derve ve lewend e û ji hundir ve kûr e, ecêbên wî bi dawî nabin, û kêm nabin û tarîtî ne pê be bi ronî nabe…`` Rêxistinên tundrew wateya cîhadê ji rê derxistine û ew di çarçoveya tundiyê de hiştine û ji bo armancên xwe bi kar anîne. Piraniya ayetan handana mirov dikin da ku bide ser rêya şerîetê û di çarçoveya komê de perestinê bike; ne mirov beşdarî komên xwedî projeyên siyasî yên desteser bibe. Vê jî  hişt misilman li ser çend partî û koman werin dabeşkirin û her yek li gor mejî û armancên xwe olê şîrove bike. Têgeha komê ya ku di Quran û sinetê de tê, handana mirovan li ser kirina xêr û perestinê bi gotin û şîreta xweş dike, ne bi kuştin û tirsandinê. Civakên herêmê ji propogendayên daişî, tirkî û basî bê zar bûne û êdî li dabînkirina rûmeta xwe di vê rewşa buhabûn, dorpêçî û gefên tirkî, daişî û îranî yên li dijî herêmê digerin. Êdî ew nema şer û tundiyê dixwazin  û ew li Rêveberiya Xweser û HSDê weke beşeke sereke ji xwe dibînin, çimkî  ew saziyên herî zêde xelkên herêmê dihewîne û ziyana dê bigihêje wan, dê bigihêje civakê jî. Bê guman çareserkirina rewşên ku hişt tundî li herêmê peyda bibe, rêya herî baş e ji bo ku em ji Daişê rizgar bibin.

------------------------------------------------------------------

## Lîsteyek bi jêder û çavkaniyan:

**Pirtûkên ku handana hizirê cîhadîst dikin:**

*1. Mihemed kurê Zeydê Mihacir, Şerê Ragihandinê li ser misilmanan, weşanger: Tevgera Islahê/Komîteya Leşkerî, bê hejmar û dîroka weşanê.*

*2. Hesen Mihemed Qaid (Bavê Yehyayê Lîbî), Koma peyam û perensîbên valabûyî, çapa yekem 2010, weşanger: Payebilindiya Ragihandina Cîhadîst? Tevgera Islahê-Komîteya şerîetê.*

*3. Ebdela Xalid el-Edem (Bavê Ubeyde), Pilêtên Merd ji bo Xelkên Cîhadê, Etiyelahê Lîbî lê vegeriyaye û lê zêde kiriye. Weşanger: Tevgera Islah-Komîteya şerîetê, Navenda Fecir a ragihandinê, bê hejmara çap û dîrokê.*
*4. Bavê Yehya (Hesen Qaid), Teterus di cîhada hemdem de, dîroka weşanê 6ê zî elhice 1426, bê weşan û hejmara çapê.*
*5. Silêman Nasir kurê Ebdela Elwan, Diyarkirina şîroveya kêmasiyên islamê ya îmamê nûjenker şêxê islamê Mihemed kurê Ebdilwehab, çapa şeşem, bê dîroka weşanê, weşnager: Tevgera Islahê-komîteya şerîetê.*

Pirtûkên ku li hember ramanên tundrew nîqaşê dikin:

*6. Kerîm kurê Mihemed kurê Hesen, Bîranînek di lêkolîna ictîhadê de (pênaseya wê, cidahiya di navbera wê û qiyasê de, cûre û beşên wê, biwarê wê û mercên wê). Weşanger: Malpera Multeqa ya fiqhî.*
*7. Mihemed Silêman bavê Reman, nepeniya kêşweriyê: Daiş, propogenda û leşkerkirin, weşanger: Saziya Firêdirêş Êrbrit – Uman 2016.*
*8. Dr. Ferec Fode, Teror, bê hejmara weşanê, weşanger: Desteya misrî ya giştî ya pirtûkan 1992.*
*9. Lînî, Dayfis, Cêferî Martînî, Kîm Kiracîn, Stratejîka qirkirina dewleta islamî li Iraq û Şamê, (ISIL), weşanger: Navenda RAND a lêkolînan 2017.*
*10.Cêms Conz, çima ol ber bi tundiyê ve diçe? (terora olî li gor analîza derûnî), wergêr: Ibrahîm Cerkes 2012, bê hejmara weşan û çapê.*
*11.Wîlyam Marsîlîno, Mîcan L. Simês, Kirisofir Bol, Lorîn Sekrabala, şopandina malperên civakî, weşanger: Navenda RAND a lêkolînan, Kalîforniya 2017.*
*12.El- Şerîf el-Redî, Îmam Mihemed Ebde, Nehic el-Belaxe, çapa yekem 1990, weşnager: Saziya Mearif a çap û weşanê/Beyrût.*
*13.Dr. MIhemed Xelîl Heras, Tevgera wehabî (weke bersiv li hember gotara Dr. Mihenedê Behî ya di rexneya wehabiyê de) Weşanxaneya el-Katib el-Erebî, bê hejmara çapê û dîroka weşanê.*

**Pirtûkên ku mijarên ramanî yên cûr bi cûr gotûbêj dikin:**

*14.Ebdela Ocelan, Manîfîstoya Şaristaniya Demokratîk, pergîna pêncem, Doza kurdî û çareseriya neteweya demokratîk, wergêr: Zaxo Şiyar, çapa duyem 2014, bê weşanger.*
*15.Ebdela Ocelan, Rijdbûna li ser sosyalîzmê, rojdbûna li ser jiyanê ye. çapa yekem 2003, weşanên Yekîtiya Ronakbîriya demokratîk, çapxaneya Azadî, pirtûk di nav rêza pirtûên erebî de hejmar 20 e.*
*16.Nizar Yûsif, el-Wîsaye el-Fikriye, çapa yekem 2008, bê weşanger.*
*17.Dr. Kamil Casim el-Mirayatî, têgihiştina zanistî û geşepêdana pêşerojî, weşanger: Kovara Adab el-Besre, hejmar 46, sal 2008*
*18.Adil Mistefa, Şaşîtiyên mentiqî, hin beş ji mentiqa ne sêwirandî, weşanger: Saziya Hindawî-Windorson, Birîtanya, 2019, bê hejmara çapê.*

*19.TezfîtanTodorof, Tirsa ji Berberiyan, Tişta piştî levketina şaristaniyan, wergêr: Dr. Can Macid Cebûr, Desteya Ebû Zebî a Çand û kultûrê, çapa yekem 2009.*
*20.Dr. Raid Sabir Lefte, Stratejîkên veguhestina ber bi civaka zanistê ve, Kovara zanîngeha Tekrîtê ya zanistên zagonî û siyasî, pergîna 4, sala 4, hejmara 13*

**Malperên eleketronîk:**

*21.SDF Press Center, rapora salane ya binpêkirinên êrîşên tirkî û çeteyên Daişê li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, dîroka weşanê: 28. 12. 2022.*
*22.Şadî Ebdilwehab, Bijarteya bêdeng, Bikaranîna pêngavên komployî di birêvebirina bandorbûnên navneteweyî, weşanger: El-Musteqbel a lêkolînên pêşwext.*
*23.Eliksender Rêtizman, Propogendaya tundrew û gihaştina li mejiyên mirovan, weşanger: Malpera European Eye on Radicalization, dîroka weşanê, 22. 3. 2018.*
*24.Mazin Xalid, Avakirina avahîsazî ya rêxistina leşkerî ya Daişê, weşanger: Navenda Ewropî ya lêkolînên qirkirina teror û saloxgeriyê, dîroka weşanê 14. 1. 2018.*
*25.Meşarî el-Zayidî, Malpera Rojnameya El-Şerq el-Ewset, Têgeha Teterusê ji Ibin Teymiye û mengoliyan heya el-Dar el-Beyda û Riyadê, dîroka weşanê 8ê tebaxa 2003, hejmar 9019.*
*26.Ferhenga fereh a zanistê.*

# Tundrewîya şîîtîyê

**(1 ji 2)**

- **Pêşgotin:**

Pirê caran di navbera peyrewên tîreyekê (mezheb) û endamên rêxistinên xwedî şêweyekî tîreyî de, tevlîhevî çêdibe, êdî li gor wê jî kîna bawerîya ku rêxistinekê xwe pê sepandiye li ser civaka ku xwe bi wê bawerîyê disepînin, tê gelemperkirin. Êdî kînên tîreyî bi helwestên dijxebata vê rêxistinê re tev li hev dibin ku bi xwe re kîn û dijminatîyekê derdixe holê û di encamê de vediguhere şerekî li beramberî şerekî. Êdî hestên neyînî li ser hev kom dibin, ta digihêje asta ku alîyê din dibe tebayekî ku jiyan pê re nabe. Ev yek dibe sedema ku hestên mirovahî û nirxên sincî pûç bibin û di dema lîstina bi termên qurbanîyan de, dilovanî namîne. Ev jî pirsgirêkeke rastîn e ku bûye derdê piranîya civakên Rojhilata Navîn, êdî destwerdana demografîk a di vê deverê de hiştiye ku avakirina dewleteke neteweyî yan jî tîreyî bibe karîgera sereke ya berdewamkirina alozîyên cûda. Her wiha rastîya kevneperest a piranîya civakên xwecih dihêle ku ta astekê ji rêgezên demokrasîyê re girtî be, êdî ev yek dihêle ku ji destêrwerdana îdolojîyên tundrew ên neteweyî, olî û tîreyî re bibe armanc.

Dahûrandina dîyardeya rêxistinên tundrew ên ku hewl didin desthilatdarîyekê bi rêya keysbazkirina tîreya ku civakek wê weke beşeke sereke ya çanda xwe dibîne, pêk bînin; mijareke herî rast a çavdêrîkirin, dahûrandin û çarekirina alozîya dijbertîya tîreyî ye. Ev yek bi rêya jevcûdakirina rêjeyî ya di navbera tîre weke çanda civakê û tîre weke îdolojîya desthilatdarîyê, pêk tê. Lê belê ev nayê wateya ku em bawerîya tîreyî di her du beşan de erê nakin; çi ku ji sedên salan ve di pêkanîna bawerîya şer a li ser rêgeza xweparastinê li cem peyrewên wê, hêmaneke girîng e. Lê belê ya girîng şîrovekirina veguhertina tîreyê ji çanda civakî ber bi îdolojîyeke ve siyasî ye; ku bi xwe re ziyaneke mezin tîne û vediguhere emrazeke desthilatdarîyê. Ev lêkolîn jî vê hewldanê dike ku bi rêya ravekirin û dahûrandina alîyekî tevgera tundrew a şîî li Rojhilata Navîn a ku tijî rêxistinên bawerî yên cihêreng e û di vê alozîya li herêmê de şerê hev dikin,

vê yekê bîne zimên. Ji bo ku ev babet bi awayekî rêjeyî pêk were, em ê bandora tevgera siyasî ya şîî di pirsgirêka Islama siyasî de, hem ji dema kev û hem jî ya niha de binirxînin. Her wiha dahûrandinekê li ser rêbaza şoreşgerî û ya xapînok di stratejîya wê de, pêşkêş bikin.

- **Di Siyaseta Herêmî De Tundrewîya Nijadperestî:**

Tundrewîya olî bi rêya çêkirina bend û sînorên giyanî, vederîyeke çandî ya dûrî çanda derdor ku nahêle çalak be, dide avakirin. Komika tundrew nasnameya endamê xwe bi nasnameya xwe vediguherîne û wî dike navgîneke parastina hebûna xwe ya bi wê bawerîyê ve girêdayî. Fetisîna tundrewîyê di bawerîyekê de, rê dide rahibên wê yên pêşbaz ku li henaseyeke din bigerin; vê yekê jî di tîre û dubendîyên wê de dibînin. Rewşa ku tevgerên islamî bi her du birên xwe yên sinî û şîî tê de derbas dibin, ev bi xwe ye. Li gor wê jî em bala xwe bidinê ku bi awayekî rêjeyî di her alozîyê de, rêxistinin nû derdikevin.

Bawerîya siyasî û leşkerî ya tevgera tundrew a şîî di dîroka me ya hemdem de, li dû hewlên tundrewan ên ji bo hişdarkirina bawerîyên[1] xwe, dimeşe. Her wiha di dubendîyên tîreyî yên tundrew û tevlîhevkirina zanistên posîtîv bi zanistên olî re, ji bo kûrkirina bawerîya peyrewên wê û kişandina hin peyrewin nû û ji bo ku weke alaveke handana bawerîya şer bi awayekî dijminane li cem wan bi kar bînin, baştirîn bijarde dibînin. Heman tişt li cem tevgerên tundrew ên sinî jî derbasdar e; lewre em şerekî tîreyî[2] bi her awayî li Iraq, Sûrî, Libnan, Yemen û Behreynê dibînin û ev yek di ser hemû bûyerên siyasî û leşkerî yên li Rojhilata Navîn re berz dibe. Ev rastîyek e û em nikarin çavên xwe jê dagerînin. Tundrewîya dijber a di navbera sina û şîa de, herî zêde di dema bilindbûn û hilweşîna dramatîk a dewleta rêxistina DAIŞ'ê de (2014 - 2019 z) geş bû. Her wiha li ser mijara normalîzekirina têkilîyan bi dewleta Israîlê re ya di çarçoveya ku jê re dibêjin "Girêbesta Sedsalê" ya ji bo çareserkirina şerê israîlî-filestînî û peymana Ibrahîmî ya di navbera hin dewletên erebî û Israîlê de, di navbera dewletên erebî de nakokî pir bûn. Ev yek bi awayekî xapînok, bi rêya pêkolîya ku Israîl û hevalbendên xwe bi

---

[1] An ku sazkirina zagonên xwe bi awayekî ku li gor hişê mirovan be.

[2] ji bo ku bêtir li ser vê dahurandina der barê vê babetê de binasin, divê li vê vegerin: Jefry Martini û yên din; siberoja têkilîyên nijadperest li Rojhilata Navîn; Weşan: Sazîya RAND'ê ya siyasetên saloxgêrî; sala weşanê: 2017z. her wiha dikarin li ser vê linkê ji bixwînin: https://www.rand.org/content/dam/rand/pubs/perspectives/PE200/PE242/RAND_PE242z1.arabic.pdf

mislimanan re di nava şer de ne û çi kesê ku destekê dide wan ew jî li kêleka wan di nava şer de ye, di propagandayên islamî yên tunrew de (sinî û şîî) hat bikaranîn.

Germbûna vê rageşîya tîreyî bi rêya serkêşîya Erebistana Siûdî bo hevbendîya erebî ya li dij rêxistinên şîî yên ku xwe bi îdolojîya "Wilateya Feqe" girtine, tê xuyakirin. Serokê tirk Erdogan jî di axaftineke xwe ya propagandayî ya nîsana 2017'an li ser kenala El-Cezîrê ya qeterî hat weşandin de, li ser vê mijarê got ku[3]: "Îran siyaseta belavbûn û berfirehbûnê ya farisî dimeşîne û êdî ev me diêşîne; mînak li Iraqê, Heşd El-Şeibî kî ne û kî destekê dide wan? Parlementoya Iraqê alîgirîya Heşd El-Şeibî dike, lê ew rêxistineke terorîst e û divê were dîtin bê kî li dû wê ye…" Her wiha di gelek boneyan de hin berpirsên iraqî û fermandarên Heşd El-Şeibî pesnê alîkarîya leşkerî, saloxgêrî û lojistîkî ya ku Îran pêşkêşî Heşd El-Şeibî dike[4], didin. Tişta ku hatî zimên, amajeyê bi alozîyeke bawermendî ku di civakên islamî yên cihêreng de ye, dike. Dibe ku ev yek bûbe sedem ku dihêle rêxistinên şîî yên çekdar nikaribin an jî naxwazin ku hevbendîya di navbera xwe de xirab bikin; ew jî ji ber sedemên girêdayî dîroka hevpar, dijminê hevpar û çarenûsa hevpar û girêdayî hestên berpirsiyarîyê yên ji bo pêşkêşkirina destek û alîkarîyê bo tevaya şîîyan -biratîya bawerîyê- li seranserî cîhanê ye. Encam jî ew e ku li welatan, nasnameya tîreyî ji nasnameya niştimanî geştir bûye. Diyar e ku hewl dide di nava alozîya tundrewî ya di îdolojîyên siyasî yên li herêmê de, her tim di amadebaşîyê de; ew jî di çarçoveya siyasetên xweparastinê û xurtkirina desthilatdarîyê de.

Xurtbûna hêza rêxistinên şîî ji bo civakên sinî yên xwecihî û tevgerên zanistdarî û neteweyî yên li herêmê, dibe cihê nîgeranîyê. Mînak; di hevdîtinekê de bi hin koçberên iraqî yên sinî ku li kampa Holê ne, metirsîya xwe bo vegerandina ji herêmên ku milîsên Heşd El-Şeibî ji DAIŞ'ê rizgar kirine, anî zimên û vegera li jêr mercên nû yên li herêmê bi temamî red kir. Her wiha di desteserkirina herêmên bi hikûmeta herêma Kurdistanê re nakok û di nava

[3] El-Cezîrê; Erdogan: Em rê nedin ku parçe ji xaka Sûrîyê jê bibin; weşan: Malpera El-Cezîrê; Dîroka weşanê: 20-4-2017; lînk:
https://www.aljazeera.net/news/international/2017/4/20

[4] Dikarin yek ji van daxuyanîyan ku ya serokê desteya Heşd El-Şeibî û şêwirmendê ewlekarîya niştimanî ya Iraqê (Falih El-Feyad) e li ser malpera ajansa nûçeyan a Tesnîmê ya navdewletî li ser vê lînkê bibînin:
https://www.tasnimnews.com/ar/news/2017/08/23/1499934

wan de Kerkûk jî de ku di dema referandoma sala 2017'an de pêk hat, Heşd El-Şeibî xwedî roleke êrîşkar bû û ev yek bi daxuyanîyên nijdaperestî yên hin fermandarên wan ên li dij kurdan xurt kir[5]. Li kêleka wan jî, gelek raporên rêxistinên têkildarî mafên mirovan der barê binpêkirinên ku van milîsan pêk anîne de, derketin[6]. Hinek ji wan jî tev li lîsteya rêxistinên terorîst ên navdewletî hatin kirin; mîna Hizbullah, Asayib Ehl El-Heq, Tevgera El-Necbaa, Seraya El-Cihad û hwd… Her wiha di navbera dewletên li dij Îranê û welatên ku li wan ev rêxistin çalak in de nakokî derketin, mîna alozîya di navbera Libnanê û hin dewletên Kendavê de ku di vê babetê de bûyera herî dawîyê vekişandina piranîya dewletên Kendava Erebî bo balyozên xwe ji Libnanê bû. Ev yek jî di encama daxuyanîyên wezîrê ragihandinê yê Libnanê Corc Qerdahî yê bi Hizbullah re hevalbend e; ku li dijî dewletên erebî destekê dide Îranê, de pêk hat. Ev mijar û ji bilî wan jî amaje pê dike ku çi qasî bandora tundrewîya tîreyî li ser alozîyên civakên Rojhilata Navîn heye. Mirov dikare vê yekê weke e astengîyekê li pêşîya meşa mirov a lêgerîna ewlehîya mirovî û vedîtina rastîya xwe, pê hest bike.

- **Şîa di pirsgirêka ku bi Islama siyasî tê nasîn de:**

Weke e tê zanîn cîhana islamî dabeşî du tîreyên sereke dibe, ji her tîreyek ji wan jî bi dehan tîreyên din şax dibin û her yek ji wan jî hejmareke mezin a rêbaz û komikên xwedî nêrînên ramanî, giyanî û siyasî yên taybet şax dibe. Gava em li qonaxên dîrokî vedigerin, em dibînin ku parçebûna tîreyî weke encama şerekî siyasî dîrokî; ku kî mafdarî desthilatdarîya islamî ye, derketiye holê. Ev yek jî weke  berdewamîya qonaxin kevntir di doza mafdarîya desthilatdarîya Qureyş û Mekayê de tê dîtin; ku di navbera hevbednîya Metîbîyan a bi serkêşîya binemala Ebdilmenaf û hevbendîya El-Ehlaf a bi serkêşîya binemala Ebdi El-Dar[7] dest pê bûye. Her wiha di qonaxin jê kevntir

[5] Maykil Corcî û Ehmed Reşîd; Fermandarekî îranî hişyarîyên tund dan kurdên Iraqê da ku xwe ji Kerkûkê vekişînin; weşan: Ajansa Reuters; dîroka weşanê: 20-10-2017; lînk: https://www.reuters.com/article/iran-iraq-kurds-ea7-idARAKBN1CP2N8

[6] Ji bo ku li nimûneyeke van raporan binêrin, mînak li Iraqê, li vê vegerin: Rêxistina lêborînê ya navdewletî; Iraq; Çavgirtina ji ber çekdarkirina milîsên "Heşd El-Şeibî"; çapa yekem 2017z; weşan: Çapemendîyên rêxistina lêborînê ya navdewletî-London; lînk: https://www.amnesty.org/ar/wp-content/uploads/sites/9/2021/05/MDE1453862017ARABIC.pdf

[7] Ji bo bêtir binasin li van vegerin: Dr. Hisên Muwenes; Dîroka Qureyş; çapa yekem 1988z; weşan: Weşnxaneya Siûdîyê-Ceda.

de jî nakokîya di navbera bapîrê qureyşîyan Qusey Bin Kelab û qebîleya El-Xezah de tê xuyanîkirin. Ev yek careke din di dawîya serdema xilafeta Elî Bin Ebî Talib de derket pêş; ew jî piştî ku Meawîya û peyrewên wî xilafeta wî red kir, êdî ev yek di navbera du koman de pêk hat, komek jê dibîne ku desthilatdarî ji Haşimîyan û di pileya yekem de bo Al El-Beyt re mafekî pîroz e ku ji wan re dibêjin "Şîa", her wiha koma din xilafetê mafê her mislimanekî ji qebîleya Qureyş -nemaze binemala Ebdilmenaf Bin Qusey Bin Kelab ku Umewî û Haşimî ji wan in- ku xwe guncav dibîne û mercên xilafetê tê de peyda bin û şerîeta Islamê ji xwe re weke rêbaza hukimdarîyê dipejirîne, dibîne; êdî ev yek çi bi rêya hilbijartina wî ji alîyê piranîya serekên mislimanan yan jî bi hêzê yan bi mîrateyê desthilatê bi dest xwe bixîne, pêk tê; ew jî ji wan re jî dibêjin "Sina". Lê belê bi şerê li ser desthilatdarîyê re yê ku di navbera Ebasîyan (Sina) ku mîna Umewîyan li ser rêbaza xilafetê meşiyan û Elewîyên ku bawerî bi Imametîyê anî û ew kir malê binemala Elî Bin Ebî Talib[8] tenê û veguherîn nûnerên sereke yên Şîayê de pêk hat. Êdî ev nakokî di navbera herdu alîyan de bû xwedî şêweyekî îdolojî. Diyar e ku ev nakokî bi şerê siyasî-dîrokî re yê di navbera Xesasina yên hevalbendên Romîyan li Şamê û Menazira yên hevalbendên Sasanîyan li Iraqê de[9], bû yek. Pê re jî parêzmendîya dewletî di Islamê de ku tevgera şoreşgerî ya xwecihî, civakî, aborî, çandî û siyasî bû, geş bû. Ev şêweyê şer di dîroka me ya hemdem de jî berdewam e; em dikarin vê yekê di şerên îdolojî yên di navbera herdu şaxên partîya Beisê li Sûrî û Iraqê û Cebhet El-Nusra û DAIŞ'ê de, her wiha di navbera Selefîyan û Şîîyên Caferî û Elewî de, bibînin.

Lê belê pirbûna tîreyan jî encama pevçûna rêjeyî yan jî cûdabûna ramanî-olî ya li gel komên feqîyên mislimanên her tîreyekê, ye. Lê belê pirbûna komikan jî girêdayî xwestekên serekên olî ye û vê yekê bi şerê siyasî-dîrokî û şerê ramanî-olî ve girê didin û li gor wê jî îdolojîyên wan têne sazkirin. Her komek hewl dide ku xeta xwe, rêbaza xwe, piştre tîre û piştre jî ola xwe di nava îdolojîya xwe de bide bişaftin. Mînak; di tîreya Duwazdeh Imamî[10] ya şîî

---

Seyid El-Qimnî; Partîya El-Haşimî û damezirandina dewleta Islamî; weşan: Sazîya Hindawî CIC- Mîrnişîna Yekbûyî; bê jimara çapê.

[8] Dr. Elî El-Werdî; Wiaz El-Selatîn; çapa duyem-1995z; weşanxaneya Kovan-Londin; R247.

[9] Ji bo bêtir li ser vê binasin li jêdera borî vegerin.

[10] Tîreya Duwazdeh Îmamî wek mezintirîn tîreyên şîî ji alîyê xelkê wê ve tê nasîn. Şîa wiha dibînin ku Elî Bin Ebî Talib û yazdeh zarokên wî yên îmam ku ji hevjîna wî (fatima keça

de, alîgirên Imam Xumeynî hewl didin bi rêya stratejîya hinartina rêgezên şoreşa islamî ya îranî îdolojîya xwe li ser vê tîreyê bisepînin. Ev yek ji alîyê hin lêvegerên olî yên şîî li Iraq û Libnanê û hin tîreyên din ên şîî mîna Ismaîlî û Zîdî û hwd.. vem heyanî astekê rastî rikberîyê tên. Diyar e ku ev tîre ji bo ku xwe bike parêzvana yekem a Şîayê li seranserî cîhanê û bi rengekî ku bikare rewamendîya rêveberîya cîhanî ya şîî bi dest bixe, xebateke baş dike. Xwestekên vê komê yên avakirina hikûmeteke islamî ya cîhanî, dê rê jê re veke ku Islamê û tîre û rêbaza xwe di nava îdolojîya xwe de bihelîne. Heman tişt ji bo koma sinî jî derbasdar e; li gor wê jî nimûneya El-Qaidê çespaneke belgekirî ya li ser vê mijarê ye. Bi milyonan misliman ji ber van pevçûnan dinalin û nikarin wê derbas bikin; li gor wê jî li welatên wan mercin ku tê de hokarên ewlekarîya mirovî û ewlekarîya niştimanî peyda nabin, hatine sepandin. Dibe ku ev yek şîroveyeke rast dide mijara ku çima gelek misliman ji her du tîreyan berê xwe didin zanistdarîyê, pabendîya bi nirxên sincî yan jî koçberîyê; ku wan weke  çaresrîyeke navîn ji vê nearamîyê bo xwe dibînin. Her wiha hinek jî berê xwe didin sofîtîyê ku rengek ji aramîya derûnî û giyanî tê de peyda dikin.

Li gor hevrûkirina bi Sinayê re, Şîa herî zêde rastî çewisandin û êrîşan hatiye; çi ku ew mîna rikberîya radîkal a di dewletên islamî yên li dû hev hatine, bû. Gelek tevgerên birêxistinkirî yên ku ji bo xweparastinê weke tevgerên şoreşger ên tundrew dest pê kirin, derketin holê. Lê belê ev şiyana tundrew a xurt bilez veguherî navgîneke ji bo bicihanîna desthilatdarîyê bo serekên wê û avakirina dewletên taybet.

Bi awayekî giştî Şîa dabeşî çar komên sereke dibe, ew jî Ceferî an ku Duwazdeh Îmamî, Zîdî, Ismaîlî û Elewî ne, her wiha hin komin din jî hene, lê ya herî berbelav a destpêkê ye. Bi awayekî rêjeyî, Ceferî li Îran, Iraq, Sûrî û Kurdistanê belav dibe. Ismaîlî jî li Sûrîyê, Elewî li Sûrî, Tirkî û Kurdistanê û Zîdî jî li Yemenê berbelav in. Di navbera van koman de cûdabûnên girêdayî mijara îmamtî, lêvegera olî ya şîî ku girêdayî wê ye û asta pîrozkirina wan ji Al El-

---

pêxember Mihemed) îmamin ku bi pirtûka ezmanî ve hatine sepandin û ew lêvegera sereke ya piştî islamê piştî mirina pêxember in. navê Îmam an jî Xelîfe li wan tê kirin û divê ku ji bilî wan pey kesekî din e nemeşin; li gor bawerîya wan ew jî li ser fermana pêxember Mihemed. Li gor bawerîya wan Mihemed El-Mihdî lawê Hisên El-Eskerî ku îmamê duwazehan e, ew e yê bendewar ku ji ber çavan windayî bû û dê zemînê têr dadmendî bike.

Beyt re, hene. Ev yek dide diyarkirin bê çima şîîyan ta niha nekarîne yekîtîyeke siyasî ya hevgirtî ava bikin; ew jî ji ber cûdabûnên tîreyî ye. Li gor wê jî, Zîdî bi dû Îmam Zêd Bin Elî Zên El-Abidîn Bin El-Hisên de ne, her wiha tevaya şîîyên din jî bi dû birayê wî Îmam Mihemed El-Baqir de ne. Cewhera cûdabûnê ya di navbera zîdî û şîîyên din de ew e; ku zîdî dibînin ku îmamtî ne tenê ji bo kesekî ye, lê belê ji bo her kesê ku ji nijada Elî Bin Ebî Talib e û daxwaza wê dike ye. Ev koma şîî ya herî ji alîyê mijarên şerîetê ve nêzîkî tîreya sinî ye. Her wiha Ismaîlî jî bi dû îmam Ismaîl Bin Îmam Cefer El-Sadiq (îmamê şeşem ê Şîa) de ne û îmamtîya Mûsa El-Kazim ku tevaya şîîyan ew pejirandibû, red kir. Li gor wê navê Heftemî (Sebiî) li wan hat kirin; çi ku îmam Ismail îmamê heftem e û ji piştî wî heyanî hatine Mihdîyê Bendewar tu îmam tune ne. Êdî li cem ismaîlîyan îmam Ismaîl û li cem Diwazdeh Îmamîyan îmam Mûsa bûne îmamê heftem; vê yekê jî bi xwe re cûdabûn di navbera herdu koman de çêkir. Lê belê Elewîtîya hemdem jî bi navê “Nesîrîyê” jî tê nasîn; ew jî piştî ku peyrewîya xwe bo îmam Mihemed Bin Nesîr El-Numeyrî ragihand; ku weke  buxçika razên îmam Elî El-Hadî (îmamê dehem ê şîaya duwazdeh îmamî) û lawê wî îmam El-Hesen El-Eskerî (îmamê yazdehem) tê dîtîn, her wiha weke  xala girêdanê ya bi îmamê diwazdehem (Mihemed Bin Hesen El-Mihdî) jî tê dîtin û wiha dibînin ku ew kesê ku dê cîhana tijî xirabî û zilm bûye, tijî xêr û dadmendîyê bike, ye. Her wiha zêde-zêde îmam Elî Bin Ebî Talib pîroz dikin û bawerîya xwe bi ramana laşguhertin jî tînin û taybetîya xwe ya giyanî diparêzin, lewre rêûresmên wan ên olî hinekî nepenî û veşartî ne.

Di qada herêmî de, sê komên sereke cihê xwe yê bibandor girt; ew jî Ismaîlî, Zîdî û Duwazdeh Îmamî ne ku aniha piranîya şîîyên cîhanê ji wan in. Di warê leşkerî û siyasî de Ismaîlî yên herî çalak bûn û wan dewleta Fatimî damezirand. Her wiha ji wan jî du rêxistinên herî tundrew çêbûn; ew jî Qermetî û Heşaşî ne, ku li dijî dewleta Ebasî û tîreya Sinî şerekî îdolojî da meşandin. Di encama şerê di navbera herdu alîyan de bi hezaran qurbanî ji herdu alîyan çêbûn. Lê bi têkbirina Eyûbîyan ji dewleta Fatimî re û hatina Moxolan ber bi herêmê ve û lixweke irina piranîya tirkan bo kirasê Islama sinî, her wiha ji ber komkujîyên ku der heqê peyrewên Şîayê re, hebûna wan di qada siyasî û leşkerî de êdî nema. Lê belê bi awayekî Zîdîyan serxwebûna xwe li Yemenê û Şîa jî li Îrana Sefewî hebûna xwe parast.

Berztirîn sedemên ku hişt hêza tevgerên ku bi navên “Tevgerên Şîî” tên nasîn xurt bibe; di bingeha xwe de hezkirina wan bo “Al El-Beyt” e ku piştî kuştina Huseyn lawê Elî ku bi demê re veguherî trajedyayeke xwedî şêweyekî gelêrî û çîrokên destanî û tê de hovîtîya serkeftina stemkar û lehengîya stemxwar a bo parastina mafên xwe didin nîşan, li pêş ket. Her wiha sedemeke wê ya din jî heye; ew jî binkeftina dewleta Ebasî ya bo pêkanîna aştî, dadmendî û pêşketinê ji tevaya xelkê re bû; ku ew bi xwe weke tevgereke şoreşgerî li dijî desthilata Umewîyan derketibû pêş. Tevaya van mijaran bandora xwe li hemû kesên ku ji bêdadîya civakî bihêrs bûbûn, kir. Her wiha bû jêdera handanê ya ji hemû komikên ku xwe li ramanên olî yên tundrew digirin, re. Di vê babetê de, koma herî çalak a Ismaîlîyan bû; ku di dîrokê de bi damezirandina dewleta Qermetî, Fatimî û Heşaşî hatine nasîn. Lê belê ev kom jî ji veqetîn û nakokîyan nefilitî; ew jî ji ber mijarên girêdayî şerîetê û girêdayî peyrewîya îmamên ku di koka xwe de girêdayî Elî Bin Ebî Talib in. Mînak; Qermetîyan îmamtîya damezirênerê dewleta Fatimî Ubeydullah El-Mihdî red kir. Hesen El-Sebah ji Fatimîyan veqetiya, her wiha damezirandina tevgera ku piştre bi navê “Heşaşî” hat nasîn, dikeve nava vê çarçoveyê.

Van tevgeran bêtirî xwe kesên ku ji desthilatan bihêrs bûbûn kişandin bi alîyê xwe ve, weke cotkar û kedkaran. Her wiha dikarîbû têkilîya biratîyê di navbera peyrewan de xurt bike, heyanî asta ku dikarîbû şerkerên xweke uj û xwedî bawerîyeke şerkerî ya bi îdolojîya komê re dilsoz, bidin avakirin. Mînak; tevgera Qeramite pergaleke bacdayînê ya taybet ava kir ku dihişt kesên dikarin xwe bidin jirankirin li şûna yên hejar bacê bidin. Tişta herî berz di vê pergalê de ew bû ku em dikarin jê re bibêjin “Hevkarîya Darayî” ya di çarçoveya zagona “Hevxweyîtîyê” de; ku dihêle peyrewên wê diravên xwe li cihekî kom bikin û piştre bi awayekî weke hev her kes hevkarîyê tê de bike. Êdî vê yekê heyanî astekê hişt ku hejarî li cem peyrewên wê nemîne[11]. Bilindbûna pileyê di vê tevgerên de jî girêdayî karê jidil ê ji bo mifayên ku pêşkêşî komê dike, bû. Di vê yekê de tê xuyanîkirin bê çi qasî rêberên vê tevgerê dikarîbûn jîwarîya xwe di warê aborî û siyasî de bi tekûzî bixwînin û pirsgirêkên wê çareser bikin. Ev yek heyanî astekê bûbû stûneke xurt a

[11] Mikayîl Yan Dî Xoyê; El-Qeramite\Avabûn û dewleta wan û têkilîya wan bi Fatimîyan re; werger: Hisnî Zêne; çapa yekem 1978z; çapkirin: weşanxaneya Ibin El-Xeldûn-Beyrût; R35.

serkeftina tevgerê di warê siyasî ya di serdema xilafeta Ebasîyan di sedsala nehem a zayînî de û serkeftinên wê yên gelek ên li ser artêşa Ebasîyan. Tevgera Heşaşîyan jî ji vê stratejîyê ne dûr bû.

Der barê tevgera Duwazdeh Îmamî de jî, yek ji tevgerên wê, an ku tevgera Sefewî dikarîbû di dawîya sedsala pazdehem de bi serkêşîya Şah Ismaîlê Sefewî[12] dewleta xwe ya taybet ava bike, tîreya xwe li ser welêt bide sepandin û hêza xwe ya leşerî ya bawermend û tundrew bide avakirin û ev yek ji bo pêkanîna hêza xwe ya siyasî weke stratejî da meşandin. Heyanî piştî ku ev dewlet di sedsala hejdehem de hilweşiya jî, pergalên ku piştî wê hatin nedikarîn ji vê bawerîya siyasî xwe bişon û diyar e ta roja me ya îro jî berdewam e.

Piştî têkçûna tevgerên Şîî – Ismaîlî tu rêxistineke hêzdar û xwedî bawerîyeke siyasî û şerkerî li cem Şîayê derneketiye. Li gor daneyên dîrokî tê diyarkirin ku dewleta Sefewî di destpêka sedsala şazdehem de berz bûye û li welatên ku di bin serwerîya tîreya Sinî de bûn jî, komikên şîî xwe berdan nava wargehên wê. Komikên wê yên berbelav jî rêgeza Teqîtîyê şopand[13].

Li gor tiştên ku hatin zimên em dikarin bawerîya siyasî û leşkerî ya tevgerên şîî yên xwe li derdora rêzika şerîetê ya dibêje "Gengaz e ku serî li dij hakimê stemkar were hildan" kom dikin, di van xalan de vebêjin: Banga ji bo pêkanîna dada civakî û xwedîderketina li hejar û bêmafan, rêxistina leşkerî ya nepenî û mizgînîya hatina Mihdîyê Bendewar ku dê were û xelkê ji stemkarîyê rizgar bike, ne. Tişta balkêş ew e ku ev tevger piştî desthilata xwe didin avakirin, bi awayekî ev bang ber bi demagojîyê ve vediguhere û tundrewî dibe alava pêkanîna desthilata ku di dawîyê de nikare berdewam bibe, ev yek dihêle ku tevgerin nû derkevin holê. Em heman tiştî di hemû tevgerên islamî bi tevî yên sinî de jî, dibînin. Diyar e ku ev yek nêrîna nivîskar Elî El-Werdî tekez dike gava dibêje: "Hemûyan peristina xwedê dikir û koleyên xwedê talan dikirin…"

[12] Ji bêtir li ser vê yekê binasin li vê vegerin: Dr. Kerîm Caf; Zanistnameya dîroka siyasî ya Îranê\Ji destpêka dewleta Sefewî heyanî dawîya dewleta Qacarî; berga sêyem; çapa yekem 2008z; weşan: weşanxaneya El-Erebîyê ya zanistnameyan-Beyrût.
[13] Teqî wek zaraveke olî, tê wateya windakirina bawerîyekê; ew jî ji ber tirsa ziyangirtina madî yan giyanî bo xwedîyê wê ku bi sedema wê pêk tê.

- **Tevgera şîî ya tundrew a hemdem:**

Destpêka pêşketina nû ya Islama siyasî di dîroka me ya hemdem de, vedigere serdema çalakbûna tevgera Wehabî-Siûdî ku weke tevgereke şoreşger li dijî desthilata Osmanî derket holê. Bawerîya wê ya siyasî xwe dispart avakirina dewleteke xilafeta islamî ya erebî ku desthilata siyasî di destê malbata Siûdî û desthilata olî jî di destê malbata damezirênerê koma Wehabî Mihemed Bin Ebdilwehab de bin. Her wiha bawerîya wê ya şer jî xwe spart cihadê; ew jî piştî wiha dîtin ku her kesê ji derveyî sînorên wê yên îdolojî be, gawir e[14] û divê şerê wî were kirin heyanî ku dilsozîya xwe ragihîne yan jî were tunekirin. Dema ku em didin dû jêderên dîrokî yê wê demê, em dibînin ku destê ingilîzan di rola xeta Islama siyasî ya sinî li Hindistan, Pakistan, Afganistan û Rojhilata Navîn de xurt bibe; da ku li dijî pêşketina tevgerên sofîtî[15], neteweyî û komunîst ên ku ji alîyê dewletên dîtir ve dihatin destekkirin û berjewendîyên wê dixist nava metirsîyê, derkevin. Nemaze piştî şerê cîhanî yê duyem (1945 Z) ku tê de dewletên desthilatdar gelek hêz û desthilatîya xwe winda kirin û rakêşana wan a çandî û zanistî kêm bû[16]. Êdî bi awayekî dramatîk ev xetên islama siyasî ya ku banga avakirina dewleteke islamî ya tundrew dikir xurt bû û ji bo wê li welatên ku bi Islamê dihatin nasîn bi tevgerên neteweyî û komunîst re gelek şer pêk anîn. Her wiha hinek ji van dewletên mêtinger desteka gerek da desthilata Şah a stemkar da ku li dijî pêşketina desthilatên Yekîtîya Soviyetê derkevin. Lê belê zanistdarîya tundrew û stemkarîya wê bû sersebeba ronesanseke ramanî û siyasî li cem Şîa li Îranê; ku di encamê de sala 1979'an desthilata Şah li ser destê gelên Îranê hat ruxandin û piştre tevgereke tundrew a şîî bi serkêşîya Îmam Xumeynî hat damezirandin. Li gor wê jî dîsa hukimekî stemkar bi awayekî din li welatê wan hat damezirandin; çi ku rêjeyeke mezin a gel peyrewîya xwe ji olperestan qut nekiribû. Dibe ku sedem ew be; ku Şîa li Îranê mîna hevtayên

---

[14] Tekfîr ew e ya ku mislimanek ber bi kufrê ve biçe û derketina ji koma Islamê ye. Redkirina jê di Qurana Pîroz û sineta pêxember di gelek hedîsan de hatiye vegotin. Lê belê gelek tundrewên ji tîreyên din ên islamî ji ber sedemên siyasî dûrî vê redkirinê diçin.

[15] Ji bo ku li analîza girêdayî bibinxistina Inglîzistanê ji van şoreşên wiha re di Kurdistanê de, hûn dikarin li vê vegerin:
Ebdullah Ocalan, Manîfestoya Şaristanîya Demokratîk\Doza kurdî û çareya Neteweya Demokratîk-Berga pêncem' weger: Zaxo Şiyar; çapa duyem 2014z; bê weşan; R124.

[16] Samuel Hentington; pevçûna şaristanîyan\jinûveçêkirina pergala cîhanî; werger: Telet El-Şayib' çapa duyem 199z' bê weşan; R191.

xwe yên di serdemên berê de rastî qirkirineke olî ya hişt nehatine. Dibe ku vê yekê hiştibe ku Xumeynî piştî ku yên li dijî îdolojîya xwe ji hemû pêkhate û xetên siyasî yên Îranî têk birin, karibe dest deyne li ser desthilatê û pergaleke teokratîk ava bike. Her wiha lêvegereke şîî li (Qum)ê bi rêya avakirina wilayeta feqetîyê ku li welêt tişta bi navê "Demokrasîya Tîreyî" bi rê ve dibe, da avakirin. An ku pêkanîna demokrasîyê, heyanî astekê di nava tîreya şîî de bi rêya makezagoneke taybet, kom kir. Pê re jî leşkerkirin û globalkirina bawerîya şîî; ew jî bi rêya rêxistinin ku di warê jeosiyasî, herêmî û cîhanî de alîgirê wê bin û di bin diruşmeya "Hinartina rêgezên şoreşa islamî (Şîî)" pêk tîne. Her wiha hewldana avakirina pergaleke feqetîyê û hikûmeteke islamî-cîhanî ya bi serkêşîya wan[17]; da ku tevgera Tebşîrî ya Şîî di nava çarçoveya vê îdolojîyê de bimîne. Vê yekê rê li pêşîya avabûna tundrewîya şîî ya hemdem vekir ku ji bo xwe Amerîka, Israîl û hin rêjîm û rêxistinên sinî yên erebî, dijminên stratejîk dibîne. Ev tundrewî piştî ku şiyanên darayî, çandî, saloxgêrî û leşkerî yên dewleta Îranê ketin jêr xizmeta wê de, bi awayekî bilez geş bû û êdî bû xwedî rehendeke îdolojî ku sînorên wê yên siyasî derbas dike û dikeve çarçoveya ewlekarîya civakî ya şîî. Piştî ku şerekî îdolojî-çekdarî bi neteweperestîya erebî-sinî ya bi serkêşîya rêjima berê ya Iraqê re da meşandin, êdî hîn bêtir bû xwedî hêz û desthilat; ku êdî navûdengê wê weke e semboleke hemdem a şîî ji cihanê re hat xuyanîkirin û di hişê her mirovekî şîî de ma. Nemaze piştî ku dijmina wê ya sereke, an ku rêjîma Iraqê di encama êrîşa hêzên Amerîka û hevalbendên wê sala 2003'an hat hilweşandin. Vê yekê agirê tundrewîya şîî gur kir ku sinî bi navê "Tekfîrî" dane nasîn û li bermaberî wê jî tundrewîya sinî gur bû û şîî bi navê "Redkar (Rewafid)" didan nasîn[18]. Êdî ev herdu kom careke din ketin rûyê hev. Tişta ku em niha li Iraq, Sûrî, Libnan, Yemen û Behreyinê dibînin, ev bi xwe ye.

Tevgerên şîî yên tundrew ku xwe bi tîreya Duazdeh Îmamî ve girtine, di hevkêşeya şerê li ser Rojhilata Navîn de bûne karîgerên bandorker û li Yemen

---

[17] Ji bo bêtir li ser mijarê binasin, li vê vegerin: Îmam Ruhullah El-Xumeynî (Lêvegera olî ya bilind); Hikûmeta islamî; dersên feqetîyê ku ji xwendekarên zanistên olî yên li Necefê bi serenava Wilayeta Feqetîyê hatin dayîn 13 Zey El-Huca 1389 koçî; bê weşan û jimara çapê.
[18] Ji bo ku bêtir li ser vê dijminatîya îdolojî binasin li vê vegerin: Şêx Memdûh El-Herbî; Komên Şîayê; Tora parastina Sinayê; bê jimara çapê dîrok, dikarin li ser vê linkê bixwînin: https://www.cia.gov/library/abbottabad-compound/59/59B44E74DAAA792EAD48FD2A0CFFA2CC_825.DOC.pdf

û Iraqê dikarîbûn li hember rêxistinên El-Qaide û şaxên wê, xwe biparêzin. Bawerîya wan gihişt wê astê ku hewldana avakirina desthilateke xwe ya taybet a li ser bingeha îdolojîya wan, bidin. Ev yek piştî sedên salan ku geşbûna leşkerî ya erebî-şîî di qonaxa piştî hilweşîna dewleta Fatimî û Hemedanî û têkçûna tevgerên Qeramite û Heşaşîyan û ji bilî wan jî vemirîbû, derdikeve pêş[19]. Nemaze piştî êrîşên Moxolan ên wêranker bi ser herêmê de û berzbûna rengê tirkî di avabûna dewletî ya herêmî de.

Di dîroka me ya hemdem de du nêrînên îdolojî yên Şiayên ereb (Duwazdeh Îmamî) hene, her yek ji wan xwedî bawerîyeke leşkerî û siyasî ya cihereng e û li ser bingeha "Yek dijmin" hevalbend in. Ew jî ev in; partîyên şîî yên erebî ku îdolojîya wilayeta feqetîya îranî dipejirînin û partîyên ku pabendîyê bi lêvegera Necef û Kerbelayê yên iraqî û Çiyayê Amil li başûrê Libnanê dikin. Di Kurdistanê de jî tu rêxistinên şîî yên tundrew tune ne, piranîya kurdên şîî, mîna Feylî û Elewîyan, xebata wan sînorên çandî û olî derbas nake. Piranîya beşên siyasî ji wan jî doza avakirina statuyeke siyasî û çandî bo xwe, weke kurd, dikin. Her wiha piranîya kurdên misliman, mislimanên sinî ne. Li Tirkîyê jî ji ber siyaseta qirker a xwedî şêweyê olperestî-neteweperestî (sinî-tirkî) ku dewleta tirk û dapîra wê dewleta Osmanî ji bo bicihanîna desthilata xwe û şerê li dijî dewleta Sefewî da meşandin, tu rêxistinên şîî tune ne. Êdî li ser peyrewên Şîayê, bi hemû pêkhateyên wê ve, gelek komkujî pêk anîn, nemaze di serdema Siltan Selîmê Yekem û serokê tirk Mistefa Kemal de ku êdî binpêkirinên wî yên li ser elewîyên kurd û ereb di gelek jêderên dîrokî de belgekirî ne. Li Îranê jî desthilatîyeke qutebir a peyrewên Xumeynî heye û tu rêxistinên Şîî yên ji derveyî çarçoveya desthilatê tune ne. Rikberîya îranî ya bi navê (Mucahidîn Xuliq) ji tîreparêzîyê bêtir, zanistdar e.

Di Sûrîyê de jî îdolojîya beisî ya ku xwe dispêre ramana netewperstîya zanistdarî, hat meşandin. Şîîyên sûrî jî tenê çalakîyên xwe yên olî û çandî didan meşandin, heyanî sala 2011'an ku alozîya Sûrîyê dest pê bû û hêza komên sinî yên tundrew ku bangên kîn û dijminatîya li dijî Şîayê dane, bilind kirin. Êdî rêxistinên tundrew ên Şîî mîna Ebû Fedil El-Ebas (ji Şîaya Iraqê), Zeynebûn (ji Şiaya Pakistanê), Fatimî (ji Şîaya Afganistanê) û ji bilî wan jî û bi sorkirina ji alîyê Heres El-Sewrî ya îranî ve ku destekê bidin Şîîyên sûrî û

[19] Ji bo bêtir binasin li vê vegerin: Bernard Loys; Heşaşî\Koma şoreşger di dîroka Islamê de; werger: Mihemed El-Ezib Mûsa; çapa duyem 2006z; weşan: Pirtûkxaneya Medbûlî-Qahire.

navendên wan ên pîroz biparêzin, destek da rêjîma sûrî. Her wiha gelek sûrî jî tev li wan bûn û bi dehan şerkerên şîî yên biyanî berê xwe da Sûrîyê. Êdî gelek raporan behsa xwestekên bo avakirina statuyeke şîî sûrî bi navê Hizbullaha Sûrî weke a Libnanî û Iraqî, kirin. Lê belê di rêya van xwestekan de gelek astengî ji alîyê dewleta Israîlê, hin dewletên erebî yên bihêz mîna Erebistana Siûdî û Misirê, Rûsya û Amerîka û hevalbendên wê ve derketin. Lê belê diyar e ku serwerîya îranî ji van hewldanan bêzar nabe.

Li Iraqê rewş cûda bû, di vî welatî de rêjeya herî bilind a şîîyên ereb û hejmareke baş a şîîyên kurd heye. Bajarên Kûfa, Kerbela û Necefê wargehên sereke yên Şîayê li seranserî cîhanê ne û lêvegera wan xwedî cihekî rêzdar e. Di sedsalên berê de li ser destê desthilatên osmanî û beisî rastî gelek êrîşan hatin. Di nav şîîyên Iraqê de tu rêxistinên siyasî yên ku dixwazin pergaleke teokratîk ava bikin, derneketin. Tevaya guhdana lêvegerên wan li ser çalakîyên olî û çareserkirina pirsgirêkên peyrewên tîreyê bûn. Serhildanên ku pê rabûne jî heyanî astekê mîna xweparastina li beramber qirkirinên desthilatên ku ketibûn jêr hikumê wan bûn. Bi tevî ku pergala weilayeta feqetîyê hatibû avakirin jî, lê belê gelek lêvegerên olî bawerîya wan pê nedihat û bêtir xwestin ku di nava Iraqê de bi awayekî aştîyane bimînin û pabendîyê bi nasnameya niştimanî ya iraqî bikin. Lê belê bi destpêbûna şerê Iraq-Îranê sala 1980'î re, hişt ku dilê piranîya Şîayê here li ser Şîaya Îranê, jixwe berê jî nerazîbûna wan ji desthilata Iraqê re hebû. Vê yekê rêjîma Sedam Hisên nîgeran kir û wiha dît ku ji bo rêgirtina li ber serhildaneke gelêrî ya li dijî rêjîma wî, teror weke çareya tekane ye. Vê jî bi dest xwe re girêdanên niştimanî yên di navbera desthilatê û derdora nîvê niştecihên welêt de qut kirin. Tê zanîn ku lêvegerên Necefê yên wê demê, an ku Ebû Qasim El-Xewyî û Elî El-Sîstanî dûrî siyaset û leşkerîyê bûn û weke oldaran xwe didîtin. Lewre berteka komên siyasî yên Şîayê ew bû ku di çarçoveya xweparastinê de rêxistineke leşkerî were avakirin ku bi navê "Feyleq El-Bedir" hat nasîn. Ji ber windabûna destekdayîna erebî jê re û ji ber ku tu hewldanên dewletên erebî tune bûn ku wê vehewînin mîna ku li Cezayirê sala 1975'an çêbû, neçar ma ku xwe bavêje Îranê û destekê jê bixwaze. Êdî tundî di navbera herdu alîyan de çêbû û gelek qurbanî ji herdu alîyan ketin, pê re jî kîna tîreyî ya dîrokî ku bandorîyên wê heyanî roja îro jî heye, derket pêş. Bi vê yekê re nearamî û geşbûna desthilatên milîsên çekdar li pêş ketiye û nasnameya niştimanî ya iraqî lawaz bûye; mîna ku di roja îro de em di dewleta Iraqê ya nujen de

dibînin. Lewre jî em nikarin tundrewîya rêxistinên şîî şîrove bikin; ji bilî ku weke bertekekê li bermaber geşbûna tundrewîya sinî ya piştî hilweşîna rêjîma Iraqê sala 2003'an, derketiye pêş. Bi gelemperî du xetên sereke yên tevgera tundrew a Şîaya nûjen hene; ew jî xeta ku xwe li îdolojîya Xumeynî digire û xeta ku xwe li raman neteweyî-tîreyî digire. Ev yek bi hêsanî di herêma Rojhilata Navîn de diyar dibe. Carinan nakokîya di navbera herdu xetan de digihêje asta ku gefê li stûna mala Şîî ya Duwazdeh Îmamî tê xwarin. Dibe ku ev yek xala lawazîyê ya yekdestîya Şîayê tê dîtin û dikare ji alîyê dijberan ve were keysbazkirin.